# *Feqiyê teyran 3*

*Abdusamet Yîgît*

*Weşanên soran*

.
.
.
.

Feqiyê Teyran 3
*Abdusamet yigit*
*@Abdusamet yigit*
*Çap 3*
*Berlin/Almanya-2014*
.
email: han-grafik@hotmail.de
.
Çap û Grêdan :
Concept medienhaus
HAN-GRAFIK Verlag & Werbeagentur
Bülowstr. 56-57 10783 Berlîn
ISBN 978-39816686-9-8

**FEQIYÊ TEYRAN** -3

Li Cizîre bota, piştî ku xazîne hatibû dîtin, êdî rewşeke nû bixweza afirî bû. Herkesek li ser diaxift.Mîr piştî ku xazîne dîtibû, êdî di nav civatê de jî pir bahsa wî dihata kirin. Bahsa lêgerine wî dihata kirin. Mirovên ku li ser diaxiftin jî, di gotin ku ´me awil got ku mîr wê zor bê ku xazînê bibînê, lê va dît´.Rast bû. Mîr xazîne dîtibû.

Dema ku li ser demên lêgerîne xazîne dihata sekinandin, pir tişt li ser dihata axiftin.Pir tişt dihatina rojeve.Bahsa keşe Tuma ji dihata kirin. Hinek mirovan lêxistine serê wî rast ne di dît. Lê hizre xwe ne tanînine ser ziman. Di mana sekinî di cihê xwe de. Piştre ku bi ser rewşê ve demek bûhûrtibû, êdî mirovan hinekî bahs dikir. Lê dise ne zêde wilo bahs dikirin. Lê divêt ku mirov bêje ku pir bahsa Mihamed dihata kirin. Pir li ser wî dihata axiftin. Ew di her civatê de mijara axiftinan bû.

Mihamed jî, piştî ku xazine hata dîtin, li Cizîre bota li medrese sor demeke mabû.Lê di wan demên piştre, Mihamed pir bi hizir bû. Pir dihizirî. Ev yeka ji çavên mirovan ne diravî. Faqa Qasim û Ilmdar û Mele Silêman jî li nig wî dirûniştin.Dema ku wan ew hizirkirina wî wilo di dît, ew jî pir dihizirîn. Ew ji dihizirîn ku ka çi di serê Mihamed de heya.Mihamed pir bihizir bû. Ew hizir bûn jî di serê wan de dima. Piştre ku demek bi ser ve çûbû jî, wan ne kiribû ku vê yekê jê bi pirsin.Her ku farq dikirin ku ew wilo bihizire ji ne di pirsîn. Lê dimeyîzendin. Weke ku dixwestin ku bi wê meyîzendine xwe re fahm bikin ku ka çi di serê wî de heya.

Berî hingî, piştî ku xazîne hatibû dîtin, careke mihamed bi faqa Qasim re axiftibû. Di axiftine xwe de bahsa sefereke kiribû ku bike. Ji faqa Qasim re anîbû ser ziman ku dixweze sefere bi aliyê başûr û rojhilatê kurdistanê de bike. Li ser wan herêman wî pir tişt his kiribûn. Li wan herêman ji mirovna ku mazin û navê wan hebû wî bihistibûn.Li ser wan ji dihizirî. Li rojhilatê kurdistanê ku bigiştî lê bi nav û deng bû û li Cizîre bota ji navê wî dihata bihistin Abû Hanîfê Dînwerî hebû.Mirovan pir bahsa wî hizre wî jî dikir.Ne tenê zanistên demê yên kurd, yên ji xalkên din ji ew nasdikirin û dixwandin.Li ser hizre wî xwedî zanebûn bûn.Abû hanîfê Dînwerî li herêmê bingehek mazin afirand bû ji pêşketinê re.Mirovan ew pir nasdikir. Mirovekî ku bi hizre wî re navê wî hebû bû.Bingihe zanistîyeke nûjen li kurdistanê di dema xwe de afirand.Gelek alîgirên wî ji hebûn. Li ser wî diaxiftin.Hizre wî ji mirovan re tanînine ser ziman.Her weha mirovne din

ji hebûn. Mirovên weke Sihabeddin Sihrewerdî hebûn.Ew ji navê wan hebû.Mirovên weke Hallacê mansur hebûn.Pişt wan re ji navê wan li jiyanê mabû.Bahsa wan ji dihata kirin.Li ser wan dihata axiftin. Mihamed li ser wan ji xwedî agahî bû.Li ser wan ji xwedî têgihiştin bû.Hizre wan ji zanibû. Dema ku di serê xwe de dihizirî pir li ser wan ji dihizirî.

Pir caran bi faqa Qasim re axiftibû.Li ser hizrên di serê xwe de û zanistên ku hizre wan zanibû li ser wan diaxift.Faqa Qasim, zanebûneke wî ya mazin hebû.Ji wî re bahs dikir. Tanî ser ziman.Mihamed dema ku ji wî his dikir, di serê xwe de kur dibû û diçû.Faqa Qasim, demên xwe dema ku li mzgefte Nebî Nuh dima, bi xwandinê re dibûhûrand.Wî pir dixwand. Hij xwandinê dikir.Ji ber ku wî pir dixwand di serê wî de pir hizir hebûn.Zanebûne wî mazin bû.Fahmê wî ji hebû.Mirovê bi fahm, bixwandinê re mazin bi pêşdikeve.Ew ji wilo bû. Mihamed ji jê pir fahm girtibû.

Mihamed, dema ku gotibû wî ku dixweze ku herê gereke bi rojhilat ve, hingî faqa Qasim ji jê pirsîbû ku dixweze ku herê kuderê.Wî ji ji wî re gotibû ku dixweze ku herê kuderê û di kuderê ve herê.Dima ku faqa Qasim li ber wî rûniştibû û Mihamed wî li ber xwe bi bêdeng di dît, ew nîqaşên ku bi hev re kiribûn di serê wî de dihatina bîre wî di wê heyeme de.Dema ku her weha dihata bîre wî, êdî ew ji dikete hizaran de.Weke ku w zanibû ku Mihamed di serê xwe de li ser çi dihizirê û hizre wî di serê wî de li ser çi ya.Gotinne wilo ku Mihamed gotiyê ku dixweze ku bi riyeke de herê hatibûbûna guhê wî ji.Lê i wê heyeme de hizre wî di serê wî de ne li ser wê bû.Weke ku ew ne li bîre wî ji bû.Lê faqa Qasim ne wilo bû.Ew di serê xwe de di wê heyeme de di hişê wê yekê de bû.Mihamed, piştî ku weke demeke bi bêdeng li ber wan dimene, êdî faqa Qasim serê xwe ji ber xwe dirake û li nav çavên Mihamed dimeyîzenê.Dema ku li nav çavên wî dimeyîzenê, hingî, weke bêhneke bi bêdeng lê dimeyîzenê.Piştre weke ku ev hizre ku di bîre wî de ji di wê heyeme de têde pirseke ji Mihamed dike.Di pirsê ji Mihamed ku ´ma ti li ser çûne dihizire´.Dema ku ew wilo di pirsê, êdî weke ku hizrek di serê mele Silêman de şaq bide lê têt.Ilmdar di wê heyeme de dema ku wilo ji deve faqa Qasim hisdike, êdî weke ku were xwe lê têt û piştre avîre xwe dide ser Mihamed û piştre avire xwe têne ser faqa Qasim û jê di pirsê ku ´kî wê çê kuderê.Dema ku Ilmdar her weha gotineke bi pirs dike, êdî faqa Qasim di nav wan de ji ber ku yê mazina ji awil ew mafê xaberdanê dihilde û ji mele Silêman re û ji Ilmdar re dibêje ku Mihamed dixweze ku bi riyeke de herê.Dema ku ew wilo ji wan re dibêje, êdî di nav wan de danûstandineke li ser vê yekê dest pê dike

di wê demê de. Dema ku bidest axiftinê bi hev re dikin, êdî weke demeke her weha bi hev re diaxivin..

Piştre ku weke demeke her weha bi hev re diaxivin, êdî ew ji fahmdikin ku Mihamed li ser riyeke ya.Mihamed dixweze ku bi aliyê rojhilat wan ve herê û piştre ku careke dî bibe qismet vegerehe wir.Ew ji vê yekê fahmdikin.Dema ku ew ji vê yekê fahmdikin, êdî ew ji hinekî di xwe de di serê xwe de dihizirîn.Hinekî bêdeng dimenin di cihê xwe de.Mihamed ji bêdeng e. Faqa Qasim ji dema ku ew gotibû ji wan re êdî bêdeng mabû.

Mihamed ji di serê xwe de çûbûbû.Di serê xwe de dihizirî.Ka di serê xwe de çûbûbû kuderê. Lê dema ku mirov lê dimeyîzend ji mirov têdigihişt ku mihamed di serê xwe de ne li wir e. Her weha dihata têgihiştin. Mihamed pir dihizirî.Ew êdî pîr bû.Pîr dihata hasibandin. Lê hê zêde ji ne pîr bû.Riha wî ji hatibû. Riha wî ya ne zêde dirêj ew ru yê wî yê ku ne zêde gir di ahangekeke de dide ber çavan.Di wê rewşe xwe de dihizirî.Faqa Qasim ji û mele Silêman ji û Ilmdar ji li nig wî bûn.Ew ji pirştî ku bitememî têgihiştibûn ku di serê mihamed de her weha hizrek heya û ku hinekî li ser axiftibû bûn ji, êdî ew ji mabû bûne sekinî di cihê xwe de, bêdeng.

Faqa Qasim ji di wê heyeme de li nav çavên Mihamed dimeyîzend.Cerne li nav çavên wî di meyîzend û cerne ji li ber xwe dimeyîzend.Weke ku ew ji bihizir bû.Ew ji di rewşe xwe de bû. Ew ji dihizirî.Wî ji pir dîtibû.Pir hizir dikir.Pir di serê xwe de di bir û di anî.Faqa Qasim di serê xwe de hizre wî li ser Mihamed bû..

Piştî ku her weha weke qadareke li hevdû rûniştî dimenin, êdî piştre ne bi gelekî re, ji hevdû bela dibin.Ilmdar dike ku xwe bigihine qasre û hinekî li ba mîr ji bimene.Faqa Qasim ji ku mele Silêman ji pêre û ku Mihamed ji bi wan re dikin ku herinê mizgefte nebî Nuh.Dema mêje bû.Hindik mabû ji mêje nivro re.Dema ku ji cihê xwe di rabine ser xwe, êdî piştre didine ra hevdû û dikevine riye mizgefte nebî Nuh de.Hersêk ji dema ku di meşîn ji, bêdeng bûn.Car bi car ku hinek gotin ji hevdû re digotin û wan ji bersive hevdû dide, ji wê pêre ti axiftinên wilo zêde mazin ji di nav wan de ne dibûn.Mihamed, dema ku dimeşî, weke ku di serê xwe de li dereke dî be dimeşî.Her weha dihata ber çavan.Hersêk ji weke sê alimên mazin di rax hevdû de dimeşîn û di rê de bûn û diçûne mizgefte..

Piştre ku ne bi gelekî re digihine mizgefte, êdî kara xwe dikin û piştre ku dem têt, êdî dikin ku mêj bikin.Lê piştî mele Silêman bihîstibû ku Mihamed li ser riyeke ye, êdî pir bala wî çûbû bû ser wî di wê heyeme de.Pir lê dimeyîzendin.Ew demeke dirêj bû ku bi hev re bûn.Li medrese sor, piştî rehmat kirine seydeyê mazin meleyê Cizirî re gelek sal bi hev re

bûhûrandi bûn.Ji wê zêdetir ji, mele Silêman pir hij Mihamed kiribû.Mihamed pir di dilê wî de cih girti bû.Ji hev re ji du bireyen baştir bûn.Vêce nahaka wî bihîstibû ku Mihamed dike ku bi riyeke de herê.Çûyin hebû.Lê hebû ku êdî piştî çûyine re hevdû careke dî ne bînin.Ew ji hebû.Sad tişt heya ku were serê mirov.Ma mirov kare xwe ji tiştên ku werine serê mirov hemûkan rizgar bike?Ne, ev yeka ne mumkun bû..

Piştî ku li mizgefte xwe amede kirin ji bo mêje, êdî piştre ku dem ji hat, êdî bidest mêjkirinê kirin.Piştî ku bidest mêje kirin, êdî piştre li hevdû rûniştin û hinekî ji hevdû re axiftin.Cimaat hemû li hew bû.Dema ku mêje bidawî bû, êdî li hev bûna kom û piştre di nav wan de weke her car faqa Qasim li pêşiye wan bidest axiftinê ji wan re kir.Faqa Qasim dema ku diaxift, di nav axiftinê wî de heya wî li ser Mihamed bû.Dema ku diaxift, car bi car çavên xwe dibirine ser wî û li wî dimeyîzend.Dema ku wî li wî dimeyîzend, êdî di dît ku wa ew bihizre.Hinekî ji weke ku bihazne.Her weha dihata xuyakirin.Mele Silêman ji hinekî jê wirde bû.Lê car bi car ji weke ku bike ku li Mihamed meyîzenê û wî bibînê di nav cimaate de xwe ditawand û di pêşiye rêze cimaate re li li aliyê wî li cihê wî dimeyîzend.Lê zêde ji xwe ne dide pêş.Ji ber ku rast ne dibû ku rêz were xirakirin di dema axiftine faqa Qasim de.

Faqa Qasim dema ku bidest axiftinê kir, weke demeke axift û piştre sekinî.Dema ku sekinî êdî piştre cimaate li dore wî ji fahm kir ku axiftinê wî bidawî bû.Êdî piştre cimaat ji hêdî hêdî bidest ji hevdû belav bûne kir.Mihamed û mele Silêman ji mana di cihê xwe de sekinî.Haya ku cimaat hema bêja hemû belav bû, êdî ew rabûne ser xwe û gahana hevdû û kirin ku derkevin. Di wê heyeme de ne tenê mihamed, faqa Qasim û mele silêman li hundir mabû.Di wê heyeme de yekî dî ji mabû.Lê wan ew nasnedikir.Weke mirovekî ku beyen bû.Lê dema ku lê dihata meyîzendin weke ku mirovekî ku zane bû dihata dihata xuyakirin.Weke mirovekî ku xwanda dihata xuyakirin.Ev yeka ji bala faqa Qasim, Mihamed û mele Silêman ne ravî.Dema ku ku ew rabûbûna ser xwe û kiribûn ku derkevin û ku piştre ku ew mirov dîtibûn bala wan çûbû bû ser wî, êdî di cihê xwe de mabûbûna sekinî.Piştre ku mana sekinî, êdî ne bi gelekî re bala wî mirovî ji kişand ku bala wan çûya ser wî û weke ku li bendî wî sekinî bûn sekinî ne. Dema ku wî wilo kifş kir, êdî wî ji ji cihê xwe da xwe û rabû rabû ser xwe û bi ber wan ve çû. Mihamed, faqa Qasim û mele Silêman ji li wî dimeyîzendin.Piştre ne bi gelekî re ew gaha dehma wan.Dema ku gaha dehma wan, êdî pêşî silav da wan û piştre xwe bi wan da naskirin. Ji wan re got ku ew kî ya.

Dema ku wî xwe da naskirin, ji wan re got ku ew ji ew herême Zaxo ya.Dema ku wî wilo got û got ku ji herême Zaxo ya me, êdî bala Mihamed kişand.Mihamed piştre avirên xwe dana ser wî.Piştre navê xwe got, got ku ´navê min Mele Serhengê Zaxoyî me´.Dema ku wî wilo got, êdî piştre yê ku weke ku herî şaş bû û şaş ma faqa Qasim bû.Faqa Qasim, navê wî bihîstibû. Lê belê ew bi çavên serê xwe ne dîtibû.Mele Serhengê zaxoyî, li herême bi nav û deng bû.Ji aliyê ilmê wî ve û zanebûne wî ve navê wî ji derketibû.Pir mirovan bahsa wî dikir. Pir mirovan navê wî dihildan.Li herême Cizîre bota ji mirovên ku ew nasdikirin û navê wî bihîstibûn hebûn.Ji xwe hertimî ji wan herêman mirov dihatina Cizîre bota û diçûn.

Piştî ku wî navê xwe gotibû û gotibû ku ez mele Serhengê Zaxoyî me, êdî piştre ew mabû sekinî di cihê xwe de.Weke ku serê xwe bike ber xwe de li xwe kiribû.Lê bala faqa Qasim li ser wî bû.Piştre ji dêla ku derkevine derve, êdî piştre li hundur hinekî di man û piştre hinekî ji hevdû re axiftin.Faqa Qasim, hingî, pîr bû.Lê belê di dema ciwanîye xwe de careke çûbûbû wanderan.Ewder hemûk dîtibûn.Ew ji di wê demê de naskiribû.Ya rastî wan di serî de weke ku hevdû nasnekiribûn.Lê mele Serhengê Zaxoyî ji weke ku naskiribû û bêdeng mabû sekinî bû.Ew ji pîr bû.Lê li ser xwe dihata xuyakirin.Piştre ku hinekî mabûn, êdî piştre bitememî hevdû naskiribûn.Faqa Qasim ji, piştre têgihiştibû ku ew dîtiya.Ji xwe divêt ku mirov bêjê ku mele Serhengê Zaxoyî, piştre ku dema ciwanîye xwe di bûhûrenê êdî têt naskirin.Êdî weke alimekî têt naskirin.Bavê Mele Serhengê Zaxoyî, şêx Birehim ji li herême navê wî hebû û mazin bû.Navî û dergaha wî hebû.Mirovan pir diçûne nig wî û li diwane wî dirûniştin.Li dore wî ji pir sofîyên wî yên pir pêve girêdayîbûn hebûn.

Dema ku faqa Qasim hê ciwan bû, hingî, hê ku ji nûkava bûbû mele li mezgefte Nebî Nuh, ku mîr sefereke li wir dike, wî ji bi xwe re dibe.Hingî, wan hevdû naskiribû.Lê hingî pir zûve bû.BI ser ve pir dem bûhûrtibûn.Nahaka faqa Qasim ji û mele Serhengê Zaxoyî ji pîr bûn. Mirov ku li wan dimeyîzend, ew pir pîr û mazin dîtin.Lê pir zane ji di dîtin.Divêt ku mirov vê yekê bêjê.Faqa Qasim berî ku mêj bikin, ew farq ne kiribû.Faqa Qasim dibêt ku ji ber vê yekê bû, di xwe de ketibû hizran de.Di xwe de di nav hizren de di serê xwe de çûbû bû.Pir bêdeng mabû.Dema ku li hevdû rûniştibû bûn, Mihamed û mele Silêman û mele Serhengê Zaxoyî bi hev re danûstandin germ kiribûn.Lê faqa Qasim bêdeng bû.Weke ku li wan dihisand.Lê di serê xwe de ne li wir bû.Vê yekê, dema ku mirov lê dimeyîzend bala mirov dikişand.Piştre ku li hevdû rûniştin û hinekî bi hev re danûstandin ji, êdî piştre ne bi gelekî re weke ku

mele Serhengê Zaxoyî ji vê yekê kifş bike ji faqa Qasim û bala wî çû ser wî di wê heyeme de. Faqa Qasim bi bêdeng bû.Piştî ku mele Serhengê Zaxoyî ji ew bêdeng bûn kifş kiribû, êdî bala wî çûbû ser wî.Faqa Qasim di serê xwe de çûbû bû.Ka çûbû bû kuderê.

Faqa Qasim pir jin kiribû.Pir dîtibû.Pir dinya dîtibû û fahmkiribû.Dema ku mirov pêre di axift ji ev yek pêre pir baş û qanc fahmdikir.Pir dem bûhûrandibûn.Dibêt ku dema ku mele Serhengê Zaxoyî naskiribû û farq kiribû, ev hemû tişt û miştên ku jîn kiribûn hatibûbûna ber çavên wî di wê heyeme de.Dibêt ku ew dema ku wan hê ku ciwan bûn û hevdû dîtibûn hatibû bîre wî û berçavên wî di wê heyeme de.Ne kifş bû.Lê ji her aliyê ve ji dihata kifşkirin ku faqa Qasim di serê xwe de di hîmekî weha de çûbû.

Piştî ku her çar li hevdû dirûnihin, êdî weke qadareke li hevdû rûniştî dimenin.Piştre demeke li hevdû rûniştî dimenin, êdî piştre bi hev re dirabin ku herine medrese sor.Mele Silêman û Mihamed ji xwe wê çûban wir.Êdî bi wan re faqa Qasim ji têt wir di wê heyeme de. Piştre ku hinekî bi hev re diaxivin, êdî li hevdû germ dibin û piştre bi hev re êdî hêd hêdî dibine weke mirovne ku ji berê ve hevdû nasdikirin û bi hev re ne.

Mele Serhengê Zaxoyî bahsa wî bi zanebûn dihata kirin.Navê wî bi zanebûn dihata ser ziman. Dema ku mirovan bahsa wî dikir, hertimî ji zanebûne wî û qancbûne wî û hirbûne wî di axiftin.Li herême  Zaxoyê ji navê wî bi zanetîye wî derketibû.Piştî bavê wî şêx birehim digihê rehmate xwe, êdî li dewsa wî ew li dergaha wî dirûnihê.Li wê herêmê, ew êdî pir têt naskirin.Navê wî derdikeve.Mîrên herêmê ji bê wî gavên xwe ne diavêtin.Hertimî ku wê gavek avêtiban, li wî ji dihisandin.Ew ji her weha mazin bû û bi nav û deng bû.Bi vê yekê re ji divêt ku mirov bêjê ku hertimî navê wî bi rêz dihata hildan.Piştî rehmatkirine bavê wî re, êdî ew ji tît naskirin.Ew ne tenê weke bavê xwe li herême xwe navê xwe mazin dike, ew li herêmên din ji dike ku navê wî were bihîstin.Her weha mazin têt naskirin.Li herême Serhadê, weke Sêrtê û Mûşê û li hevirdore wê ji têt naskirin.Li van herêman ji hewbûnek ji aliyê zanstîyê bê an ji ji aliyê alimtîyê ve bê bûbû.Her çend ku di bin sihe Cizîre bota diman ji, divêt ku mirov bêjê ku nave van deran ji hebû.

Li van herêman, dema ku mirov şîrove bike, divêt ku mirov bibînê ku pêşketineke mazin hebû.Ji aliyê zanetîyê ve bê an ji ji aliyê hebûne zanistan ve bê, xwedî hebûn bû.Divêt ku mirov vê yekê baş û qanc bêne ser ziman.Bizêdeyî ji medrese Sêrtê û ya Xizanê hertimî li pêş bûn. Navê wanderan  bi zanistên li wanderan re hebû.Hertimî her weha navekî

vanderan hebû. Mirovên ku li wanderan dihatina naskirin li Cizîre bota ji dihata naskirin.Ji ber ku hertimî, ku zanistek li dereke ji vanderan derketibena, ku di dema zanistitîya xwe de demeke ne çûbena Cizîre bota ne dibû.Her weha ev yeka pir li pêş bû.Cizîre bota ji aliyê gelek nirxan ve di serê mirovan de bicih bû.Li wan herêman ji ji herêmên dore wê mirov lê digahana hevdû..

Mele Silêman,Mihamed,faqa Qasim û mele Serhengê Zaxoyî ji di nav de çawa ku derdikevin ji mizhefte ku herin, êdî li derve li hewşa mizgefte hinek mirovên din ji digihine wan.Lê dema ku derdikevin, mele Serhengê Zaxoyî pir li deve derîyê mizgefte dimeyîzenê. Derîyê wê bixwe ji, li ser gelek motifên kurdî hebûn.Hinek nivîsên kurdî ên olî li ser bûn. Derîyê mizgefte bixwe ji ji zêr û zîv hatibû bûne çêkirin.

Ew mirov ji weke sofî û hinek mirov ku alim bûn dihatina xuyakirin.Ew ji ji aliyê faqa Qasim mele Silêman û Mihamed ve ne dihatina naskirin.Lê dema ku ew derketibûn û ew ji li dore wan li wan gahabûbûna hevdû êdî mele Serhengê Zaxoyî bixwe gotibû ku ew bi wî re ne, bi wî re hatina.Piştre êdî ku ew ji bi wan re hevdû didine naskirin, êdî ji wan ne vaqatihin û dema ku ew dikevine rê de ku herine medrese sor êdî ew ji bi wan re diçina medrese sor. Wilo dihata xuyakirin ku wê êvarê, wê civateke mazin li medrese sor li dar ketibena.Her weha dihata xuyakirin.Dema ku Mihamed. Faqa Qasim, mele Silêman û mele Serhengê Zaxoyî derketibûn ji, êdî li derve pir mirov li wan gahabûbûna hevdû.Her weha dibêt ku divirde mirov bêjê ku wê haya dawiyê li medrese li civate hevdû rûniştê ne maban.Wê piştre ku dem hinekî di şeve de çû, êdî wê çûban qasre mire bota û li civate li civate mîr rûniştiban.Ji ber ku hertimî civate mîre bota li dar bû.Li civatê wî ji hertimî mirovên zane û yên ku ji deverên dûr û cûr bi cûr dihatin ji lê dirûniştin.Ew ji wê çûban wir û li civate mîr li hevdû rûniştban.Ne tenê mele Serhegê Zaxoyî û yên ku pêre hatibûn li Cizire bota weke mazin diman di wê heyeme de.Ji xaynî wan, hê gelek mirovên din yên ku ji deverên din hatibûn hebûn.Ew ji li qasre bûn.Li civate mîre bota bûn.civate mîre bota bi nav û deng bû.Navê wê hebû.Mirovan pir jê diaxiftin.Dema ku bahsa wê dikirin ji bi rêz bahs dikirin.Her weha divêt ku mirov bêne ser ziman.

Piştre ku Mihamed, mele Silêman, faqa Qasim û mele Serhengê Zaxoyî ji mizgefte derdikevin, êdî bi mirovên ku li wan gahana hevdû re tên ku werine medrese sor.Dema ku di kevine rê de ji, bi axiftin di rê de tên.Hinekî her weha di rê de dimeşîn.Piştre ne bi gelekî re êdî tên û digihine medrese sor.

Dema ku bi hev re tên û digihine medrese sor, hingî, êdî bi hev re di bûhûrine hundir û li hundir bi hev re dirûnihin.Dema ku ketine hundir de, hingî, li hundir hinek feqihên ku hebûn ji ew kifş kirin û dema ku ew kifş kirin ji di cih de bi ber wan hatin û hatine pêşiye wan di wê heyeme de.Mele Serheng Zaxoyî, dema ku ketibûbûna hundir de li pêşiye wan ketibû hundir de.Mihamed, mele Silêman û faqa Qasim ji li pay wî bûn.Lê dema ku ketibûbûna hundir de, êdî bi hev re li dehma hevdû meşî bûn û bûhûrtibûbûne hundir di wê heyeme de.Dema ku bûhûrtibûbûne hûndir de ji, êdî bi hev re çûbûn û li mezele seydeyê mazin meleyê Cizirî li ber serê wî rûniştibûn û bi hev re ketibûbûne axiftinê de.

Dema ku rûniştibûbûn, hingî, mele Serhengê Zaxoyî pêşî hinekî çavên xwe li hevirdore gerendi bû û li hevirdore meyîzendibû.Piştre bi bêdeng mabû di cihê xwe de.Mele Silêman, cerna yê ku hinek gotin digotin û axiftin dide dest pê kirin bû.Faqa Qasim ji di wê heyeme de weke Mihamed bi bêdeng bû.Ew ji weke ku di serê xwe de li ser tiştne dihizirî.Lê ka li ser çi dihizirî.Ne kifş bû.Lê piştî çûne mihamed ku fêrkiribû, êdî bêhtir bi bêdeng bû bû.Mihamed, gotibûyê de ji, ku xwude bê erê ezê careke dî vegerihim.Lê dise di hizirî.Ew li ser wê dihizirî. Dema ku ketibûbûne axiftinê de, yê ku di wê heyeme de zirektî dide nîşandin ji mele Silêman bû.Wî ew dikişandine nîqaşan di wê heyeme de.Lê dema ku wî ji her weha ew bêdengbûn li ser di dît û kifş dikir, êdî ew ji weke ku wê kirinê ji rewş diket.Her weha lê dihat.Lê dise weke ku hinek di serê wî de jê re bêjin dide xwe û dikir ku ew bi axivin.

Bi vê rewşê demek di bûhûrê.Lê belê ew rewşe wan berdewam dike.Piştre ku weke ku mele Serhengê Zaxoyî wê rewşê û hewldana mele Silêman kifş bike lê têt û piştre ew ji dike ku bike nîqaşê di wan û xwe de bide dest pê kirin.Herweha dikeve hewldaneke de.Piştî ku ew her weha hewldidê, êdî ne Mihamed ne faqa Qasim û ne ji mele Silêman wî dişikenê û di kevine axiftin û nîqaşan de.Mele Serhengê Zaxoyî, divêt ku mirov bêjê ku ew mirovekî ku pir bi zane bû.Pir xwandibû.Berî hingî ji careke du caran hatibûbû Cizîre bota.Wê di saxiye xwe de seydeyê mazin meleyê Cizirî dîtibû.Pêre mabû û pêre axiftibû ji.Ji xaynî wê ji, dema ku seydeyê mazin meleyê Cizirî li amede bû, hingî ji careke li wir ew dîtibû.Ew demeke ji zaxo hatiû Sêrtê û ji wir ji çûbû bû Xizanê.Piştre ji wir ji xwe gahandibû Amede.Mirovekî Zane ku were Sêrtê û Xizanê û xwe ne gihine Amede ne dibû.Li amede Mele Taha hebû.Mele Taha divêt ku mirov bêjê ku mirovekî ku pir bi zane bû û navekî wî yê mazin ku herkesekî jê re rêz

digirt hebû.Ew ji dema ku hatibû wanderan, hingî, xwe gahandibû wir û li wir li nig wî ji demeke mabû.Ew ji baş û qanc naskiribû.

Di wê demê de, dema ku ew li nig mele Taha dimene, hingî, ew wî ji li wir ji dibînê.Piştre li wir ji li civate hevdû dirûnihin û ji hev re hizre xwe tênine ser ziman.Mele Serhengê Zaxoyî mirovekî ku şêx bû.Ji ber vê yekê dema ku ew diçû dereke gelek mirov pêre diçûn, û dema ku li dereke dima û dûrûnişt ji, pir mirov lê dirûniştin.Her weha divêt ku mirov bêjê û bêne ser ziman.Di wê demê de ji, dema ku ew çûbû bû wir, hingî, gelek mirov hatibûbûna civate wî û lê rûniştibû bûn.Seydeyê mazin meleyê Cizirî ji di wê heyeme de hê hinekî ciwan bû.Lê bi aqilê xwe û axiftinê xwe weke kalekî pîr bû.Her weha zanibû biaxivê.Dema ku diaxift ji, pir bi zane û xweşik diaxift.Ji ber vê yekê bû ku di demeke kin de pir mazin bilind bû bû.Navê wî derketibû.Ji ber vê yekê ji, çawa ku li nig mele Taha dibe seyde, êdî mele taha ji wî dişene gundekî li wir.Ew gunde ji navê wê Sirba bû.Li wir li medrese fêran dide feqayan û seydetiye ji xalkê wê derê re dike.Lê dema ku di wê heyeme de mele Serhengê Zaxoyî bi bavê xwe wan re têtê wir û li wir civate wan mazin li dar dikeve, êdî seydeyê mazin Meleyê Cizirî ji di wê li hev kombûne de amede dibe.Piştre li wir bi hev re diaxivin û hevdû bi hev re hevdû hê bêhtir nas dikin.Di wê heyeme de demeke dirêj li nig hevdû dimenin.Piştre êdî ji hevdû qut dibin. Piştre ku ji hevdû qut dibin, êdî piştre li Cizîre bota her weha bi wî awayî hinek carên din hevdû di bînin.

Mele Serhengê Zaxoyî, dema ku hatibû ber serê seydeyê mazin, çawa ku rûniştibû, pêşî jê re diayek kiribû.Piştre hinekî bihizir hazinî bû.Dema ku hazinî bû ji, her weha ew pevajo û demên ku jîn kiribûn di ber çavên wî de weke xatekek jiyanê bûhûrtibû bûn.Hemû ew dem hatibû bûne bîre wî di wê heyeme de.

Mele Serhengê Zaxoyî, dema ku ketibû hizre de, weke qadareke her weha di hzirê de mabû. Di serê xwe de çûbû bû.Ew ji pîr bû bû.Ew ji kal bû.Lê li ser xwe bû.Li ser xwe dimeşî. Dema ku dimeşî ji, ji ciwanekî siviktir dimeşî.Herweha li ser xwe bû.Lê dema ku lê dihata meyîzendin ji, dihata dîtin ku çawa pîr bû ya.Riha wî ya sipî ku digaha ser singe wî, ew pir bi bal dikir li ser çavên mirovan.Ew ji di wê rewşa xwe de pir li ber çavan bû.

Di wê heyeme de de ji dema ku li ber tirbe seydeyê mazin Meleyê Cizirî rûniştibû bûn ji, ew ketibû bû hinek hizran de.Di serê xwe de piştre çûbû bû.Piştî ew bîranîn pêre çebû bûn, êdî piştre ketibû hizran de.Êdî di serê xwe de çûbû bû.Seydeyê mazin meleyê Cizirî, bi rastî ji mirovekî ku

mazin bû.Pir bi zane bû. Aqlê wî mazin bû.Li ser têgihiştinê pir di rawastaha. Dema ku di nav mirovên li dore xwe de diaxift, bi pêrranî, li ser têgihiştin û rastbûnê di rawastaha.Wî têgihiştineke rast ne dide bi malê dinyeye hemûkî.Her gotinê ku ji deve wî derdiket û mirovan his dikir, êdî ji aliyê wan ve ji ne dihata ji bîr kirin.Hertimî gotinên wî û nêzîkatîyên di aqiland de diman..

Dema ku mele Serhengê Zaxoyî ji lê hisand bû, ji wî di serê wî de, hinek bêja û vegotin hebûn.Di wê heyeme de ew ji di serê wî de bibîr bû bûn.Dema ku her weha di serê wî de bi bîr bû bûn ji, êdî ew ji di serê xwe de çûbû bû.Ketibû bû hizran de bihazn.

Her weha wê rewşê weke qadareke berdewam kir.Piştî yê ku herî weke ku bi hazn bû Mihamed, ew bêdengî xira kir.Piştre kir ku biaxivê û bide axiftin.Her weha hewldana wî çêbû. Dema ku her weha hewldana wî çêbû, êdî piştre weke ku mele Silêman ji tevlî wî bû û axivî. Wî ji hinek gotin vegotin.Dema ku wî hinek gotin vegot, êdî piştre mele Serhengê Zaxoyî û faqa Qasim tevlî axitinê ku wan kir bûn.Dema ku ew ji tevlî axiftinê bûn, êdî piştre hêdî hêdî di nav wan de hinek axiftin çêbû.Axiftinê wan piştre hinekî zêde bû.Her çarak ji hizre wan mazin bû, û mirovne zane û di zanebûne xwe de mazin bûn.Ji ber vê yekê ji dema ku axifti bûn, êdî piştre wan gelek hizir dîtibûn ku bênine ser ziman.

Mirovên ku zanist bin, divêt ku mirov bêjê, ku axiftinek li nig wî bû, hertim bi gotine.Ew hertimî xwedîyê hizrekê ku wî ya ku heya.Lê divêt ku mirov bêjê ku zanistitî, bi hizre baş û qanc re heya. Li ser rastiye rastteqîniyê mirov bi pêş dikeve.Li ser hizre mirov bi pêş dikeve. Kengî herweha bû, êdî mirov karê bahsa zanistitîyê bike.Zanistitî ew ku mirov xwedîyê hizreke ku bi mirov re û rastîyê re bêne ser zimane.Di wê demê de ji zanistitî ev bû.Zanistitîyê di hîme xwe de ev di parast.Zanistitî, di zanebûne de li mirov(di mirov li rastiyê û rastteqîniyê de) gerendine ji.Di wê demê de ya ku ên zêde dibû ji ev yeka bû.Hizre mirov û bi mirov re li pêş bû.Bi pêş diket.Bi pêş ve diçû. Li Kurdistanê, temenê bi vî awayî hizrîtiyê di dema Medan de bi pergal dibe û pêş dikeve. Di wê demê de hizir mazin pêş ketibû.Li cizire bota bi pêşketîtir bû.Zerdûşt, di wê demê li gor pêşketine wê demê tenê avesta bi 21 pirtûkên li duv hevdû re nivîsandibû.Ku Îskenderê Zûrqarneyn dema ku erîşî wan kiribû ku ew ji hole ne rakiribena wê iro di destê me de bena.

Cizire bota xwedî pergaleke ku mirov bi gelek awayan bêne ser zimana.Di nava vê yekê de hizre mirov têt ser ziman û bi pêş dikeve.Zanist ji di wê demê de zanistên pêş ve xistinê vê  hebûne bûn.Nirx û hizir dema

ku bi hev re bû, êdî pêşketin mazin heya ku derkeve hole.Li Cizîre bota bi vê yekê mazin derketibû hole.Li Cizîre bota dema ku mirov dihizire, hingî mirov diînê ku berekete Diclê û nirxên weke nirxa Nebî Nuh pergala bi mirov avakiribû. Dema ku bêjê ku divêt ku rastî û pêşketinê Cizîre bota têbigihê, divêt ku mirov zanibe ku divêt ku mirov pêşî van rastteqîniyên wê têbigihê. Hingî, mirov wê têgihiştineke di derbare wê de bi xwe re di serê xwe de çeke.Li cizîre bota mazin bûn ji û bûne zanist ji bi fahmkirin û têgihiştine van rastîyan û rastîyên wê yên weha bû.Mihamed, dema ku di serî de hatibû wir, hingî,pêşî xwe da bû têgihiştine nirxên wê.Wê hizir û hebûne Nebî Nuh baş û qanc nas kiribû. Hinekî mazin bûne wî, di temenê xwe de vê yekê ji di pareze.Bi vê yekê re fahmkirin û têgihiştin, mirov ji bi zanîne wî re dikire nirxek.Ku mirov her weha rastîyeke fahmneke, mirov wê baş tênegihê.

Maihamed, mele Silêman, faqa Qasim û mele Serhengê Zaxoyî ku hinekî li hevdû dirûnihin û diaxivin, êdî piştre hin bi hin hinek faqa ji tên ku werin û li nig wan rûnihin.Dema ku hinek faqayên din tên û li nig wan dirûnihin, êdî ew ji ji wan re bidest axiftinê dikin.Ji wan re li ser hizir û rastiyê û rastteqîniyê dirawastihin û diaxivin.Demeke dirêj ji wan re her weha diaxivin. Di wê heyeme de yê ku herî zêde li ber faqayan diaxivê ji faqa Qasim û mele Serhengê Zaxoyî dibe.Piştre hinek gotin ji deve mele Silêman û Mihamed ji derdikevin.Faqa Qasim, Mele Silêman û Mihamed ji ber ku mele Serhengê Zayî li nig wan weke ku mêhvane, êdî bêhtir maf didine wî dikin ku ew bipeyivê.Ew ji ne bêje ne û dipeyivê.Zanebûneke wî ya mazin hebû.Mihamed, dema ku ew hinek axiftin, êdî piştre di dawiyê de axift.Dema ku axift ji kir ku bala herkesekî di wê heyeme de herê ser wî.Mihamed, di wê heyeme de dema ku axift, hingî, li ser rastteqîni û hinekî dîroke ji sekinî.Di wê demê de ew pir li mezele Seydeyê mazin dima û dixwand.Bi vê yekê re ji divêt ku mirov bêje pir dinivîsî.Gelek tomarên ku nivîsî bûn li ber wî li ser hevdû bûn.Mihamed, dema ku axift, di nav axiftinê xwe de car bi car li wan nivîsên xwe ji dimeyîzend.Hinek gotin ji wan nivîsên xwe ji ji wan re dixwand.

Dema ku Mihamed her weha axift, Hingî, ne tenê re faqihên ku li wir di wê heyeme de, lê şaq mabûn.Bi wan re Mele Silêman, faqa Qasim û mele Serhengê Zaxoyî ji lê şaq mabû.Pir bi bal lê dihisandin.Ew ji ne peyivî bû û ne peyivî bû û di dawiyê peyivî bû û dema ku peyivî bû ji xwe di nav peyivbûne xwe de biribû.Kiribû ku herkesekê li dore wî lê şaq bimene.Mihamed di wê heyeme de demên xwe pir bi hizirkirin, xwandin

û nivîsandinê re dibûhûrand.Pir dixwand, dihizirî û dinivîsand.Li ber tirbe seydeyê mazin bi zêdeyê demên xwe di bûhûrand û dixwand û dinivîsand.

Gelek caran dema ku li wir dirûnişt, mele Silêman ji dihata nig wî û li nig wî dirûnişt û pêre li ser hizirkirin û xwandinê wî diaxift.Mihamed dema ku diaxift ji, car bi car li ser hizrên ku di wê demê de xwe gahandinê de ji jê re tanînine ser ziman.Mele Silêman ji lê dihisand û jê re li ser hizrên ku wî ji wî re anîne ser ziman hizrên xwe tanînine ser ziman.Her weha bi hev re mirov kare bêje ku dan û standineke wan ya mazin hebû.Bi vê yekê re ji, divêt ku mirov ji bîr neke û bêje ku têkilîyeke wilo mazin û kur bi faqa Qasim re ji hebû.Hersêk ji hev re pir baş û qanc bûn Weke du bireyan bûn.

Di wê heyeme de ji dema ku Mihamed li ber axiftibû, hingî, li ser hinekî hizrên xwe yên ku nivîsandibûn ji wan re axiftibû.Ji wan re hizrên xwe pêşkêş kiribû.Wan ji bi hey û şaq lê dihisand.Yê ku di wê heyeme de herî zêde lê şaq mabû û zêde lê bihey dihisand ji mele Serhengê Zaxoyî bû.Mele Serhengê Zaxoyî, di wê heyeme de weke ku wî di serê xwe de kifş bike bû bû.Her weha lê dimeyîzend.Mihamed bi axiftinê xwe re herkesekê li wir bi xwe ve girêda bû bû.Mele Serhengê Zaxoyî yek ji wan mirovên ku pêve hatibû girêdan bû.Lê şaq mabû û lê dihisand.

Wê rewşê, weke qadareke berdewam kir, wê rewşê berdewam kir haya ku Mihamed axiftine xwe bidawî kir.Piştî ku Mihamed axiftinê xwe anî ber dawî kirinê û ku bidawî kir, êdî piştre ku ma sekinî ji, weke ku ew mirovên li dore wî werine xwe li wan hat.Wan xwe bi gotinên wî re di xwe de winda kiribû.Her weha bû bû.Piştî ku Mihamed sekinî û weke ku mafê axiftinê ji wan re berde, êdî yê ku di wê heyeme de mafê xaberdanê pişt wî re girt ji mele Serhengê Zaxoyî bû.Dema ku Mele Serhengê Zaxoyî mafê xaberdanê girt û axift, hingî, tenê gotinê ku pêşi ji deve wî ji nav lêvên wî derket ew bû ku ´aah ti çi xweş û azîz û delal axiftî´ bû.Ku her weha got, piştre êdî hinekî dî ji axift û hinekî hizre xwe ji anî ser ziman û piştre sekinî û mafê xaberdanê da mirovên li dore xwe di wê heyeme de.Pişt wî re yê ku mafê xaberdanê hilda faqa Qasim bû û dema ku faqa Qasim mafê axiftinê hilda ji, li ser axiftinê Mihamed û hinekî li ser nivîsandinê wî sekinî.De ne, di wê demê de, Mihamed bidest nivîsandine nivîsaneke ku pir mazin kiribû û ew çend sal bûn ku dinivî ji.Heya faqa Qasim ji wê hebû.Faqa Qasim ne tenê heya wî jê hebû, weke mele Silêman heya wî ji navaroke wê ji hebû.Li ser pir diaxiftin. Hizre xwe ji ji Mihamed re li ser tanînine ser ziman..

Mihamed,di wê heyeme de li ser nivîsaneke mazin di rawastaha.Tişte ku dinivîsî ji li mezele Seydeyê mazin meleyê Cizirî dihişt.Ji ber ku hertimî,

ku demên wî çêdibûn dihata wir û li wir dirûnişt û xwand û dinivîsand.Mele Seilêman ji ji ber ku li medrese sor weke seydeyekî bû ew ji hertimî bi wî re bû û heya wî ji wê yekê hebû. Bi wî re ji hertimî ku kengî derfete wî çêbû bûne faqa Qasim ji dihata wir û li wî dirûnişt û pêre li ser hizire wî û nivîsanên wî pêre daxift.Bi vê yekê re divêt ku mirov hinekî mazin bahsa Mihamed bike.Ji ber ku di rastiyê de ji birastî ew mazin bû.

Mihamed, dema ku diaxift, pir li ser xweza, û jiyane xweza û dîrok û hizre dîrokê û hizre olê disekinî.Li ser mazinbûne di nav hizre olê de di rawastaha.Hinek hizrên xwe li ser vê yekê ji tanî ser ziman.Wî riye mazinbûne di xwe dane de di dît.Wî di got ku´dema ku mirov xwe ne diyê de û ne keve wê riye de, hingî, wê pêşçûyin ji çênebe´.Her weha Hizre xwe tenî ser ziman.Pir li ser mazinbûn û bifahmiyê dirawastaha.Kijen mêji baş û zû mazin dibe û bi pêşdikeve, li ser vê yekê hinek hizrên xwe tanînine ser ziman.Li gor wî di serê mirov de bi têgihiştinê rastiyê re mirov mazin dibe.Ew ji dema ku mirov di serê xwe de kete riye rastteqîniyê de dibe.Wî di gotinê xwe de û di jiyane xwe de pir girîngî dide rastteqîniyê.Li ser wê pir di sekinî.Dema ku hizre xwe tanî ser ziman, hingî, pir di axiftinê xwe de li ser disekinî. Di serê wî de bêjeyeke rastteqîniyê ku j mirov ne dûr û mazinbûneke bi xwude re ji dikire nava xwe de hebû.Di nivinaên xwe yên mazin de ji li ser vê yekê disekinî.

Di dema wî de pir nîqaş hebûn.Pir di serî de çûn û hatin hebû.Pir xwandin û di hizir de mazinbûn hebû.Li ser vê yekê mazin di sekinî.Wê di serê xwe de dema ku hizir dikir û dema ku hizre xwe tanî ser ziman ji, weke ku dixwest ku hizre xwude bifelsefeyeke mazin bêne ser ziman.. Her weha dihizirî û hizrê xwe çêdikir.Wî di gotinê de rê di dil de şanî mirovan dide. Lê belê ew riye ku di dil de şani mirovan dide ji, di hizir de rê jê re didît û hizre xwe li ser vê yekê tanî ser ziman.Bi vê yekê re divêt ku mirov bihasibenê ku ew xwedîyê çend hizreke ya. Hinek nîqaşên ku di wê demê de dibûn, wî dikire nava hizran de.Berî wî ne bi gelek re bûyere Hasan-Hûseyîn hebû.Wê bûyarê di nav aliman de ji hinek niqaşê mazin dabûbûne dest pê kirin.Ew ji li ser wan dihizirî.Li ser vê yekê dihizirî û di hizre xwe de weke ku bixweze riyeke baş û qanc dihizirî.Li ser wê yekê bû ku wî xwestibû ku binivîsenê û bidest nivîsandinê ji kiribû.Nivîsaneke mazin bidest nivîsa wê kiribû.Pir dirêj bû..

Dema ku bidest nivîsandinê kiribû, hingî, pir dihizirî.Dema ku bidest nivîsandinê dikir, dikete mezele seydeyê mazin meleyê Cizirî û dikete hizarande û dinivisî.Ji xwe dî wê heyeme de, dema ku axiftibû, hingî, li ser vê yekê ji xaberda bû.Ya ku Mele Serhengê Zaxoyî lê şaq hiştibû ew hizrên

wî yên ku li ser vê nûqtê bûn.Hinek hizirne wî ji hebûn.Ew ji li ser wê bûyerê ne bêhizir bû.Ne bêtêgihiştin bû.Piştre dema ku ew ji axiftibû, li ser wê yekê hinek zanînên xwe anîbû bûne ser ziman.

Lê Mihamed pir bal kişandibû ser xwe di wê heyeme de.Bi hizre xwe re bal kişandi bû ser xwe di wê heyeme de.Yê wî, hizreke wî ya mazin û dirêj û kur hebû.Dema ku axiftibû, her weha ev yek ji pir baş û qanc hatibû têgihiştin.

Mele Serhengê Zaxoyî, ev yek pêre û hizre wî baş têgihiştibû.Têgihştibû ku Mihamed di serê xwe de çend mazin û kure.Wî ev yek kifş kiribû di wî de bi axiftine wî re.Piştre bala wî çûbû bû ser wî.Bala xwe ji ser wî qut ne dikir.Hertimî lê ji dimeyîzend.Mihamed ji dema ku axiftine xwe bidawî kiribû û mabû sekinî êdî bêdeng bû bû.Lê axiftin pişt wî ne sekinî bû. Piştre axiftin di nav mele Serhengê Zaxoyî û faqa Qasim û mele Silêman de berdewam kiribû. Mihamed bêdeng bû.Lê car bi car ji bi hin gotinne tevlî axiftinan dibû.Hizre tanî ser ziman. Faqa Qasim û mele Serhengê Zaxoyî, berê xwe dabûbûne hevdû û bi hev re di nav axiftinê kur çûbû bûn.Herdûk ji du mirovên zane bûn.Xwedî têgihiştin û zane bûn.Pîr ji bûn. Mirovne navserî xwe ji bûn.

Mihamed, mele Silêman, faqa Qasim û mele Serhengê zaxoyî demeke dirêj li hevdû di rûnihin û bi hev re dipeyivin.Hizreke mazin di nav xwe de bi axiftinê di dênine hole ji hev re. Bi axitinê ji, her weha demeke dirêj dibûhûrênin.Piştre ku dem hinekî bi ber êvarê ve diçê, êdî ew ji dikin ku nîqaşên xwe bi birrin û kara xwe bikin û ku herinê qasre.

Piştre demeke dî ji her weha li nig nevdû dimenin û b hev re aixivin.Piştre ku dem hinekî dî ji dibûhûrê êdî piştre bi hev re kara xwe dikin ku herine qasre.Li qasre di wê kêlîkê de wê civatê li hevdû bidest kombûne kiribena.Wê civate mîr li hevdû kombû bena.Mele Serhengê Zaxoyî ji navê wî hebû.Mirovekî ku zane û alim dihata hasibandin.Hinekî şêxitî ji pêre hebû. Ev yek ji dibû sedemek ku ew hinekî mazin bê pêşwazî kirin.Dema ku ew hatibû û piştre ku çûbû mizgefte Nebî Nuh û li mêj kiribû û piştre ku li hatibû kifşkirin êdî piştre mirov lê gahabûbûne hevdû.Her weha êdî kombûneke mazin li dore wî çêbû bû.Mele Serhengê Zaxoyî, ji aliyê xalkê ve rêzeke mazin jê re dihata nîşandin.Mirovekî wilo, vêce ku ne çûbena civate mîr û lê ne rûniştibena ji ne dibû.

Wê gelek mirov hatibena civate mîr ji bo ku wî ji bibînin.Ji ber ku navê wî ji hebû.Ew ji xwedîyê hizirne ku di nav xalkê de mazin dihatine ser ziman û vegotin.Navê wî her weha hebû.Dema ku bi Mihamed, faqa Qasim û mele Silêman re hatibû medrese ji li wir ji ji mizgefte hinek mirov pêre

hatibûn.Li medrese ji hinek mirovên sofî û faqa ji li wan gahabû bûne hevdû.Li wir dema ku rûniştibû bûn û ji hevdû re axiftibû bûn ji, ew mirovên ku bi wan re hatibûn ji li dore wan bûn.Li wan dihisandin.Li hizre wan dihisandin.Bi hev re dan û standine dihisandin û guhdar di dikirin.Di wê heyeme de guhdarkirineke mazin hebû li wan. Ew ji bi hev re diaxiftin û yên li dore wan ji li wan dihisandin.

Dema ku her weha wan hizre xwe anîbû ser ziman ji ji hev re, mirovên li dore wan ji hizre wan ya ku ji hevdû re anîbû bûne ser ziman ferkiribûn.Wan ji li hizre wan û vegotine wan hisandibû.Mihamed dema ku anîbû ser ziman, hingî, pir bal kişandibû ser xwe di wê heyeme de.Bala wan mirovan ji kişandibû ser xwe di wê heyeme de.Faqa Qasim ji û mele Silêman ji û Mihamed ji ji aliyê wan mirovên li dore wan ve pir baş û qanc dihatina nas kirin. Hizre wan dihata zanîn.Faqa Qasim ji divirde divêt ku mirov careke dî bêne ser ziman ku xwedîyê hinek nivîsanên mazin û dirêj bû.Li Mizgefte Nebi Nuh wî pir demên xwe bûhûrandibû û di wan demên xwe de pir nivîsandibû.Li wir nivîsên wî di sekinîn.Mirovên ku diçûne wir û ku dixwandin an ji li wir dirûniştin, êdî çavên wan ji bi nivîsên wî ji diket û dixwandin.Ew ji her weha pir dihata xwandin.´Li ser têgihiştine rast û rastteqîniyê Nebiyan´ hin nivîsên wî hebûn.Ji xaynî wê ji têt gotin ku li ser ´hikmete´ji hin nivîsanên wî hebûn.Wî ji weke Elî herîrî pir girîngî dide xweşik axiftinê.Ji xwe zimanekî wî yê pir xweş û xweşik ji hebû.Ku diaxif, weke ku helbesteke bixwenê li mirovên li dore wî ku lê dihisandin dihat.

Mihamed ji zimanê wî wilo xweş û xweşik bû.Dema ku di civate hevdû de li hevdû di rûniştin ji, ku diaxift weke ku helbesteke bixwenê li mirovan dihat.Gotinên wî ji serê mirovên êdî ne diçûn.Di serê mirovan de diman.ne dihatina ji bîr kirin.Ji xaynî wan vegotinên wî yên di nav civatan de ku weke helbesteke ku ne dihatina ji bîr kirin, ew nivîsanên wî yên ku di nivîsandin ji di nav aliman de deng divedan.Bi vê yekê re divêt ku mirov bêje ku navê wî hebû.Hin bi hin ji navê mazin dibû.Hin bi hin bi gotin û hizrên wî yên ku dihatina ser ziman re ew di serê mirovan de dima.Di serê mirovan de cihekî ku mazin digirt.

Lê divêt ku mirov divirde, wê dema Mihamed ya ku li cizîre bota meyî, hinekî mazin ku şîrove bike.Ew dem, ne tenê weke demeke ku ew li wir dimene ya.Ji wê zêdetir ji, weke demeke ku ew mazin dibe û di nav zanist û aliman de cih digirê ya.Ew dem, ji bo wî demeke ku girîngê.Ew dem, ku newê têgihiştin, bêguman wê rastî û hebûne Mihamed baş û qanc newê têgihiştin.Ew dem, demeke ku mazina ji bo wî û pêşketine wî.Ew di wê demê de hinek pirtûkan ji dinivîsenê.Bi vê yekê re, ew li wir di wê

demê de li pêş e û derdikeve pêş. Di wê demê de, di nav kurdan de pir mirovên ku bi hizre xwe nav dana hena.Li başûre kurdistanê ji hena.Ji xaynî mele Serhengê Zaxoyî hin mirovên din ji hena ku navê wan heya.Abdilahê Dohukî û meleyê Gorî(Goranî) tenê hinek ji wan in.Meleyê Gorî ji xwedîyê ´tefsîr´ereke ku di nav aliman de mazin dihata ser ziman bû.Bi wê tefsîre wî navê wî hebû.

Mirovên weke mleyê sorî ne zêde berî wê demê jîn bû bûn.Hinekî berê wê demê jîn bû bûn. Lê navê wan ji hebû.Meleyê Gorî ji di dema xwe de hatibû cizîre bota û li wir ji demeke mabû.Ji ber ku xwedîyê hişekî xort û mazin bû û di serê xwe de mazin bû, derdikeve pêş. Lê zêde li Cizîre bota ne mene.Hinekî li wir dimene.Dema ku ji Cizîre bota di vaqatihê êdî têt herême xwe Şehrezor û li wir ji li medrese demeke seydetîye dike.Di aslê xwe navê wî yê ku li Cizîre bota pê dihata nas kirin ji mele Ahmedê Gorî bû.Li wir li Cizîre bota bi zanebûne xwe re qadrekî mazin dibînê.Navê wî ji derdikeve.Ji ber ku bi ahlitîye xwe ve nêzîkî mîrê Badînan bû, êdî li qasrê ji biqadr û qiymet têt pêşwazî kirin.Mîre bota ji bi vê yekê re qadrek di dayê de.Di wê demê de, dema ku mîre bota hê ku ew li wir e, ku bi serkî diçê nig mîre Bandînan, wî ji bi xwe re dibe û careke dî di vegerenê bi xwe re.Ji ber ku meleyê Gorî bi malnate xwe re ji bi nav û dengê, qadrekî wî heya.Dema ku li Cizre bota dimene ji, Mîre bota qadrekî mazin didiyê de.Wî ji civate ti demê kêm nake.

Meleyê Gorî, bi aslê xwe re mazin bû.meleyê Gorî piştî ku demeke li Cizîre bota dimenê, êdî piştre divegerihê malê.Li ser xwesteke bavê wî ew divegerihê malê.Ji ber ku bavê wî li ber zikrete ya.Dema ku divegerihê êdî ne bi gelekî re êşe bavê wî ji çêdibe.Piştre ku bavê wî digihê rehmate xwe û ku çilê bavê bidawî dibe ji ew ne vegerihê Cizîre bota.Li wir dimene. Dema ku dimenê, demeke li dergahê bavê xwe dirûnihê.Lê birayê wî yê jê maztir heya û ew ji bo hûrmete xwe rê dide wî û li ser dergahê li dewsa bavê wî piştre bireya wî derdikeve pêş. Ew ji di wê heyeme de vala ne sekinê.Li herême xwe digerihê.Di nav aliman de diçê û têt. Bi alimên ku hena re di rûnihê û wan û hizre wan ferdike.Her weha demeke ji di bûhûrnê.Piştre di wê gera xwe de têt herême halebçê.Li wir ji demeke bi mazin û aliman re dirûnihê û dide û distenê.Li wir êdî dimene.Li wir, ew di mizgefte de bidest fêrkirinan dike.Piştre bi alikarîya Mîre badînan ji li wir medreseyeke bi nav ´medrese seyda´ avadike û têde bicih dibe û bidest fêrkirine dike.Divêt ku mirov bêjê ku ew xwedîyê diwaneke ji bû.

Dema ku ew li Cizîre bota mabû, hinekî navê wî derketibû.Bi hzire wî re navê derketibû. Piştî ku ew ji wir çûbû bû ji, piştî wî re bahsa wî û hizre wî û axiftine wî dihata kirin.

Meleyê Gorî divêt ku mirov hinekî dî ji bahsa wî bike.Ji ber ku piştre ji jiyane wî her weha hinek kirinên din ji di nav xwe de tênê ser ziman.Ew bi zêdeyî ji li ser felsefe û olê perwerdeyeke mazin hilda.Li Şamê, Kudûsê û li qahîre ji ma.Li wanderan ji bi hinek alimên mazin yên herême ku navê wan hebû re rûnişt.Li baxdayê ji demeke ma.Ev gerên wî piştî mirina bavê wî re dibe.Piştre ew vegerehe bû kurdistanê û li kurdistanê bidest fêrkirinê kiribû. Piştre ku di vegerihê kurdistanê ji, têt gotin ku ji rêveberîye osmanîyan pêre dikevine têkilîye de û têt qasre osmanîyan û demeke di qasre osmanîyan de li nig Muradê duyemîn dimene.Di wê demê de têt gotin ku wî bidest dayîne fêran li Mehmedê duyemîn kir û piştre ji aqildantiye wî kir.Hizre hildana Costantîpolisê(iro stembûl) ji têt gotin ku wî kire serê wî de.

Piştre ji ji ber zanebûn mazinbûne aqlê wî, dibe ´kazasker´ê rumelîyê.Li wir ji ji aqilmenditîya hizre huqûqê dike.Li wir di vê astê de nêzîkî 30 salî dimene.Piştre li qasre osmanîyan unwana ´Şeyhûlislam´tiyê distenê.Ji xaynî pirtûka xwe ya ku pê têt naskirin ya bi navê ´tefsîr´ê, hê gelek pirtûkên din ji dinivîsenê.Her çend ku ew her weha zanistekî kurd ê mazin bet, ji ber ku di jiyana xwe de ji demeke pê de bi osmanîyan re dimene, di nav kurdan de êdî zêde navê wî weke Idrîsê bedlîsî ne dihata hildan.Idrîsê bedlîsê ji ni zanistîye xwe re mazin bû.Nêzîkî 29 pirtûkan nivîsand.Pirtûkên di demeke de pir bi deng hatina ser ziman ji. Navê wî ji mazin hebû.Mîr û zanistên kurdan navê wî mazin pêşwazî dikirin.Bi vê yekê re divêt ku mirov bêje ku bandûreke wî ya mazin hebû.Ew çawa çûbena, ji ber zanistitîye wî pir mirov li pay wî diçûn.Gelek pêşketinên li Kurdistanê wî bidestê xwe ji dana çêkirin.. Di dema hêze osmanîyan li Tebrizê têkçûneke dixwe û ji divaqatihê, êdî Kurdistan ji weke dimene bi serê xwe.Hêze osmanîyan nîne ku bişene ser kurdan.Qasre osmanîyan ji vê yekê dibînê û kifş dike.Idrîsê bedlîsî ji di wê demê de ji hêzên herêmê hêzeke mazin û ji 15 hezar mirov zêdetir pêk têt ava dike û pê mêrdinê û Amedê dike bi awlakarîye xwe de.Piştre ji ber ku bi Siltanê osmanîyan Yavuz selim re têkilîyên wî ji xortin, êdî van herêman dike destê wî de.Piştre Idrîsê bedlîsî weke ku peymeke ji bi wî re çêdike ku wê kurd û tirk bi hev re jîn dibin.Wê peymene ji li Amasya çêdikin.Li gor wê peymene wan wê kurdistanê weke ku berê çawa bû wê bi mîr û mazinên xwe ve bi rê biçê û wê ew hebûne wan wê bi peymene bê fermîkirin.Bi vê

yekê re peymene 1515 têt çêdikin li Amasya di naqabina Yavuz Selim û Idrîsê bedlsî de.Li gor peymene wan´kurdistan dise herêemeke weke berê ku bi serê xwe ya´ û´girêdayî herême osmanîyan bêt´.Dema ku Idrîsê bedlîsî bi Amed û Mêrdinê re serdestîyan erê dike, êdî pê re ji, serdestîyan osmanîyan li herêmên weke Urmîyê, Emedîya, Cizîre bota, Bedlîs, Xizan, Garzan, Palu, Sêrt, Heskîf, Farqîn û herême botanê ku heya rojavayê kurdistanê dixiste nava xwe de û bi wan re ji hê 25 cihên din bi osmanîyan ve têne girêdan..

Di wê demê de, weke mîr van herêman ji li Bedlîsê mîr Şerefeddin, li xizanê mîr David, li Heskîf mîr Xalîl ku kurê Melîlê duyêmin ji jê re dihata gotin, û li Emedîyê ji mîr Hisên hebûn.Ew mîr, yên ku li herêmên xwe bi wê peymene re dibîne xwedî ´hukumet´di herême xwe de, bûn.Herêmên ku bi wê peymene re ´sancakan´ distenin û dibine hukumet ev bûn; Cizîre bota, Bedlîs, Suran, Heskîf, Emedîya, û Çemişgezek.Ev, yên ku mazin bûn.Hêze wan hebû.Weke hukumet bûn.Hinek herêmên biçûk ji bi ´sancak´ dibin.Ew ji her weha ne navê wan; Xizan, Sason, Palo, Çapakçur, Sivêrek, Çermîk, Zêrik, Hizo, Sincar, Elih. Piştre bi hewldana Idrîsê bedlîsî, Rihe, Erganî, Harput, Elezîz, Siverek, Nisêbîn li ber xwe nadin û di kevine bin îdere osmanîyan de.Di wê rewşê de her herêm li gor kevneşopî û zimanê xwe dijiya û ti asteng wê derketibena pêşiya wan.Ev peymen 5 salan li ser lingan dimene.Piştre ku Yavuz Selim çû û Qanunî Siltan Sileyman hata dewsa wî, bi fermanakê ev peymen ji ji hole rakir.Êdî herêmên ku berî hingî bin destîye osmanîyan erê nekiribûn weke Agirî û hinek herêmên din yên botanê ev herêm j rastî erîşên osmanîyan tên.Siltan Sileyman, piştre sefereke li kurdistanê dide kirin.Piştî sefere wî re li kurdistanê pir xuruxandin çêdibe.Ji ber vê yekê bû ku êdî li kurdistanê navê Idrîsê bedlîsî zêde ne dihata ser ziman.

Kurdistanîyan, di van pevajoyan de pir êş û elem kişandin.Pir çûne ser wan çêbû.Piştî Yavuz Selim re kurê wî Siltan Sileyman ji bi hêzeke çûbû ser wan.Rewşe wan hinek zêde ji ji ber vê yekê Xira bûbû.Cizîre bota di wê demê de xort bû.Zêde wilo ti hêzên osmaniyan wêra ne dikirin ku herine serde.Mîre bota xwedî hêz bû.Navê wî hebû.Ku wî dengek dabana dore xwe, wê hêzeke ku mazin li dore xwe dabana hevdû.Her weha mazin bû.Mirovên ku ji bo mîr çûban mirinê pir bûn.

Ji ber vê yekê ji Zêde ne çûbû bûne ser wan.Zêde wêra ne kiribûn ku herine ser wan de.Weke Herême Cizîre bota û herême wê, her weha herême badînan ji wilo bû.Ew ji bi hêz bû.Kurd di nav xwe de mazin û bi dewlet jîn dibûn.Di wê demê de ev yek wilo bû.Herême Mûş û Sêrtê ji

mirov kare her weha mazin şîrove bike.Lê hin herêmên biçûk rastî êerîşan hatibûn.Piştre hêdî hêdî çûbûbûne ser hinek herêmên din ji.Bi vê yekê re divêt ku mirov bêje ku rewş li ser lingan bû.Piştî Şerê ku li Çardiranê di nqabîne Şêx Ismail û Yavuz selim de bûyî, êdî rewşeke dî afirî bû bû.Hin bi hin ji wê rewşê xwe dide der.Kurdên rojhilat ji rewşe wan ne xweş bûbû.Tenê hin ku kurdên ku bi Yavuz Selim re Şer kiribûn Weke demeke ne çûbûna ser wan çêbû bû.Lê piştre ew ji guharî bû.Yavuz Selim piştî şer, li kurdistanê, mîrên ku ne xwestibûn ku bi kevine şer de, piştre rastî gazaba wî hatibûbûn.Piştî ku Yavuz Selim ji Çardiranê di vegerihê, êdî sefereke bi vê yekê re li kurdistanê ji dike.

Ya rastî ku mirov bêjê, piştî wê têkçûne ku Osmaniyan li Tebrize xwaribû, ku kurdan piştre bi Idrîsê Bedlîsî re alî wan ne kiribena, wê piştre dibêt ku bahsa wan ne hatibena kirin. Ew têkçûn wan dike rewşeke xirab de.Ji xaynî wê yekê divêt ku mirov bêje ku Idrîsê Bedlisî wan tenê di kurdistanê de bicih neke, piştre gelek êrîşn ku piştî wê têkçûne re ku diçine ser wan ji dide sekinandin.Bi vê yekê re mirov karê bêje ku êdî osmanî xilas dibe.Di çêkirine aramiya di nav wan de ji dise kurd dibine xwedî rol.Weke dema ku Bayazîdê yekemîn û birayê wî Yildirim han çawa ku dikevine hevberê hevdû de ku bi hev re şer bikin, ku Şêx kurd yê Çemîşgezekê diçê û nava wan çêdike, her weha di wê demê de gelek şerên wan yên navxwayî kurd didine sekinandin.Lê ev kirine kurdan hertimî weke şer ji wan re vegerehe..

Bi vê yekê re mirov divêt ku bêje ku kurd hertimî ji li ser xwe man.Li ser lingên xwe man. Piştî her êrîşên li ser serê wan bûn, xwe dise rakirina ser lingan.Bi vê yekê re ji hertimî serê wan bilind ma.Jiyane wan xwedîyê temenekî ku xort bû.Ji ber vê yekê ji, her êrîşn ku li ser serê wan dibûn, piştre karibûn ku xuruxandinên wê derbixin.Bi vê yekê re xwedîyê kevne şopîyeke bûn.

Dema ku Mihamed li mal bû û hê zaro bû ji, kalkê wî ravî bû.Ew ji ji ber her weha êrîşên ku li wan dibûn.Kalkê wî mazin bû. Ew ji mîrek bû.Navê wî ji hebû.Lê dema ku bi fermanê re xwasarîya ku ji wan re hatibû naskirin ku careke dî ji wan hatibû standin, êdî her weha li ber wê yekê rabûbû bûn.Weke wî pir mirov ji li ber vê yekê rabûbûn.Yên ku rabûbûn mîr bûn û mazin bûn.Dema ku ew li ber rabûbûn ji êdî ew ji hatibûbûne ser wan û ew ji ravî bûn.

Heya mihamed ji ji wan rewşan hebû.Ji ber ku civate mîr de bê an ji di civatên xalkê de bin yên ku dibûn de bê, dihatina ser ziman.Mirovan li ser wan rewşan serê di wastandin. Tiştên ku his dibihîstin ji hevdû re di

gotin.Pir caran di mizgefte de ji li ser wan mijarên ku dibûn nîqaş di nava wan de dibû.Bi vê yekê re kê çi zanibena ji hevdû di gotin.Bi vê yekê re rewşeke mazin hebû.Zanebeneke mazin bi mirovan re hebû.Li ser hebûn û nebûnan.Mihamed, ji hiskiribû.Pir caran ew ji ketibû nîqaşan de.Hin tiştên ku berê zanibûn û hin tiştên ku his kiribûn ji ji mirovan re di got.Bi vê yekê re ew ji tevlî danûstandinan dibû.

Di wê dema ku di medrese de li hevdû rûniştibûn ji, hin nîqaş li ser bûyar û demên berê di nava wan de çêbû bûn.Mele Serhengê Zaxoyî nû hatibû wir.Hin tiştên nû ji ji herêma xwe bê an ji ji hiskirinên xwe bin pêre hebûn.Wî ji di nav axiftinan xwe bi wan re hevpar kiribû.Bi wan re anîbû ser ziman.Dema ku wî anîbû ser ziman ji, mele Silêman ji û faqa Qasim ji û Mihamed ji pir baş û qanc lê hisandibûn.Wî ji ji wan re pir baş û qanc anîbû ser ziman.Her weha bi hev re demeke mazin bûhûrandibûn bi nîqaşan.Piştre ku demeke bi hev re û bi mirovên ku li wan re û bi wan faqihên li wir re her weha axiftibûn û nîqaş kiribûn, piştre êdî wan kara xwe kriibû ku herine qasre mîr.Wê civat li wir li dar ketibena.Wî gelek mirovên zane li wir li hevdû gahaban hevdû.

Dema ku wan kara xwe kir ku herin, êdî piştre ne bi gelekî re kirin ku rabin û herin.Gelek mirovên ku li dore wan bûn bi wan re bûn ji wê bi wan re çûban.Ew ji wê bi wan re çûban civate mîr û lê rûniştiban.Dem ji ji xwe ji hinek bi ber tarîbûnê ve çûbû bû.Êdî wê hêdî hêdî civat li hevdû gahaban hevdû.Ew ji vê yekê hizirin û piştre dana xwe ku herine civate.Dema ku kara xwe kriibûn ku herin, faqa Qasim yê ku pêşî rabûbû.Ew mirovekî ku rêze miorvan hemûkan jê re hebû bû.Dema ku wî dabû xwe êdî pêre mirovên din ji dabûbûne xwe û pê re rabûbûn.Dema ku faqa Qasim rabûbû ser xwe, êdî pê re mele Serhengê Zaxoyî ji dabûbû xwe û rabûbû ser xwe di wê heyeme de.Ku ew herdû rabûne ser xwe, êdî piştre mirovên din j yên li dore ´wan ji bi wan re rabûne ser xwe di wê heyeme de.Dema ku rabûne ser xwe êdî bi hev re dana dore hevdû û kirin ku herine derve.Mihamed û mele Silêman ji di rax hevdû de bûn.Bi hev re dimeşîn.Lê ne dorî faqa Qasim û mele Serhengê Zaxoyî bûn.Mele Serhengê Zaxoyî û Faqa Qasim li nig hevdû dimeşîn. Li pêşiye cimaate dimeşîn.Mihamed, li nig Mele Silêman di meşî.Lê bêdeng bû.Di serê xwe de weke berê di hizirî.Mele Silêman de dema ku meşîn avirek da wî û dît ku wa ew bihizire.Lê deynekir.Weke ku nexweze ku wê hizirkirine wî xira bike ma sekinî.Lê piştî ku farq kiribû ku Mihamed bihizire û bihizir dimeşê, êdî bala wî ji çûbû bû ser wî di wê heyeme de.Dengê faqa Qasim û mele Serhengê Zaxoyî dihat ku bi hev re ji mirovên li dore xwe re diaxiftin.Mele Silêman

ji car bi car bi hin gotinne tevlî axiftine wan dibû.Wî ji car bi car hi gotin tanînine ser ziman.Dema ku diaxift, li Mihamed dimeyîzend. Mihamed ji dihizir de bû.Lê ew nerînên wî farq dikirin.Dema ku wî lê dimeyîzend, êdî wî ji weke ku were xwe serê xwe di rakir û li wî dimeyîzend.Lê faqa Qasim û Mele Serhengê Zaxoyî yên ku herî zêde diaxiftin bûn.Di nav mirovên li doran wan de weke ku cerna tenê dengê wan dihat, li mirovan dihat.

Bi vî awayî re, dimeşîn û diçin ku herine qasre mîr ku li civate wî rûnihin.Mele Serhengê zaxoyî, dema ku ku hatibû j pêre pir mirov hatibûn.Piştre ji dema ku li Cizîre bota gahabû faqa Qasim, mele Silêman û Mihamed wan ji hinek mirovên din ji gahabû bûne wan di wê heyeme de.Bi vê yekê re bubune gelek mirov di wê kêlîkê de.Ku her weha bi gelek mirov re Mele Serhengê Zaxoyî, mele Silêman, faqa Qasim û Mihamed bi hev re di meşîn ku herine qasre, êdî piştr ne bi gelekî re digihine qasre. Dema ku digihine ber qasre lê hê ku ne gahabû bûna qasre rast hin mirovne din ji tên.Ew ji mirov diçûn ku herine qasre û l civate mîr rûnihin. Ew mirov ji ji aliyê kelê ve dihatin.Ew kela pir mazin bû. Ji her aliyê Cizîre bota ve dihata xuyakirin.Kela ji dema Gutîyan mabû. Li ser sê qatan bilind bû û ji 360 mezel û beşî zêdetir beş û mezelên wê hebûn.Kela bi aliyê Diclê ve ji xwedîyê hewsake ku pir fireh bû.Lê di hin êrîşn ku berê li ser bû bûn, di wan êrîşan da hatibû xuruxandin.Lê dise cihê wê mabû. Cizirîyan çêkiribûn.

Ew kela berî zayîne bi sê hezar berê hatibû çêkirin.Li gor hin zanistan hê kevntir bû. Haya dema Gutîyan dirêj bû diçû.Di wê demê de hatibû çêkirin.Wan ewder weke paytaxteke bi kar dianî.Jê re Gerzûbaqarta ji digotin.Her weha Cizîre bota xwedîyî dîrokeke ji bû.Lê ev dirok dîroke wê ya kevn bû.Ne ji wê roj bû.Lê li di wê rojê de ji dema ku lê dihata meyîzendin pir mirete û şûnpê ji wê rojê dihatina dîtin.

Cizîre bota ji gelek awayan ve ku dihata şîrove kirin dihata dîtin ku xwediyê hebûneke ku pir mazin bû.Xwedîyê gelek nirxan bû.Ji kijan alî ve ku lê dihata nerîntin ji ev nirx û hebûnên têde dihatine berçavan.Cizîre bota dema ku têt şîrove kirin, êdî mirov dibînê bi hizre xwe ve ji li pêş e. Berê wê di heyeme berê zayîne de li dema Birehim xalîl dema ku mirov dihizire, mirov pir pêşketinan di wê demê dibinê.Birehim xalîl hinek nirx mazin avakirin.Xwedî gelek hizran ji bû.Di wê dema mihamed de di wê dema ku ew jîn dibûn de pir hizrên wî yên ku di gotin ku wî gotina hebûn û nivîsî ji bûn.Ew ji pir dihatina xwandin.Pir dihatina ser ziman.Bi wan hizran di hizrên olî de û di hizrên qaadên din de ji pêşketin derdiketine hole.

Mihamed, bixwe ji hizrên wî pir xwandibûn.Bi hizrên ku hatibû bpne nivîsandin û digotin ku yên Nebi Nuh in.Hin hizrên wî ji li ser wan hizran hebûn.Wî ji hin hizrên xwe li ser wan hizran nivîsandi bûn.Hinekî dirêj ji nivîsandi bûn.Faqa Qasim ji li ser hizrên Nebi Nuh xwediyê hin nivîsan bû.Wî pir nivîsandibûn.Bi wî re, faqa Qasim li ser Êlimê rim kesk ji ku weke mirovekî ku mazin û alim dihata nas kirin û di deme dest pêka islemê de jîn bûbû ji xwediyê hin hizirne bû.Li ser wî ji weke dîwaneke afirandi bû.Faqa Qasim, li ser dîroke û zanist û mazinên ku berê jîn bû bûn, li ser wan xwediyê hizir û têgihiştineke mazin bû.Pir caran li hizir û têgihiştinên xwe bi mele Silêman û Mihamed re j axifti bû.Ji wan re anîbû ser ziman.Ji wan re bi lêv kiribû.Di qada hizir de çi û çawa zanibû û li ser dîrokê xwediyê çi hizir û zanebûne bû, bi wan re hevpar kiribû.Wan ji her weha çi zanibû bi têgihiştine xwe re bi wî re hevpar kiribû.Bi vê yekê re, mirov karê bêje ku li ser têgihiştin û hizre hevdû xwedî têgihiştin û zanebûn bûn.Bi vê yekê re hevdû nasdikirin.

Dema ku her weha bi hev re diaxiftin ji ji zanebûne xwe bi hev re diaxiftin.Pir caran faqa Qasim bi Mihamed û Mele Silêman re di medrese de li ber faqayan li ser hizre Birehim xalîl û têgihiştine wî axiftibû.Bi vê yekê re hin dan û standinên mazin kiri bûn.Li ser wê demê û kirinên wê demê diaxiftin bi hev re.Li ser çawa ku Nemrut Birehim xalîl digirê ku wê biavêje nav êgir û ku çawa wî di avêje nav êgir, êdî agir dibe av û darên di nav de ji bine masî dianine ser ziman.Bi vê yekê re, hê pir hizrên ku zanibûn ji hev re li ber hevdû û faqayan tanînine ser ziman.Faqa Qasim, ceran ku diaxift, bi kêlîkan diaxift.Hiç navber ne dideyê de û diaxift.Pir diaxift.Ji ber ku pir hizrên wî û zanebûne wî hebû.Bi vê yekê re ji, pir dixwest ku bêne ser ziman.Dixwest ku ya di serê xwe de di nav mirovan bêne ser ziman û bide wan.Bi vê yekê re û nêzîkatîyê ew ew dihata nas kirin. Ew her weha dihata nas kirin ku ew dixweze hertimî hizre xwe bi mirovan re hevpar bike.Ev yek rast ji bû.

Piştî ku Mele Serhengê Zaxoyî, faqa Qasim, mele Silêman, Mihamed û mirovên bi wan re ku digihine ber qasre, êdî silavê didine hevdû û digihine hevdû û dikevine nav hevdû de û piştre bi hev re diçin ku bi hev re bikevine hundirê qasrê de.Dema ku dikevine hundirê qasrê de, êdî bi hev re di hewsê de dikin bi bûhûrin û herine mezele civatê.Dema ku ew ketibû bûne hewsê de dîtibûn ku wan gelek mirov diçin û tên.Ji wê yekê mirov têgihişt ku li civate mîr di wê heyeme de gelek mirov rûniştî hena.Dema ku ew derketibûbûne banî û ketibûbûne mezele de ji, êdî dîtibûn ku wa gelek mirov rûniştî ne.Ku ew çûn û ketine hundir de, êdî

çawa ku wan silav da mirovên ku rûniştî ne, êdî ew ji bi silav hildane re li ber wan rabûne ser xwe û ew di nav xwe dana rûnandin.

Dema ku rûniştin ji, Mihamed û Mele Silêman hinek ji faqa û Mele Serhengê Zaxoyî wirde li nig hevdû rûniştin.Mele Serhengê zaxoyî û faqa Qasim li nig hevdû rûniştibû bûn.Mihamed, hinekî ji mîr wirde bû.Lê çavên mîr bi avir li ser wî bûn.Her weha dihata xuyakirin.Mihamed ji serê wî di ber wî de bû.Dema ku rûniştibû, bi mîr re çav bi çav hatibû.Lê zêde ji bi wî re çav bi çav ne ma bû.Piştî ku rûniştibû ji, serê xwe kiribû ber xwe de û ketibû hizran de. Her weha dihata xuyakirin.Dema ku mirov li wî di nerintin ew wilo di dîtin.Lê piştî mele Serhengê zaxoyî rûnişti bû ne bi gelekî re mafe axiftinê dabû bûne wî û wî ji bidest axiftinê kiribû. Dema ku bidest axiftinê kiribû ji, bi mîr re mirovên ku li dore wî li wir lê bihey dihisandin. Faqa Qasim ji li nig wî rûnişti bû û di wê dema ku ew diaxift ji de ew weke ku bihizirê serê xwe kiribû ber xwe de û dihisand.

Mîr, li Mele Serhengê Zaxoyî bihey dihisand.Lê car bi car ji avirne wî diçûne ser Mihamed. Ne tenê mîr avirne xwe di dana ser Mihamed.Ji xaynî wî, hin mirovên ku li wir li dore wî û mîr rûniştî bûn, li civatê bûn ji, avirne wan ji li ser Mihamed bû.Di serê wan de ji di derbarê Mihamed û mîr de pir hizrên wan hebûn.Dema ku mîr xazîne ji Mihamed xwestibû ku bibînê ji, ew mirov gelek j wan li dore mîr bûn û dema ku mîr ji Mihamed her weha xazîne xwestibû ji ew ji li wir bûn.Ew şahidê hertiştî bûn.Dema ku li wan dimeyîzendin ji mihaqaq ew rewş û mewş di serê wan de bûn.Li ser wan rewş û mewşan ji dihizirîn.Ku mirov bi hin rewşne di serê mirovên di dore xwe de girt, êdî wê bi wî awayî heya ku saxa wê bimene.Ji bo Mihamed ji her weha ev yek wilo bû.Mihamed ji her weha di serê wan mirovan de bi hin rewşne hebû. Bi xazîne re hebû.Bi dîtinê xazîne re hebû.Bi wê hizre xwe ya ku mîr gotibûyê de ´wa xazîne li ber te ya ku ti çiqasî bibe asil tu yî´ û wî gotibû wî ´ne ya dilê min besî min e´ ji di serê wan de bû.Ew rewş û gotin ne dihatina ji bîr kirin.Mirov di nav xwe de bin an ji li civatan bin pir li ser diaxiftin.Ji ber vê yekê di serê wan de wan rewşan pir mazin cih û war girtibû.

Ne tenê li wir li Cizîre bota, li hevirdore ji ew rewş hatibû bihîstin.Xalkê hevirdore ji bihîsti bûn.Yên ku ew rewş û Mihamed hiskiri bû û Bihîsti bû ji yên ku hisnekiri bûn û ne bihîsti bûn re di gotin.Ji wan re dianînine ser ziman.Wan ji ku hisdikirin, ku piştre ku diçûne deverne din ji mirovên ku hisnekirin re û ne bihîstin re dianînine ser ziman.Herweha pir hatibû bihîstin.Pir li ser hatibû axiftin.Ji xwe piştî ku xazîne hatibû dîtin ji, navê mîr û Mihamed û dîtinê xazîne deng veda bû.Mirovên ku navê wan bihîsti

bûn û hiskiri bûn pir bûn.Ew êdî pir dihatina nas kirin.Wan mirovên ku di civate mîr de rûnişti bûn, pir ji wan ne ji Cizîre bota bûn.Lê belê li ser wê rewşê û bûyarên ku bûne xwedî agahî bûn.Dema ku li Mihamed dimeyîzendin, ne mumkun bû ku ew rewşên ku hiskirin j newine bîre wan di wê heyeme de.Ne mumkun bû ku ew rewş ne dihişê wan de bin.Wan bi wan hizir û bihîstinên ku kirine li Mihamed di meyîzend in.Mihamed, bi wan bûyarên ku bû bûn û bi wî re hatibû bûne bihîstin, di serê wan de bû. Di wê heyeme de mele Serhengê Zaxoyî ji diaxift.Wê axiftinê xwe berdewam dikir.Li ser gelek rewş û hizran,hizrên xwe dianî ser ziman.Mîr ji û mirovên li dore wî ji pir lê dihisandin.Rêzek jê re ji wan mirov li dore wî ji wî re hebû.Navê wî ji hebû.Li herêma başûrê kurdistanê navê wî mazin hatibû bihîstin.Yên ku navê wî ne bihîstibûn ji ne bûn.Mirovên ku li civate mîr ji bûn, mirovne zane bûn û hertimî li civatan dirûniştin û tiştên ku dibûn ji hertimî dibihistin. Bi vê yekê re ew ji bihîstibûn.Navê wî ji bihîstibûn.Piştî ku Mele Serhngê Zaxoyî axiftinê xwe bidawi kir, êdî ew ma sekinî.Lê dema ku ma sekinî ji avir û balên mirovan li ser wî bûn. Mirovên li dore wî hê ji bi hey lê dimeyîzendin.Hê avirên wan li ser wî bûn.Piştre ku ma sekinî êdî faqa Qasim weke du sê gotinan kir ku bêjê.Herweha wî xwe di cihê xwe de adiland. Dema ku wî xwe adiland, êdî hin bal çûne ser wî ji di wê heyeme de.Piştre ku wî ji xwe di cihê xwe de adiland, êdî wî bidst axiftinê kir û hin gotinen xwe gotin.

Faqa Qasim dema ku mafê axiftinê hilda û axift, hingî, wî baleke mazin kişanda ser xwe di wê heyeme de.Ew ji li nig mele Serhengê Zaxoyî rûnişti bû.Piştî ew sekinî bû, êdî ew axifti bû.Nahaka vêce ew diaxift.Mihamed û mele Silêman ji li nêzîkî wan rûnişti bû.Mele Silêman ji û Mihamed ji bala li ser axiftine faqa Qasim bû.Faqa Qasim dema ku bidest axiftinê kir, hingî, mîr ji lê bi bal bû.Mîr ji lê dihisand.Bala wî ji pir bi hey li ser wî û axiftine wî û gotinên ku ji deve wî derdiket bû.Faqa Qasim, dema ku axiftibû, weke di dewama mele Serhengê Zaxoyî de biaxivê di rêzeke de axifti bû.Her weha li mirovan dihat axiftinê wî.Ji xwe dema ku mele faqa Qasim axiftibû, hingî, mijarên dîrokî û yên demê û yên hizrî ên ku mele Serhengê Zaxoyî li ser wan axifti bû, ew ji li ser wan axifti bû.Li ser wan axiftine xwe kiribû.Mele Serhengê Zaxoyî ji hizre olê di gotinê de gavavêtibû, û li ser rawastaha bû û hizre xwe anîbû ser ziman.Bahsa hin mirovên alim kiribû.Ji wan û mazin bûne wan û zanebûne wan axifti bû. Di nav axiftine xwe de hin hotin li ser Nebi Nuh û Birehim Xalîl anî bû ser ziman.Dema ku wî di gotine xwe de bahsa Nebi Nuh û Hizre wî kiribû, êdî pir bala faqa

Qasim kişandi bû. Faqa weke ku aşiqê Nebi Nuh bû.Hingî li ser di rawastaha û dihanî ser ziman.

Piştî ku di axiftine mele Serhengê Zaxoyî de bahsa Nebi Nuh û Birehim Xalîl hatibena kirin û wî ti gotin ne gotibena ne dibû.Ji xwe, çawa ku ew sekinî bû, êdî wî bidest axiftinê kiri bû, pişt wî re.

Faqa Qasim, weke demeke axifti bû.Piştre axiftine xwe bidawî kiri bû.Piştre ma bû sekinî. Pişt re, ku ew ma sekinî, êdî ne bi gelekî re hin mirovên din ji ku di civate rûnişti bûn û navserî xwe bûn û zanebûne wan ji mazin bû, bidest axiftinê kirin.Pişt wan re êdî nîqaşeke mazin ku pir zanist û mirovên zane di nav wan de li ser axifti bûn.Li ser hin bûyarên demê ji axifti bû bûn.Di wê demê de pir bûyar di qawimin.Piştî şerê Çardiranê re rewş li herêmê weke bi bitavahî hatibû guharandin.Bi zêdeyî ji divêt ku mirov bêje ku li Kurdistanê zêde rewş giharî bû.Jiyane mirovên herêmê pir hatibû guharandin.Di demeke kin de ev hemû tişt û guharandin bû bûn.Ya rastî divêt ku mirov bêje ku li Kurdistanê ji bo kurdan piştî wê demê re êdî rewşeke nû diher awayî de dest pê kiribû.Ew guharandin ji dema ku axiftin çêdibûn, di hatina ser ziman.Mirovan pir bahsa wan guharandinan dikir.Bi zêdeyî ji, ew guharandin, di jiyanê kurdên roihilat de bûbûn.Ya rastî bigiştî di jiyane kurdan de guharandineke hebû.Lê piştî şerê Çardiranê ew guharandin mazin bûbû û bi gelek awayên din xwe dabû der.Piştî têkçûne şêx Ismail êdî nêzîkatî li kurdan ji guharrî bû.Piştre haya dema Şêx ismailê duyemîn hin bûyar ru dabûn.Di wê heyeme de ne rêberîya sefevîyan û ne osmanîyan karîbû ku li ser kurdan bitememî serwerîye bikin.Bi rêvebran bi hev re gavavêtin çêdibû.Lê di jiyane wan de hertiştên wan weke xwe bû.Bi zêdeyî ji di dema şêx Ismailê duyemîn de û hinekî piştre êdî mudahale li jiyane hatibû kirin.Êdî li ber Hin serî hildan çêbû bûn.

Dema şêx Ismailê duyemîn ku têt ber dawiyê, êdî kara hatine ser taxt ya Muhammed Xudabende têt kirin.Piştî ku ew têt ser taxt, êdî ew hinekî nêzîkatîyên xwe li hevberê kurdan bêhtir weke dijdenê.Li hin mîrên ku nêzîktiya wî dikirin li wan baş nêzîkatî dihata kirin.Lê ew hindik bûn.Bi zêdeyîyên wan ji li ber wî bûn.Ji ber ku mudahale li ser jiyane wan dihata kirin. Bi vê yekê re, bertekên ku wê di dema şêx Ismailê duyemîn de ji di nav de hemû bertekên kurdan di dema Muhamed Xudabende de xwe didine der.Bi vê yekê re di rojhilatê kurdistanê de gelek serhildan çêdibin.Divêt ku mirov bêje ku mîrên kurdan yên li rojhilatê kurdistanê hemû ji ji aliyê xwe ve serî radikin.Lê belê ji ber bi hev re gavavêtin ji ne bû, ew serhildanên wan ji zêde wilo ti encamên mazin ji bo kurdan

dernexine hole.Di wê demê de, hin êrîşên osmaniyan ji hebûn.Lê kurdan di rewşe xwe de qayîm ji dike.Hinekî êdî di herêmên xwe de êdî weke bêhtir bi serê xwe gavên xwe diavêjin. Ew rewş ji ji ber ku di herême wan de di nav wan de wilo hêzên herêmî ne hatibûbûne afirandin, rewşe wan ji bi wan nêzîkatîyên wan re dikevehin xaterne de.Êdî hatine ser wan di demên piştre çêdibe.Ew rewş û bûyarên ku di qawimîn ji li herêmê hemûkî deng divedan. Mîrê Bota ji ew rewş pir baş di şopandin.Gelek mirovên ku wî şandi bû bpne herêman ji bo ku ji wî re di rewşan agahîyan bênin hebûn.Ji ber vê yekê ji, ew niqaşên ku di wê heyeme de di nav wan mirovên di civate wî de çêdibûn, dikir ku ew bi bal li wan bihisenê.Mele Serhengê Zaxoyî ji ji herêmeke dî hatibû û li ser wan herêm û rewşan xwediyê hin agahîyan ji bû.Wî ji ew agahî di civate mîr di wê heyeme de anî bû bûne ser ziman.

Dema ku mele Serhengê Zaxoyî axifti bû ji, li ser herêmê pir axiftibû.Pir tişt û bûyar anibû bû ser ziman.Wî ne tenê li ser herême xwe axifti bû.Li ser herêmên din ji axifti bû.Li ser wan ji tiştên ku hiskiribû û bihîstibû anîbû bû ser ziman.

Mîre bota, dema ku ew axifti bû, tenê lê hisandi bû.Haya ku wî axiftine xwe bi dawî kiribû. Piştî ku wî axiftine xwe bidawî kiribû êdî piştre hin gotin gotibûn.Lê dise zêde wilo ti axiftinên mazin ne kiribûn.Lê pişt mele Serhengê Zaxoyî re ku faqa Qasim ji axifti bû, êdî piştre hin mirovên din ji bidest axiftinê kiribûn.Kî li ser wan rewşan xwedî hizir û agahî bû di wê demê di civatê de anî bû ser ziman.Mîr ji li wan hisandi bû.

Mele Silêman û Mihamed ji dihisandin.Piştre ku demek têve diçê hin mirovên din ji di axivin, êdî piştre mele Silêman ji tevlî axiftinan dibe û hizre xwe bi çend gotinan têne ser ziman. Ku wî ji hizre xwe anî ser ziman, êdî piştre mafê xaberdanê, ku wî axiftine xwe bidawî kir weke ku were ji Mihamed re bala mirovan çû ser wî.Mihamed ji ev yek fahmkir.Piştî ku fahm kir êdî piştre wî ji, mafê axiftinê hilda û bidest axiftinê kir.Mihamed zimanekî wî yê pir xweş û safî hebû.Pir xweşik diaxift.Dema ku diaxift ji dikir bala mirovan herê ser wî di wê heyeme de.Ku diaxift weke ku helbesteke bixwene li mirov dihatMîr ji dema ku ew axifti bû, bi hey lê dihisand.Lê mîr ne tenê lê dihisand.Hin hizir weke ku di serê wî de hebin ji meyîzendine wî dihata têgihiştin.Dema ku Mihamed bidest axiftinê kiribû, ne tenê gotinên Mihamed di serê mîr de di bîr de dibûn.Her weha ew rewşên berê ku hatibû bûne jîn kirin ji di serê wî de bûn.Dema ku wî jê xwestibû ku divêt ku ew xazîne jê re bibînê ji hatibû bîre wî di wê heyeme de.

Mihamed, weke qadareke axift.Dema ku axift j pir xweşik û xweş axift.Bi axiftine xwe bala mirovên li dore xwe kişanda ser xwe di wê heyeme de.Mihamed, ku weke qadareke axift piştre êdî axiftinê xwe bidawî kir û ma sekinî.Lê bala mîr ji û mirovên li dore wî ji ji ser wî ne çûbû bûn.Ji ber hin bi bîranînên berê yên di dema xazîne de.Ew di serê wan mirovan de bûn. Dema ku li Mihamed di meyîzendin ji ew dem bi hemû bûyar û bûyînên xwe re di serê mirovan zîn bû bû.

Mihamed ji weke ku ev yeka farq kiribe li dore dimeyîzend.Weke ku ji wan re bêjê ´ez nahaka zanim ku çi di serê we de ye li wan di meyîzend.Faqa Qasim ji, piştî ku wî axiftine xwe anîbû ber dawiyê û bidawî kiri bû, biribû ser wî.Lê ti gotin ne gotibû.Lê di meyîzendine xwe de weke ku ji Mihamed re bêjê di pir xweşik axiftî meyîzendi bû.Mihamed ji j meyîzendine wî wilo têgihişti bû.Piştî Mihamed re, êdî mîr hinekî ma sekinî û piştre mafê axiftinê girt û bidest axiftinê kir.Dema ku axift, di axiftine xwe de hin gotin ji wê de ji di nav gotinên xwe de di vegotine xwe de anî ser ziman.Mîr, weke di axiftine xwe ya di wê de ji Mihamed lêbûrineke jê bixweze axift.Herkesekî wilo ew axiftine wî fahm kir û têgihişt. Piştre ku mîr axiftine xwe anî ber dawîyê, êdî mîr di dawiyê de gote Mihamed, ´ demên berê ku hin qusur li me peyda bû bin, li me bi bûhûre´.Ev gotin ji deve mîr derdiketi bû di dawiyê de. Dema ku mîr wilo got û axift, êdî bala mirovên wir hemûkan çû ser mîr û piştre ser Mihamed. Mîr wilo axifti bû.Piştre ku mîr ma sekinî, êdî piştre ku hinek ma bêdeng û sekinî, êdî faqa Qasim ji mafê axiftine careke dî girt û her weha li mîr vegerend.`mîre min, ti ji mazinatîye axiftî.Te rast got û axift.Mihamed ji ez bawer dikim ku di vê hizrê de ya´.Dema ku wî wilo got, êdî ma sekinî.Piştre Mihamed mafê axiftine hilda û got´faqa Qasim weke k hizre min anî ser ziman axift.Ya rastî divêt ku pêşî ser vê axiftinê mîre min, min axiftin kiribena.Lê faqa Qasim ji weke mazinekî min e û divêt ku mîre min ji wilo erê bike.Gotinên wî weke gotin min erê bike´.Piştî vê axiftinê re mîr li nav çavên mihamed meyîzend û piştre careke dî axift û got ´ti bi zanebûne xwe re mazinekî meyî.Em wilo erê dikin û dibînin.Wê ji nahaka pêde hertimî wê wilo bê´.Piştre wê axiftine mîr re êdî mihamed ji mafê axiftinê careke dî hilda û vê carê hinek dirêj axift û hinekî li ser qancîyê,mazinên ku hatina û bûhûrtine û hinek li ser hizir û olê sekinî.Hinekî dirêj ji axift.Dema k ew axift,herkesekî bi bal lê hisand.Herkesek bi lê hisandine re lê şaq man.Mele Serhengê Zaxoyî ji, hingî mihamed xweşik axifti bû lê şaq mabû û bi hayranî lê dimeyîzend.Haya ku wî axiftine bi dawî kir lê şaq ma.

Piştre ku Mihamed axiftine xwe de bidawî kir ji heya wî ji ji ser Mihamed neçû.Weke ku di wê heyeme de wî ji nû ve kifş bike lê hatibû û li Mihamed dimeyîzend.Gotinên Mihamed di serê wî de pir mazin cih girtibûn.Piştre ku Mihamed axiftine xwe bidawî kir û ma sekinî êdî ne bi gelekî re ku hinek bêdeng ma êdî wî xwe di cihê xwe de adiland ku biaxivê.Mîr ji û Mihamed ji û mirovên li dore wî ji her weha ev yek pêre kifş kirin.Dema ku wan wilo kişf kir, êdî bala wan ji çû ser wî.Bal êdî çûne ser wî û li bendî wî û axiftine wî man.

´Ti pir xweş û xweşik axiftî.Ti xweş be.Ji vegotinê ve bê, an ji ji awayê anîne ser ziman ve bê, te pir xweşik vegot.Te dilê me xweş kir.Xweşgotin û bi zanebûn axiftin xosletek ji xosletên civatên me ne.Te nahaka ev pir xweşik bi cih anî.Dema ku mirov ji rastteqîniyê û ji dil axift hingî, wê rast axivê û wê bê têgihiştin ku çend bi rastî axifti ya´..

Mele Serhengê Zaxoyî piştî ku ev hersê gotin gotin, êdî ma sekinî hinekî û piştre careke dî bidest axiftinê kir û ji hizir û mazinan û ji rewşan pir dirêj axift.Dema ku ew axift ji, mirovên ku li civatê bûn, lê bi bal û hey hisandin.Pir bala xwe dane de.Mele Serhengê Zaxoyî dema ku axift, faqa Qasim ji pir baş lê hisand.Dema ku lê dihisand ji, weke ku di serê xwe de herê dereke dî di wê heyeme de lê hatibû.Mele Silêman ji li nig Mihamed rûniştî bala wî li ser axiftine mele Serhengê Zaxoyî bû.Lê pir bi bal dihisand.Mele Serhengê Zaxoyî pir mazin û bi bal diaxift.Piştre ku demeke dirêj mele Serhengê Zaxoyî axiftin kir, êdî piştre axiftine xwe bidawî kir û ma sekinî.Mele Serhengê Zaxoyî axiftineke pir dirêj kiribû.Piştî ku wî axiftine bidawî kir, êdî piştre ku hinekî bdeng bûn çêbû, êdî yê bidest axiftinê kir û ew bêdeng bûn xira kir ji mîr bû.Mîr ji dema ku axift hinekî li ser Axiftinê mele Serhengê Zaxoyî axift û got ku pir baş axift.Piştre mîr, axiftine xwe bire ser rewşên ku dibûn û di wê heyeme de di civatê de hatibû bûne ser ziman.Bahsa wan reşwan kir û bahsa xwe û nêzîkatîye xwe û rewşê xwe kir.Bahsa dema piştî şerê Çardiranê kir.Piştî hingî li herêmê çi qawimn, bahsa wan kir.Piştre wan rewşan çawa ew bi bandûr kirin.Mirovên ji civatê ji ji deve mîr her weha his kirin.Her weha axiftin û ji deve mîr hiskirin hinkî girîng ji bû.Ji ber ku dema ku her weha mîr bahs kir êdî mirov ji wê bala wan bêhtir herê ser wan rewşan.Wê bêjim, ku mîr got, nexwe êdî divêt ku mirov fahm bike ku rewşeke hinekî zor an ji xirab heya.Êdî wê hertimî li bendî nêzîkatîyeke mîr ban.Ku mîr ji wan re gotibena ji filan rewşê re amede bin, ew ji wê êdî di cih de amede ban.Bi vê yekê re hinekî girîngî yê hebû.

Bandûre mîr di nav xalkê de pir bû.Ji ber vê yekê ku dema ku li herêmê rewşa osmanîyan ruda bû, rast û rast ne çûbû bûn xalkê û serî li wan ne dabû bûn.Rast û rast diçûn nig mîr û pêre diaxiftin û dixwestin ku xwe pê bidine erêkirin.Girêdana xalkê ji mîran re li Kurdistanê, ku mirov şîrovê bike, divêt ku mirov ne tenê bi hizre demê ya faodaliyê re şîrove bike.Ji xaynî vê yekê hin bendên din ji di nava wan de hebûn.Weke çand û kevne şopî.Her weha ew bendên ku me anîne ser ziman, xwedîyê dîrokne ku gelek û gelekî dirêj in.Dema ku mirov dema ku Medan şîrove dike û lê dimeyîzenê, mirov pir tijbandinan di naqabine wan de dibînê.Weke ku kurdan ji wê demê, jiyane xwe wilo berdewam kiribû heya wê rojê.Dema ku bi vê yekê re mirov li rewşê dimeyîzend, mirov ev ji di dît.Mirov di got ku qey, kurd di wê demê de di têkilîyên wê de isrer dikin dihata ber çavan.Mîr weke sazîyeke vê rastîyê bû.Her weha divêt ku mirov bêne ser ziman.Mîr xwediyê hin rastiyên ku mirov divêt ku fahm bike bû.Mîrîtî, xwediyê dîrokeke ku pir dirêj bû.Bi vê yekê re xwediyê kevne şopîyene pir kevn bû. Bi vê yekê re dema ku mirov li mîrîtîyê dimeyîzenê, mirov dibînê ku bi hebûne xwe re xwediyê pergalake ku jiyanê de bi wate bû.Bi vê yekê re mîr ji mazin bû.Gotinê wî ji mazin bû. Dema ku wî tiştek bigotina, hingî,mirovan pir baş lê dihisand û bicih dianî.Bi vê yekê re mirov divêt ku mîrîtîye mazin şîrov bike.Mîrîtî, xwediyê hebûneke ku divêt ku biteybetî bi serê xwe were têgihiştin e.Ji ber vê yekê bû ku dema ku mîr diaxift pir girîng bû.

Di wê heyeme de ji, dema ku mîr axifti bû li ser rewşan, hingî, mirovên li civatê yên ku navserî xwe û di nav xalkê de pir xwedî gotin bûn, lê bi bal dihisandin. Lê pir bi bal dihisandin ku ka wê çi gotin ji deve wî derkeve.Ew mîr bû.Gotine ku ji deve wî derket ji girîng bû.Xalkê pir girîngî di dayê de.

Mîr, dema ku axifti bû, bahsa hin xatarne kiribû.Bahsa hin êrîşne ku li ser herêman dibûn kiri bû.Mirovên li civatê ji pir bi bal lê dihisandin.Ew, dema ku li ser wê rewşa ku piştî şerê Çardiranê bûbû êdî mirovna pir bi bal lê hisandi bû.De ne, divêt ku mirov divirde bêje ku berî wê demê ji hertimî Cizîre bota weke dewleteke bi serê xwe bû.Di wê demê de ji wilo bû.Piştre ji ew rewşa xwe parasti bû.Piştre, Cizîre bota, weke ´hukumet´ hatibû bi ´sancak´kirin û wilo jiyanê wê berdewam kiribû.Piştre ku Qanunî siltan Sileyman hatibû ser taxt û piştre ku xwesti bû wê rewşê ji hole rake û ku ji ber vê yekê re hin êrîş biribû bûne ser herêmne ji, nikarîbû ku herîne ser Cizîre bota.Wate Cizîre bota pir mazin bû.Dema ku çûne ser wir çêbû bena, hingî, wê li kurdistanê bigiştî berketên mazin

derketibena.Osmanîyan ji ev yek li ber çavan ne digirt. Lê li hin herêmne ji êrîş hatibû bûne kirin.Dengê wan êrşan dihata qasre mîre bota ji.Li ser wan ji pir nîqaş dibûn.

Dema ku di nav xwe de diaxiftin di civatan de, wan ji farq dikir ku demeke nû ji bo wan dest pê dike.Ew ji di wê têgihiştinê de bûn.Dema ku nîqaş dikirin, wan di got ku ´ev dem demeke nû ya´.Her weha di gotin.Di wê heyeme de ji, piştî  axiftine mele Serhengê Zaxoyî ji ku mîr axiftibû û piştre ku axiftinê xwe bidawî kiribû û mabû bû sekinî, êdî piştre di nav mirovên di civatê de hin nîqaş li ser vê yekê û rewşan ji dest pê kiribûn.

Bi vê yekê re nîqaşkirin, di civatê de heya demeke dereng berdewam dike.Piştre ku dem te berderengîyê, êdî piştre mirov ji ji civatê kara xwe dikin ku rabin û herin.Dema ku her weha dem hat, êdî Mihamed, faqa Qasim û mele Silêman ji ku mele Serhengê Zaxoyî ji bi wan re kirin ku rabin.Mele Zaxoyî kiribû ku bi Mihamed wan re bimene.Dema ku wan kara xwe kir, êdî hinekî dî ji bi mele Serhengê Zaxoyî re di nav civatê de bi dan û standinê axift.Mirovên li civatê ji di wê heyeme de li wan pir bi dilper di hisand.Ku hinekî her weha axiftin, êdî gotine dawiyê mele Serhengê Zaxoyî girt û j mîr re got ku ´ ez ji bo demeke hatime vir, lê ezê zêde ne mênim´.Ku wî wilo gotibû êdî mîr ji gotibûyê de ´em dixwezin ku ti hinekî dirêj li vir bi mene´ û piştre mafê xaberdanê dabû wî û wî ji li ber wî û civatê bidest axiftinê kiribû.Di wê demê de, dema ku axiftibû, hingî, mirovên li wir ji têgihiştibû bûn ku ew çend bi hizir û zanebûne.Her weha ew nas kiribûn.

Piştî ku her weha axiftibûn, û ku axiftinê xwe bidawî kiribûn, êdî bi hev re  kiribbûn ku rabine ser xwe.Piştre ku demek têve çû, êdî piştre cimaate civatê bi hev re rabû ser xwe û kirin ku herin.Dema ku rabûn, êdî mele Serhengê Zaxoyî di rax faqa Qasim de ma û mele Silêman ji di rax Mihamed de ma û piştre di pêşengîye mîr de kirin ku rabin û herin.Mîr ji li gor adete wê bi mirovên ku wê herin re wê çûbena deve deve derî.Dema ku her weha hemû bi hev re rabin, hingî, mîr dirabû.Lê dema ku hin mirov rûnştî hebana, hingî mîr ne di rabû. Mirovên Ilmdar dirabûn û ew bi rê dikirin.Ilmdar li qasre her weha li nig mîr bû.Hertimî li nig wî bû.Di wê heyeme de, ji ber ku wê mirov hemû bi hev re rabin û herin, êdî mîr ji wê rabû bena bi wan re.Ku ne rabûbena, wê weke bê hûrmetîyeke ji bihatana şîrove kirin.Ew, her çend mîr ji bena, wê her weha bihatana şîrove kirin.Mîr ji vê yekê zanibû.Wî zanibû ku wê çi bikirina. Her weha xwediyê zanebûne bû.Li dore wî ji hertimî mirovên zane û navserî xwe hebûn.Hertimî bi wan re dide û distand.Wan ji hertimî hizre xwe jê re tanî

ser ziman. Mîr bi vê yekê re, ku mirov bêje, hem mirovên li dore wî û hem ew bixwe ji pir bizane bû.Divîbû ku wilo ji bena.Xalkê ji û hevirdore wî ji ev yeka jê dixwest.Divîbû ku ji xwestekên xalkê re û hevirdore xwe re bûbena bersiv.Bi hizir bena an ji bi hin awayên din ji bena, divîbû ku bûbena bersiv ji xalkê û hevirdore xwe re.Her weha hêvî ji jê dihata kirin.Bi vê yekê re mîr û mîrîtî xwediyê çand û kevne şopîyeke bû.

Piştî ku rabûne ser xwe êdî bi hev re yek bi yek xatir ji mîr xwestin û gotin şeve te bimene xweş û piştre ketine ser riye xwe de û kirin ku herine malên xwe di wê heyeme de.Mihamed, faqa Qasim, mele Silêman, Mihamed û mele Serhengê Zaxoyî ji bi hev re hatin ku werine medrese.Li wir ji cihê razane hebû.

Dema ku di rê de dimeşîn ji, faqa Qasim bihizir bû.Çûne Mihamed di serê wî de bû.Dema ku mele Serhengê Zaxoyî got ku ezê demeke mênim û herim, her weha bi wê re ew ji hatibû bîre wî di wê heyeme de.Di dema ku di meşî de hem di meşî û hem ji dihizirî di wê serê xwe de.Mele Silêman xwe dabû rax mele Serhengê Zaxoyî û herdû bi hev re ku bi hin gotin ji bena diaxiftin.Her weha dengê wan dihat.

Di wê rewşê di meşîn û tên ku werine medrese sor.Wê li wir biman.Mele Serhengê Zaxoyî ji wê li wir bima.Wê li nig Mihamed bima.Mele Silêman ji di wê heyeme de bi wan re bû. Hebû ku wî ji ew bi tenê ne hiştiban.Faqa Qasim, bi wan re dimeşî, lê bihizir bû.Di serê wî de pir hizir hebûn.Ya rastî çûne mihamed bêhtir di serê wî de cih girtibû.Mele Serhengê Zaxoyî, dema ku hatibû ne bi tenê hatibû.Pêre pir mirov hebûn.Wî di nav civatê de gotibû ku ezê demeke mênim û piştre herim.Faqa Qasim, dema ku wilo hiskiribû, êdî hizir kiribû mihamed ji gotibû ku wê bi riyeke de herê, êdî hevalekî wî ji çêdibû.Wî hizir dikir ku dema ku ew herê êdî Mihamed ji wê herê.Wê pêre herê.

Bi vê rewşê dimeşîn û têne medrese. Dema ku digihinê medrese, êdî piştre bi hev re di bûhûrine hundir.Hê di hundir de hin faqa şiyar bûn û dixwandin.Dema ku hatibû bûne wir, êdî ev yeka baş û qanc dîtibû bûn.Piştre dema ku Mihamed û ew mirovên din ku pêre ne, ku gahana wir û çawa ku kirin ku bi bûhûrine hundir, êdî ew faqihên ku şiyar ji bûn, xwe lev dana hevdû û piştre bi ber wan ve rabûne ser xwe.Dema ku ew ji rabûne ser xwe û bi ber wan ve hatin, êdî piştre silav dana hevdû û piştre bi hev re bûhûrtine mezele û rûniştin.Dem dema razane bû.Lê belê xew li ser çavan ne bû.Mihamed û mele Silêman ji û faqa Qasim ji û mele Serhengê Zaxoyî ji her weha bêxew bû.Piştre li hinekî dî li hevdû rûniştin.Dema ku li hevdû rûniştin, êdî ku hinek bi hev re axiftin ji piştre, weke ku bala Mele

Serhengê Zaxoyî bikişenê ew hizirkirine li ser faqa Qasim, êdî wî jê pirsî ku ka ma ka çi di serê wî de heya.Wî ji dema ku wî jê pirsî, hinekî ma sekinî û piştre ya di serê xwe de ji wî re got.Dema ku wî ya serê xwe got, êdî mele Silêman ji weke ku bikeve hin hizirne de lê hat.Mihamed ji bêdeng bû.Piştre ku hinek axifti, êdî Mele Serhengê Zaxoyî berê xwe da Mihamed û li nav çavên wî meyêzend. Mihamed dema ku wî li nav çavên wî meyîzend, pêşî hinekî wilo bêdeng ma û serê xwe kire ber xwe de û li pêşîye xwe meyîzend.Lê piştre wê rewşa wî zêde berdewam ne kir.Wî ji serê xwe rakir û l nav çavên mele Serhengê Zaxoyî meyîzend û got;´min di serê xwe de berê nahaka hizir kiribû hinekî bi aliyê başûr û rojilat de werin.Ewder di serê min de bûn. Wanderan ji bibînim û mirovên me yên waderan ji nas bikim,Pir mirovên mazin hena ku ji wanderan navê wan têt guhê me.Vê yekê ji di serê me de mereqek çêkir´.Dema ku Mihamed her weha got, êdî mele Serhengê Zaxoyî ji hinekî ma sekinî û piştre li Mihamed her weha vegerend;´ji wan herêman ji navê Cizîre bota di serê mirovên zane de bi ´Aşqa´.Her kesek li ser dihizirê.Min ji di dema xwe ya biçûkatîyê de pir his kiribû.Lê piştre ku min xwe gahandiyê de, êdî min dît ku ya ku ez zanim û min bihîstiya hê hindka.Piştre min gelek seferên xwe yên din ji li vir kirin.Başûr û rojhilat ji raste ku xwediyê pir mirovên ku zanistên. Lê min ji seydeyê Qasim fahm kir ku ti dixweze bi wanderan ve were.Nexwe em riye xwe bikine yek û herine başûr û ji başûr ji ku xwude bêjê erê ji wir ji dise em bi hev re herine rojhilat.Ji ber ku nêhteke min ji hebû ku sefereke li wanderan bikim.Vêce emê ji hev re bine heval û hogir´.Dema ku Mele Serhengê Zaxoyî wisan got, êdî piştre mihamed mafê axiftinê hilde û ku du sê gotin weke ji hiskirinên ku hiskirin ku anîne ser ziman, êdî di dawiyê axiftine xwe de got ´bila ser ser û çavên min´ û piştre ma sekinî di cihê xwe de di wê heyeme de.Dema ku wî wilo axiftin kir, êdî ma sekinî.Lê piştî ku wî wilo axiftin kir û ma sekinî êdî bala mele Silêman ji bihey çû ser wî.Ji xwe çavên faqa Qasim li ser wî û mele Serhengê Zaxoyî bûn. Lê ti gotin an ji lavz ji deve wî dernediketin.Bêdeng bû.Tenê li wan û li nav çavên wan di meyîzend. Mele Silêman ji piştre ku hin gotin ji dev gotin êdî piştre ma sekinî.Dem ji xwe pir bi ber dereng bûne ve diçû.Divîbû wan ji amadekarîyeke xwe ji bo razane kiribena.

Piştre ku her weha Mihamed û Mele Serhengê Zaxoyî di nav xwe de kifşkiribû ku wê bi hev re herin, êdî piştre zêde wilo ti axiftin di nav wan de ne dibûn.Car bi car hin gotin ji deve mele Silman derdiketin.Piştî ku hatibûbûne medrese du car an ji sê caran gotin ji deve faqa Qasim derketibû.Lê ew gotinên ku ji deve wî derketibûn ji ne wilo dirêj bûn.

Piştre ku her weha di nav wan de dibe, êdî piştre ku hinekî dî li hevdû rûniştî dimênin êdî piştre ew kara xwe ya razane dikin.Piştî ku kara dikin êdî ne bi gelekî re ew diçine cihê û wê lê razihin.Her yekê li cihê ku wê lê razihê dimene.Lê Mihamed hinekî dî ji li mezele ku lê rûniştibûn dimene û dihizirê.Hinekî dî li ser xwe dimene.Li wir li nig wî hin nivîsên wî yên wî bidest xwe nivîsandi bûn hebûn.Mihamed pir di nivîsand.Demên pir bi xwandin û nivîsandinê re dibûhûrand.Hij xwandinê pir dikir, û her weha hij nivîsandinê ji dikir.

Bi vê yekê re divêt ku mirov bêje ku pir nivîsên wî ji hebûn.Li Cizîre bota li medrese sor pir nivîsên wî yên wî bi destê xwe nivîsandibû û li wir hiştibû hebûn.Faqihên ku li wir ew nivîsên wî dixwendin.Li ser hizir û hizir kirine hin nivîsên wî hebûn.Li ser mantiq hin nivîsên wî yên pir dirêj ku wî nivîsandi bûn hebûn.Hin nivîsên wî yên ku li ser dema xwe ku wî nivîsandi bûn hebûn.Bi wan nivîsên xwe re hizir û dîrok pir baş û mazin anî bû ser ziman. Dema ku diaxift ji pir caran ji wan nivîsên xwe diaxift.

Faqa Qasim, dema ku wan kara xwe ji bo razane kir, êdî çû herê mala xwe.Li wir li nig mezgefte Nebi Nuh dima.Cihê ku ew lê dima ji , ne dûrî mizgefte Nebi Nuh bû.Li wir wî xwe bicih kiribû.Ji ber ku da qana ku di sibehen de û di demên din de zû herê û xwe bigihinê mizgefte.Ew demên ku li mal dima ji pir zû dirabû ser xwe.Hê ku rohnî ne ketî ardê de dirabû ser xwe û diçû mizgeftê.Li wir her sibeh mirovên ku dihatina mizgefte pir bûn.Dema ku mirov dihatin û mêj dikirin piştre pirranîyên wan li wir diman û hinekî ji xwe re dixwandin an ji li faqa Qasim digahana hevdû û wî ji wan re axiftin dikir.Lê gelek ji wan ji ku mêj dikirin piştre, xwe digahanine malê di wê heyeme de.

Mihamed, ku demeke her weha şiyar dimene, êdî piştre ew ji dike ku razihê.Ew ji wê sibehê hê zûkanê rabûbena ser xwe ji nav nivînên xwe.Ew ji hertimî her sibeh zû dirabû.Di wê heyeme de wilo bû.Dema ku ew dirabû, êdî piştre wî serê xwe careke dî ne didanî û ne dirazaha.Şîyar dima heya ku faqihan ji rabû bena ser xwe û piştre bidest xwendinê kiriban.Ji ew ji pirranîyên wan di rabûne mêje sibehê, û ku dirabûn ji êdî careke dî ne diraazahan.Piştre yan li nig Mihamed û yan ji li nig mele Silêman dirşniştin û ew ji wan re diaxiftin û yan ji diçûn û li koncûkeke ji xwe re dirûniştin û dixwandin heya ku dema dihata ber ro derketinê. Mihamed, axlabe ji, dema ku dirabû û mêj dikir li mezele seydeyê mazin meyeê Cizirî dirûnişt û li wir dixwand û dinivîst.

Di wê demê de piştî ku hinek mabû, êdî piştre wî ji kara xwe kiribû û çûbû bû ser nivînên xwe kiribû ku razihê.Lê xawê çavên wî ne digert.Ji

ber ku di serê wî de pir tişt hebûn.Di wê demê de dema ku ketibû nav cihên xwe de, êdî di serê xwe de çûbû wê dema ku hê ji nûkava hatibû Cizîre bota.Ew ji û demên piştre yên ku li Cizîre bota mabû di serê wî de bûhûrtibû bûn.Ew demên berî hingî ji dihatina ber çavên wî.Çawa ku dema ku hatibû ku were Cizîre bota û di rê de rastî Dilberê hatibû û piştre çi rewş hatibû serê wê fêr kiribû, hemûk di serê wî de diçûn û dihatin.Wî ti carî Dilberê û ew rewşa wê ji bîr nekir.Hertimî di serê wî de di aqlê wî de ma.hertimî ji dema ku zêde dihata bîre wî an ji ku li ser pir dihizirî êşek di dilê xwe de hîs dikir.Piştî wê rewşê re ku hatibû Cizîre bota, li ser wê rewşê û ´Dilberê û Dilşad´ê ji hinekî nivîsî ji bû.Ji hingî ji Dilberê re gotibû ku wê ti carî ev rewşa te newê ji bîr kirin.Ne hatibû ji bîr kirin ji.Wî ne tenê bi nivîsê ew rewş danîbû ber mirovan.Ji xaynî wê yekê ji, pir caran dema ku di nav mirovan de dirûnişt, ew rewş ji dil dianî ser ziman.Dema ku bahsa wê rewşê dikir ji, wî çawa di dilê xwe hîs dikir, dikir ku ew mirovên ku lê dihisênin ji wilo weke wî hîs bikin.Her weha bi wan dide hîs kirin.Wê şevê ew hemû hatibûbûne bîre wî.Di nav nivînên xwe de li ser wan dihizîrî.Li ser wan rewşan dihizî.Li ser çûne xwe dihizirî.Çawa hatibû wir û bi rewşê hatibû û nahaka ji bi çi rewşê wî xwe bi ser rê dixist.Ew hemû li ber çavên wî bûn.Li ber çavên wî re dibûhûrtin...

**Beş** 2

Li ber çemê Diclê jiyan hertimî xweş bû.Hertimî jiyan li wir li ser pîyan bû.Çûn û hatin li wir hertimî mazin bû.Zarok li ber çem ji xwe re di leyistin.Ji wir bazdidan wir û ji wir ji bazdidan vir.Her weha li ser lingan bijîn bû.Tişî jiyan bûn.Her sibeh dema ku dayika wan ji xawe xwe di rabû ser xwe û bi kar û barê xwe ve diçû û dihat, ew ji hevalên wê yên rabûne bûn.Pêre di rabûn.Pêre diçûn û dihatin.

Di wê hînkayîya sibehê de rabûn ji xweş bû.Bêhne mirov derdixist.Mirov ku di wê serê sibehê de di rabû ser xwe û derdikete derve û di bin wê hînkayîyê de ji xwe re li ser lingên xwe digerehe, weke ku dinyê bibe ya wî dilê wî xweş dibû û bêhne wî fireh dibû.Jiyan her weha xweş bû.Jiyane serê sibehê her weha hê xweştirtir bû.Bêhtir bêhne mirov derdixist. Bêhtir bêhne mirov derdixist.Ew saqaya serê sibehê wilo xweş bû nayê gotina.Çend ku filozofek pirtûkeke felsefe dibîne û dixwane her weha kêfe wî tê û dilê wî xweş dibe û di dilê wî de xweş bûne ru dide, her weha ew xweş bûn ji wilo bû.Wê xweş bûne serê sibehe her weha di hundirê xwe de zanebûnek ji hizir weke di xwe de di parast li mirov dihat.

Di wê sibehê de dema ku mirov di rabû ser xwe û di bin wê şaqaya serê sibehê de ji xwe re digerehe, hingê, weke ku mirov pirtûkek felsefe

bixwane serê mirov xweş dibû.Wilo li mirov dihat. Wilo xweş bûne dikete dile mirov de.Mirov bi wê xweş bûne de di xwe de û di nav wê saqaya xweş de diçû.Her ku diçû ji, weke ku di dîrokê de di riyekê de herê lê dihat.Weke rêvanîyek di dîrokê de bike lê dihat.Wilo li mirov dihat.Dema ku mirov di bin wê şaqaye de digerehe, û ku mirov dikete hizran de, pir tişt û mişt dihatina bîre mirov.Weke ku di serê mirov de mirov pirtûkxaneyeke kifş bike mirov kur diçû û di nav zane bûne de di serê xwe de diçû û weke ku mirov li ber kahnîyeke ku deve fireh be li ber rûnihê û di wê serê sibehê de ew ave wê kahnîyê ji bi hînkayîye xwe dilê mirov xweş bike li mirov dihat.Her weha xweş bûnek û dil xweşiyek mirov di girt.Ku mirov dil xweş be û dil xweşî mirov bigirê, hingê, mirov ji xwe baş û bi rih hîs dike.Dema ku mirov xwe bi rih hîs kir ji, êdî dile mirov gelek tiştan ji mirov dixweze ku mirov bike.Di serê sibehê de, ya ku dilê mirov wê ji mirov bixweze ji her weha di bin wê hînkayîye de gerendineke ku mirov rehet bike ya.

Wê ku ti li Cizîre bota be û ti rewşeke weha jîn bike, hê wê wate wê xweştirtir bêt.Wê hê bêhtir wate wê hebe.Dema ku di serê wê sibehê de mirov ji nav nivînan rabû ser xwe û derkete derve û li ser xwe bidest gerendinê kir, hingê, bêhne mirov hêhntirtir derdikeve. Wê vêce dema ku mirov derket, û ku hê roj bi tememî derneketîye û mirov ji bi jin û mêran ve hemû rabûne ser xwe û bi kar û barên xwe ve bazdidin, ku mirov dibîne, hingê, dilê mirov xweş dibe.Hema mirov tenê dixweze ku bi wê dilxweşîyê meyîzenê û meyîzenê. Di wê heyeme de meyîzendin ji, bi xweşbûnekê re heya.Di dil de heya.Di jiyanê de heya.Di serê mirov de heya.Xweş bûn, di rastiyê de ji xweşbûne jiyanê de ya.Dema ku mirov dibîne ku jin wê rabûne û bi kar û barên xwe diçin û dikin ku sêdarên xwe ava bikin û meşkên xwe pêve bikin û bidest keyandine dewe xwe bikin, hingê, xweşbûnek ji jiyanê dilê mirov digirê.Bi vê yekê re, dema ku mirov dibîne ku wa keçikên ciwan ku hê ji nûkava gahana an ji bukên malê ne wê kar û barên malê bazdidin, êdî hema wilo mirov dixweze ku li wan tamaşa bike.Xweşbûnek di nerîntine wê jiyane ku di rewşe xwe de bixweze bi rê ve diçê de heya.Ew xweşbûn dema ku mirov her weha dimeyîzenê mirov kifş dike.Di wê heyeme de, ku mirov hinekî zêde ji dimeyîzenê, êdî mirov bi meyîzendine xwe re bi tiştên ku bi çavên mirov dikevin re mirov xwe weke keşifvanekî dibîne.Her weha li mirov têt.Ji ber ku hingê, dema ku mirov dimeyîzenê, mirov pir tiştan dibine.Mirov di serê xwe de di wê heyeme de bi tiştên ku mirov dibîne re mirov tenê dixweze ku bimene.Ya rastî her weha bi tenê mayîn ji weke ku mirov bi tenê li ser serê çiyayakî bi tenê bê û li ser dore

xwe meyîzenê û ti kesekî ne bîne li mirov têt.Ev hîs bi teneserê xwe ji mirov di dil û serê mirov de ji rewşne dike rewşne din de. Her weha li mirov dike.Lê di wê heyeme de dema ku mirov ji rewşne dike rewşne din de ji, mirov ji rewşe xwe ne bigotina.

Hemû tiştên ku mirov di wê heyeme de di xwe de û di serê xwe de jîn dike ji mirov di mirov de xweş dike.Mirov bêhn firah dike.Mirov ji xweşbûneke dibe û dike xweşbûneke din de.Her weha li mirov dike û di mirov jîn dike.

Di wê heyeme de bi çûn û hatina jin û keçikên gahayî re û bi zilamên ku bi li hevdû rûnişti ne û ji hev re vedibêjin û dikênin û bi zarokên ku li ber gahabûne dema balixbûne xwe ne ku bi kahrik û barxikan ve diçûn, ku mirov li wan dimeyîzenê, xweşbûnek dilê mirov digirê. Mirov tenê dixweze ku hema wilo meyîzenê.meyîzendin, di wê demê de di xwe de afsûneke diafirêne.Di wê demê de meyîzendin di nerîntine de bi afsûne.Ew afsûn mirov digirê û gîzloneke bi laşe mirov de têne.Tavzînoka di mirov de çêdike.

Li Cizîre bota her weha jiyan mazin bû û bi heybet bû.Bi heybete xwe re li ser pîyan bû. Bi wê heybete xwe re hebû.Çûn û hatina wan mirovên zane û nîqaşkirina wan ew jiyan mazin dikir.Dengê wan yê bizane ku dihata mirov, tenê dikir ku mirov hema wilo di cihê xwe de bimeme sekinî û li wan bihisenê.Tenê mirov dixwest li wan bihisenê.Jiyan bi wan re bizanist bû.Xwedî zanist bû.Xwedî wate bû.Bi wate xwe re ya mazin re hebû.Bi hizir û dîrokê re hebû. Jiyane xwediyê dîroke xwe ya ku jîn dibe ya.Çend ku jîn dibe, ew dîroke wê ji heya û bi wate ya.Dîrok her weha bi jiyanê re heya.Ku jiyan hebe wê dîrok ji hebe.Ku dîrok ji hebû, wê têgihştin û fahmkirin ji hebe.

Cizîre bota her weha dîrok bû.Bi vê yekê re bi mirovan re têgihiştin bû û fahmkirin bû. Hebûne zanist û têgihiştinê bû.Temenê jiyane hizir bû.Ware pexamberan bû.Ware Nebi Nuh bû.Ware mazinan bû.Hertimî serê wê bi zanistitîye wê mazin û bilind bû.Hertimî serê wê bi aqliya wê mazin bû.Wê hertimî ji xwe bi aqil bê, bi fêrkirinê bê, bi mazin bûne de, da. Mirov ji hep jê stand û stand.Çend ku mirov jê stand wê ji qasisî nekir û da û da.Iro ji dida.Wê hê ji bidana.Kî biçanê de wê bidanê de.Ev xosletekî wî yê ku ji mazinatîye wê dihat bû.

Di wê demê de ji dida.Pir mirov dihatin û wê dida.Berekete wê ji hertiştê wê ve hebû. Ji zanebûne wê ve hebû.Berekete wê ji hemû tiştên wê hebû.Bi zanebûne wê ji hebû.Zanebûn li wir pir mazin bû û li pêşketî bû.Zanebûn li wir bi hizre rastteqîniyê re hebû û mazin bû.Rastî çi ya? An

ji ku mirov weke pirseke bi pirsê rastteqîni çi bû?Rastteqîniyê mirov û jiyanê çi bû? Ev pirs pirsne ku li Cizîre bota bi zanebûne re li bersiva wan dihata lêgerendin.Li wir mirov dibû lêgerinvanekî rastteqîniyê.Rastteqîniyê, li wir hizrek li dar dixistBixweze mirov herweha dibû.Mirov ku dikete nava wê û hizre wê û hebûne wê de, hingî, her weha dibû.Rastî li Cizîre bota mazin bû.Mirovên li Cizîre bota bi xweza xwe re û hevirdore xwe re bi rastteqîniyeke jiyanê re jîn dibûn.Mihamed ji dema ku hatibû wir, her weha bidest jiyandinê kiribû.Dema ku herweha ketibû nav jiyanê de êdî hema wilo di nav de jîn bûbû û jiyane xwe berdewam kiribû.

Ew demeke dirêj ku bi li wir bû.Ev rastî û rastteqîni jîn dikir.Mirov li wir çawa ku di hizir kur dibû û piştre bidest lêgerinê rastteqîniyê di xwe de û di jiyanê de dikir, her weha mirov ji kiribû.Hizir, ku mirov têde kur bû, êdî dike mirov bi pirsê ku rastteqîni çi ya û lê bigerihê.Her weha ew ji jîn kiribû.Her ku bi vê yekê re bi ser de dem bûhûrtibû, wî ji di xwe de û di hizre xwe de kur bûn çêkiribû.Wî kurbûneke mazin bi vê yekê re di xwe de û di hizre xwe de çêkiribû.Ew demek bû ku Mele Serhengê Zaxoyî hatibû Cizîre bota û ku kara xwe ya çûne ji Cizîre bota dikir ji weke ku ji wir destê wî qut ne dibû.Her weha lê dihat.

Mele Serhengê Zaxoyî ew demek bû ku hatibû Cizîre bota û li Cizîre bota mabû.Piştî ku demeke mabû êdî kara xwe dikir ku herê.Berî wî, Mihamed ji kar kiribû ku bi riyeke de herê. Rêvanîyeke bi wan aliyan de bike.Vêce piştî ku mele Serhengê Zaxoyî hatibû wir û wan ji hevdû dîtibû êdî piştre ew ji mabû sekinî ku wê piştre bi hev re herin.Di wê demê de ji li Cizîre bota li nig hevdû mabûn.Bi hev re li hevdirdore wê ji li gelek deveran ji gerehebû bûn. Bi hev re ku dema Zêwaêlim hatibû, çûbû bûne Girê êlim.Li wir ji û li hevirdore wê ji demeke dirêj mabûn.Li wanderan ji pir mirovên zanist hebûn ew ji nas kiribûn.Piştre ku demeke her weha li hevirdore bi hev re dimênin ji, êdî careke dî di vegerihine Cizîre bota. Li Cizîre bota, piştî wê re ji ku demeke dimênin, êdî piştre kara xwe ya çûne dikin.Kara xwe ya bi rê ketine dikin.Wê bi rê ketiban û bi hev re çûban Zaxo û li wê herêmê gerehe ban.

Mihamed û mele Serhengê Zanoyî ku demeke li Cizîre bota bi hev re dimênin, êdî piştre dikin herine herême zaxo yê.Piştî ku mele Serhengê zaxoyî hatibû wir û ku li wir weke demeke mabû piştre kara kiribûn ku herin.Mele Serhengê Zaxoyî piştî ku hatibû Cizîre bota, li wir demeke ku ne kin bû mabû.Piştre ku her weha demeke dimene, êdî piştre kare xwe dike ku herê.Mihamed ji wê pêre çûbena.Wê bi hev re çûban.

Mele Silêman, faqa Qasim û Ilmdar ji ji çûne Mihamed hinekî bi hazn bûn.Wan weke ne dixwest ku ew di wê heyeme de herê.Alimî(fêrî) hevdû bû bûn.Dema ku mirov alimî hevdû, êdî jev vaqatandin hinekî zor dibe.Ji bo wan re her weha wilo bû.Lê Mihamed biryara xwe dabû ku herê.Wî dixwest ku wanderan ji bi bîne.Her weha wî ji li gor wê xwesteke xwe ya di dilê xwe de xwe bi ser rê xistibû.

Mele Serhengê Zaxoyî dema ku li Cizîre bota mabû, axlabe ji li qasre û li nig Mihamed mabû.Lê axlabe ji li nig Mihamed mabû.Piştre mîr ji lê germ bûbû û ew ne dixwest ku ji qasre herê.Lê wî dixwest ku li nig Mihamed bimene ji ber xwandin û tiştên weha ku bike.Bi vê yekê re ew demeke li nig hevdû li medrese sor mabûn.Piştre ku demeke mabûn êdî piştre bi hev re axivî bûn û piştre kara xwe ya ji bo rê kiribûn.Wê ketiban rê de ku herin.Dema ku her weha ew di nav cimaate de bahsa çûne xwe dikin û bahsa amedekarîyê dikin, êdî piştre bal diçine ser wan.Bala mîr ji diçê ser wan.Lê bi zêdeyî ji weke ku bala mele Silêman û faqa Qasim çûbû ser wan.Faqa Qasim, mele Silêman û Mihamed, ew demeke dirêj bû ku bi hev re bûn.Ji ber vê yekê ji hinekî ji wan re zor dihat ku ji hevdû bi vaqatihin.

Dema ku di nav cimaate de dibêjin ku wê herin, hingî, mele Serhengê Zaxoyî têne rojevê. Ew j mirovan re dibêje ku wê herin, û dibêje ku ew û Mihamed wê bi hev re herin û wê bi hev re demeke li başûr bimênin û piştre wê bi hev re xwe bigihênine rojhilat ji.

Piştî ku mele Serhengê Zaxoyî her weha got, êdî piştrê ne bi gelekî re ku cara dawiyê li mizgefte Nebi Nuh mêj dikin û piştre ku têne medrese, êdî mele Silamên û faqa Qasim ji bi wan re têt wir.Dema ku têne wir, êdî li wir li hevdû dirûnihin û bi hev re cara dawiyê dipeyivîn û nîqaş dikin.Lê wê carê ne ji Mihamed û mele Serhengê zaxoyî re û ne ji ji faqa Qasim û mele Silêman re asayî dihat.Her weha çend ku hatibûn ku bi hev re bi peyivîn ji, dema ku li hevdû rûniştibûn, car bi car hin gotin ji hevdû re di gotin û piştre dimene sekinî. Wilo zêde ti axiftin di nava wan de di wê heyeem de ne bû.Wê rewşê weke qadareke berdewam kir.Piştre ne bi gelekî ji, ku hinekî li hevdû rûniştibûn, êdî xaber ji wan re hat ku wa mîr ji di rê de ku têt wir li nig wan.Dema ku her weha hata gotin êdî weke ku ew xwe li hevdû bidine hevdû li wan hat û piştre hinekî vejînbûn ji bi wan hat.Piştre ku ne bi gelekî re êdî dîtin ku wa mîr di deve derîyê hewşa de wa keta hundir de ku wer hundir dî wê heyeme de.Dema ku wilo ji aliyê wan ve ji hata dîtin êdî ew ji ji cihê xwe rabûne ser xwe û kirin ku bi ber mîr herin û wî pêşwazî bikin.

Dema ku mîr keta hundir de, êdî faqa Qasim û mele Silêman û Mihamed û mele Serhengê Zaxoyî rabûne ser xwe û ew pêşwazî kirin.Dema ku ew her weha rabûne ser xwe û bi ber wan ve çûn, êdî dîtin ku wa mîr ku pêre hinek mirovên din ji hena û Ilmdar wê di rax wî de ya wa têne ku werine hundir.Dema ku wan ji wilo dît, êdî ew ji rabû û bi ber wan ve çûn û di nîvê rê de gahana hevdû û dest û silav dana hevdû û piştre bi hev re kirin ku bibûhûrinê hundir di wê heyeme de.Dema ku hatina ber hevdû, hingî Mihamed û mîr çav bi çav hatina ber hevdû û bi hinek avirne li hevdû meyîzendin.Lê di serî de wilo ti tiştek ji hevdû re ne gotin.Piştre ku wilo li ber hevdû hinekî man, êdî piştre ne bi gelekî re yê ku axift û got ´keremke mîre min´ Mihamed bû.Piştre mîr nêzîkatîyeke ku di hundirê xwe de rêzeke mazin dide nîşandin di wê kêlîkê de şanî wî da.Piştre ku Mihamed wilo got, êdî ne bi gelekî re ku mîr kete pêşîya wan mirovên li wir de û bûhûrtine hundir di wê heyeme de.Dema ku ketine rê de û bûhûrtine hundir ji di rê de Mihamed li nig faqa Qasim û mele Serhengê Zaxoyî sekinî bû.Mele Silêman ji hinekî li tihêla wan sekinî bû.Her weha dihata xuyakirin.Ilmdar ji li nig mîr lê hinekî li paş wî dimeşî di wê heyeme de.Ilmdar ji bêdeng bû.Ti deng û meng ji wî ji dernediket.

Lê dema ku mirov li Ilmdar dimeyîzend û li ruyê wî dimeyîzend ji di dît ku ew weke ku hinekî bi hizre.Her weha li mirov dihat.Weke ku tiştne ku ew di serê xwe de pir li ser dihizirî di serê wî de hebin di sekinî. Di nav bêdengbûne wî de hinek weke ku hazn ji hebû dihata xuyakirin.Her weha dema ku mirov li wî û li ruyê wî dimeyîzend kifş dikir.

Ku mîr li pêşiyê ku bûhûrtine hundir, êdî li hundir li mezele seydeyê mazin meleyê Cizirî rûniştin li hevdû.Dema ku rûniştin ji, pir bi bal ji weke ku heya wan mirovên li wir hemûkan li ser mîr bû.Heya mîr ji weke ku li ser Mihamed û mele Serhengê Zaxoyî û wan bû.Her weha rewş dihata ber çavan di wê heyeme de.

Piştî ku rûniştin, êdî hin mirovên ku navserî xwe bûn û mazin bûn, kirin ku axiftinê di nav xwe de bidine dest pê kirin.Her weha hewldan.Dema ku wan wilo kir, êdî weke ku faqa Qasim, mele Silêman û Mihamed ji vê yekê fahm bikin, wan ji di nêzîkatîyê de xwe tevlî wan kir û bidest axiftinê kirin.Piştre hêdî hêdî di nav wan de nîqaşaka ku ti haya bêje bi hizire û mazin dest pê kir.

Dema ku her weha nîqaşê di nav wan de dest pê kir,êdî ne bi gelekî re faqa Qasim û mele Silêman û mele serhengê Zaxoyî û hinekî ji Mihamed tevlî bûn.Dema ku axiftin, ji gelek tişt û bûyar û hizran axiftin.Piştre ku hinekî her weha axiftin êdî mîr ji di nav wan de mafê axiftinê hilda û di

nav wan zanistan de bidest axiftinê kir.Dema ku mîr mafê axiftinê hilda, hingî weke ku xwe weke zanistekî ji wan bide nîşandin li xwe anî û bidest axiftinê kir.Her gotinê ku ji deve wî derdiket ji ji xwe êminiye ji di xwe de dide der.

Mîr ku bidest axiftinê kir êdî bala herkesekî bi hey çû ser wî axiftine wî û gotinên ku wî di gotin.Her weha rewşek derketibû hole.Mihamed ji weke herkesekê li wir pir bi hey bala xwe dabû bp wî û lê dihisand.Mîr ji dema ku diaxift weke ku car bi car bi avirne ji be heya xwe dianî ser Mihamed û lê dimeyîzend.Ev yeka ji bala faqa Qasim ne ravî.Dema ku faqa Qasim her weha kifş kir êdî bala wî ji çû ser mîr û bi mîr re ji çû ser Mihamed di wê heyeme de.Piştî ku bala wî her weha çûbû bû ser wan, êdî ne bi gelekî re Mihamed ji farq kir k bala faqa Qasim wilo li ser wî û mîr e.Farq kiribû ku bala faqa Qasim ji ser yên li wir zêdetir li ser wî û mîr bû.Wî ev yeka di wê heyeme de farq kir. Dema ku farq kir ji êdî bala wî çû ser wî.Lê zêde ji wilo weke ku li xwe ne anî der.Heya ku axiftine mîr bidawî bû, her weha wê rewşê hebûne xwe berdewam kir.

Piştre ku mîr axiftine xwe bidawî kir êdî piştre bal hinekî çûna ser Mihamed ji.Ji ber ku mîr dema ku axiftibû, hinekî ser wê dema ku jê xwestibû xazîne jê re bibîne.Hinekî li ser wan gotinên xwe yên ku wî hingî gotibûn ku ´ya tê xazîne ji min re derxê yan ji tê serê xwe bide min´.Ji wan gotinan weke ku lêbûrînke ji Mihamed bixweze axivî bû.Ji ber vê yekê bû ku bala mirovan çûbû bû ser wî û mîr.Piştre Mihamed ji ku hinekî mabû sekinî êdî mafê axiftinê hilda bû û her weha ji mîr re gotibû;´ya rast ewê ku di riyeke xwude de ya.Ya rast ewê ku mirov ku hebin kêmesî û qancîyên xwe bibîne.Mirov kêmesîyên xwe divêt ku bibîne.Lê yên li dore mirov ji divêt ku qancîyên mirov bibîne û bêne ser ziman.Bi vê yekê re ez vê yekê ji bêjim. Qancî ku ji dilê mirov hat û mirov kir rastteqîniyeka baş di xwe de di pareze.Lê ti carî ji divêt ku mirov ji bîr neke ku weke hizir û têgihiştinê ew ji di serê mirov de çêdibin.Di serê mirov de rastteqîniyek heya.Ez di pirsim ku rastteqîni çi ya.Mirov kare vênakê çawa bi bersiv bike? Kengî me di hizir de û di serî de xwe naskir hingî mirov wê karibe bi bersiv kê.Bila ev yek newê ji bîr kirin.Bila ji aliyê mîre min ve ji ne wê ji bîr kirin.Ji ber ku ev yek yeka ku wê mirov di riya rast bihêle ya.Rastî ji kisî rastteqîniyê ya.Lê rastî ku bi mirov re hata têgihiûtin, hingî, dibe ji kisî mirov ji.Min ji bi vê yekê re ji kisî xwe dît ku ji ber wan gotinên mîre min yên ku ji min re gotibûn lê negirim.Bila bi vê yekê re dilê wî rehet û firah bê. ..´.Dema ku Mihamed her weha axift û sekinî piştre bal bi bêdengî çûne ser wî.Mîr piştre ku ma sekinî, êdî piştre mafê axiftinê hilda û peyivî;´Ti ji

rastteqîniyê axiftî.Ti ji mazinatîye xwe axiftî.Ya min ji her weha ya ku ez bêjim ewê ku min ji wê pevejoyê pir fêr û tişt derxist´.Ku mîr her weha du sê gotin êdî ma sekinî.Piştre yê axift faqa Qasim bû.Faqa Qasim ji mafê axiftin hilda û demeke dirêj axift.Dema ku axift, pêşî hinekî ji Mihamed û hizre wî û gotinên ku wî anîne ser ziman û ji rast bûne wî axift.Piştre ku wî axiftine xwe bidawî kir, êdî piştre yên ku axiftin ji maf dana wî û axiftine wî û axiftinê xwe kirin û bidawî kirin.

Piştre ku her weha weke demek axiftin û dan û standin di nav wan de çêbû, êdî piştre gotin hata ser çûne Mihamed û mele Serhengê Zaxoyî.Dema ku gotin hata ser wê êdî mîr pêşî mafê axiftin hilda û bidest axiftine kir.Dema ku mîr axift ji, pêşî ji Mihamed û mele Serhengê Zaxoyî axift û piştre got wan ku´ez dixwezim ku hin mirovên ku wê bigihênine heya cihê ku winê herne de bidime amede kirin û bidime rax wa..´ û piştre axiftine berdewam kir.Mîr ku axiftine xwe berdewam kir, li ser pir tişt û demên berê sekinî.Mîr, ku diaxift, axlabe ji ji dema bave xwe û bavkalê pir minaq didan.Di wê demê de ji hinekî li ser wan û demên wan sekinî. Pir xweşik û xweş axivî bû.Mirovên li wir bi wê xweş gotina xwe ji xwe biribûn.Wan ji hema wilo xwe li wî û hisandinê berda û çûbûn.

Dema ku mîr axiftine bidawî kir êdî piştre ne bi gelekî re faqa Qasim kir ku biaxivê, û pişt wî ne bi gelekî re ji wî mafê axiftinê hilda û bidest axiftinê kir.Dema ku wî ji bidest axiftinê kir hingî, wî di axiftinê xwe de gote wan ku ´ez wê hizre mîre me pir rast di bînim.Ji ber ku di herême de win his dikin di van demên dawiyê de çi di qawimin´.Dema ku wî wilo got, êdî hinekî din ji axift û piştre axiftina xwe bidawi kir û ma sekinî.Mihamed bêdeng sekinî bû. Mele Serhengê Zaxoyî ji ku hinekî ma sekinî êdî piştre mafê axiftinê hilda û her weha weke ku ji dêla xwe û Mihamed li mîr vegerenê axift;´

´Mîre min, te rast got. Pir tişt di vê dawiyê de di qawimin.Ji ber vê yekê ji bo ku dema ku ez ji wir bi rê ketim ku werime vir, hingî, ji wir pir mirovan gote min em ji emê bi terê werin û piştre hatin.Mîr Birehîm ji ku li herême Zaxoyê ya ji gote min ezê bi we re hin mirovne dime amede kirin ku bi we re werin.De ne, Mîr Birehîm, mîrekî ku mazina.Mîre min ji navê wî bihîstiya.Li ser xwe ya.Hêzeke wî ya mazin heya.Bavê wî mîr Xanemîr bû.Mîr xanemîr pir mazin bû.Li ser ser herêmê ji bûbû xwedî hêz.Piştî Mîr Zengî re ji wî re mîr Zengîyê duyemîn ji dihata gotin.Bi rastî ji mazin bû. Bi bi xêr bû.

Pir mirovên mazin li civate wî li dîwane wî dirûniştin.Aşqî gotin bû.Pir diaxift.Zanibû bi axivê.Dema ku diaxift ji mirovên dore wî pir lê dihisand

û lê şaq diman.Her weha ew mirovekî ku mazin bû.Wî ji xwest ku weke Mîr Zengî bike.Wê li ser ava Delalê ji xwe re qasreke ku mazin çêkiriya.Lê ez ji mîre xwe re bêjim û ez zanim ku mîre min ji zane ku li herêmê mîre herêmê bigiştî ji heya.Ji xwe win ji zanin ku herême me ´herême Badînan´ e. ´Mîre Badinan´ ji jê re têt gotin.Navende badinan ji hewlêr e.Hewlêr ji mazin û pir pêşketîya. Xwediyê çûn û hatineke mazin e.Ji herême Hekmetene û Kirmanşanê ji mirov xwe di gihinênine wir.Ji ber bazirganîyê.Ewder dikeve ser riye ku ji herêmên ku Çînê û India têt. Dema ku ji wan herêman mirov berê xwe da bi vir ve êdî mirov di wir ve têt.Bi vê yekê re mazina.Sînore Badinan ji aliyê dî digihê ber herême me ya ku berê me jê re *Korek* di got û piştre ku di dema Sasanîyan de ji jê re *Germakan* dihata gotin.Piştre ku ji Asiyê ku êrîş li ser herêmê dest pê kirin, êdî hin êrîşên Timurleng ji li ser bûn.Ji ber ku li pêş bû û pir li ber çavan bû.Ji ber vê yekê ji xwest ku bike destê xwe de.Bi vê yekê re hata ser û pir mirov jê di şûr de derbas kirin.Piştre wî jê re got Kerkuk.Her weha dîrok ber dewam dike.

Vêce ez ji ber çi vê yekê tênime ser zimên?Ez wê ji bênime ser zimên, da qana bê têgihiştin. Ji ber ku ev êrîş li herême me, ez zanim kiu mîre min zane ku pir bandûr û kargarîyeke mazin lê kirin.Herême Badinan piştî van pevejoyan re nehata ser xwe.Piştre hin êrîş berdewam dikin.Iroj ji hin êrîş ji osmanîyan berdewam dikin.Ji ber ku serwerîya li wanderan çêbikin.Ji ber ku xwe bigihênine Baxda yê.Baxda ji li pêşe û navendeke mazina. Navê wê ji heya.Ji piştî rewşa Hasan-Huseyîn re êdî herêm ji herêmeke aramîyê derket. Aramiya xwe winda kir.Rewşa ku hata serê Hasan-Huseyîn pir biêşa.Dilê mirov pir diêşene. Êşeke mazin dike dilê mirov de.Ew bûyar ji ber çi qawimî? Divêt ku ew yek ji were têgihiştin. Şerekî desthilatîyê bi Abbasîyan re dest pê kiribû.Abbasîyan Nêzîkatîya olî di rêberiyê de bicih kir.Vê yekê piştre her weha hebûne xwe berdewam kir.Piştî wê rewşê re êdî ji dore Kerkuk(korek)ê bigire heya ku digihê herêmên din yên badinan dibine alîgirê wan.Her weha êdî rewşek dest pê dike. Êşên mazin hena.Bi vê yekê re girêdayî divêt ku mirov bêne ser ziman ku êrîşên osmanîyan ji herêm bi tavahî bêawla kiriya.

Lê divêt ku ez bêjim, ku piştî waqas êrîşan re ji herêm hê ji li ser xwe ya û bi hêza xwe ya. Bi saya serê mîre mîn û yên weke wî.Bi vê yekê re divêt ku ez bêjim, ku nahaka hêzeke herêmî ji heya.Piştî wan êrîşan ji mîre me bi mîrên din re rûnişt û bi wa re hêzeke mazin da ava kirin ji bo awlakarîya herêmê.Nahaka ji navende vê hêze ji hewlêr a.Kela badinîyan a. Heya mîre min ji van yekan heya.Ji ber ku hertimî agahî ji wî re ji têt...´´

Ku mele Serhengê Zaxoyî her weha dirêj û dirêj diaxift, mirovên li dore wî ji pir bi bal lê dihisandin.Heya xwe di dane de.Mîre bota ji pir bi bal heya xwe dabûyê de û lê hisandi bû. Mîre bota, rast bû, heya wî ji wan rewş û bûyînan hebû.Lê belê dema ku mele Serhengê Zaxoyî axiftibû û anî bû ser ziman ji, pir bi bal lê hisandi bû.Heya xwe dabû bû ser wî û axiftina wî di wê heyeme de.Mihamed ji li nig wî rûnişti bû.Faqa Qasim ji li wan û mele Silêman ji li nig wî rûnişti bû.Her weha hemû ji li nig hevdû rûnişti bûn.Li hevdû bi bal di hisandin.Piştre ku her weha axiftin û dan û standin di nav wan de çêbû û bûhûrt, êdî piştre ku hinekî dî axiftin di nav wan de bû, êdî piştre kirin ku civate ji hev bela bikin.Mîr ji kara xwe kir ku herê.Dema ku her weha kirin ku rabin û piştre ku rabûn ji, êdî ku rabûne ser xwe mîr di cih de gote hin mirovên li nig ku hin amedekarîyan bidine dest pê kirin û hin mirov xwe ji bo rê bi sûwar bikin dakû bi wan re heya cihê ku wê herine de bi wan re herin. Dema ku mîr weha got êdî piştre ne bi gelekî re mirovên ku ji wan re hata gotin, êdî çûn ku weke ku mîr gotî hin amedekarîyan bikin.

Piştre ku mîr her weha got êdî piştre ew ji kir ku herê.Dema ku kir ku herê, hingî, mirovên ku pêre hatibû ji, pêre rabûne ser xwe û dise weke ku hatin dana dore wî û çûn.Piştî ku ew çûn êdî Mihamed, mele Serhengê zaxoyî û mele silêman ji dise bi hev re man.Piştî ku ew ji bi hev re bi tenê ma, êdî ew ji hinekî dî li hevdû rûniştî ma.Piştre ku hinekî dem dise têve çû êdî faqa Qasim kir ku herê.Dema ku wî her weha kir ku herê êdî piştre ne bi gelekî re ew ji çû.Piştre ku ew rabû Ser xwe ku herê êdî mele silêman ji da rax wî ku herê.Mihamed û mele Silêman ji bitenê man.Ew ji, ku ew çûn piştre hinekî li cihê xwe man û hinekî xwandin û û mihamed ji hinekî nivîsên wê yên ku wê hizir kir ku bi xwe re bibe dana hevdû û kire tûrikekî ku li pişte wî bû.Mihamed tûrikê xwe dabû pişte xwe.Ew ji dihata wê wate êdî ji rê de amede bû.Ji çûne re amede bû.Piştre ku her weha xwe amede kir, êdî piştre weke mele Serhengê zaxoyî j amede bû.Hin mirov li nig wan mabûn.Hin mirovên ku ji berê ve bi Mele Serhengê zaxoyî re bûn. Bi wan re hin faqa ji hebûn.Ew faqa ji faqihên ku li medrese sor diman bûn.

Piştî ku dema mêje ji hat, êdî Mihamed ji û mele Serhengê Zaxoyî ji rabûne ser xwe kirin ku herine Mizgefte Nebî Nuh ji bo mêjkin.Dema ku ew rabûne ser xwe bi wan re mirovên ku li dore wan ji bûn, rabûne ser xwe û ku ew ketine rê de ku herin ji wan ji da dore wan û bi wan re çûn.Bi vê yekê re dema ku ji medrese derketin weke komekê bûn.Mele Serhengê Zaxoyî û Mihamed li pêşiya wan bûn û di meşîn.Ku ketine rê de û meşîn ku herine mizgeftê, êdî ne bi gelekî re hatin û gahana mizgeftê.Dema ku

ew gahana nêzîkî mizgefte êdî dîtin ku wa pir mirov wê ji bo mêje kom dibin.Piştî Mihamed û mele Serhngê Zaxoyî ji gahana nêzîkî wan êdî bala wan ji hatibû ser wan.Mîr ji li wir bû.Ew ji li wir amede bû.Mirovên ku pêre bûn pir bûn.Mirovên ku hatibûbûne mêhvandarîye wî ji pê re bûn.Her weha pir mirov di wê heyeme de li nig hevdû kom bûn ji bo mêje.

Piştî ku Mihamed û mele Serhengê zaxoyî ji bi mirovên ku bi wan re ku gahabû bûne nig wan mirovan, êdî bi silav dayîna li wan re êdî tevlî wan bû bûn.Êdî wê mêj kiriban.Faqa Qasim ji dema ku ji nig wan rabûbû û hatibû, rast û rast hatibû mizgeftê ku ji bo mêje hin amedekarîyan bike.Piştî ku ew hatibû wir êdî pişt wî re ne bi gelekî re mirov ji bidest hatine kiribûn.Piştrene bi gelekî re êdî mîr ji hatibû wir.Piştre êdî hin bi hin civandin çêbû bû. Mihamed û mele Serhengê Zaxoyî ji piştre wan bi hinek mirovan hatibû bûne wir. Piştre ku ew ji hatibûn êdî ne bi gelekî re mêje ji dest pê kiribû.Dema ku ji bo mêje ketibûbûne rêze de hingî mele Silêman û Mihamed li nig hevdû bûn.Mele Serhengê Zaxoyî ji ne dûrî wan bû.Lê weke ku hin mirov jidi naqabine wan de hebûn.Mîr ji di rêze pêş de cihê xwe girtibû. Her weha êdî bidest mêje kiribûn.

Piştî ku bidest mêje kirin û mêje kirin ji, êdî piştre li hevdû rûniştin û bi hev re hinekî ji axiftin.Mîr ji li wir bû.Weke her car çawa ku faqa Qasim diaxift, wê carê ji ew axift.Dema ku ew axift êdî piştre herkesekî pir bi bal lê hisand.

Axiftine faqa Qasim ku demeke berdewam kir êdî piştre bidawî bû.Ku bi axiftine wî bi dawî ji bû, êdî piştre hin bi hin mirov bidest çûne kirin.Lê Mîr û mirovên ku pêre bûn hê li wir bû.Mirovan dîtibû ku mîr da ku wê herê êdî wan ji dabû xwe.Piştre mîr ji dabû xwe û hatibû derve hewşê.Piştre ku ew hat, êdî mirovên din ji hatina nig wî.Faqa Qasim, mele Silêman, mele Serhengê Zaxoyî û Mihamed ji derketin.Dema ku Mihamed rabû ser xwe û kir ku derkeve, bi ber çavên faqa Qasim ket ku wa tûrikek ji wê bi Mihamed re ya.Tûrikekî ku tiştên xwe bixiyê de.Dema ku faqa Qasim dît, êdî bala wî kişand.Dema ku bala wî kişand ji êdî çû û nêzîkî wî bû.Bi ber wî ve çû.Dema ku çû nig wî ne axift, ma sekinî.Lê bala wî ji li ser tûrik bû.Mihamed ji piştre ev yek kifş kiribû.

Piştre ku ji hundir hatibû bûne derve, êdî dîtin ku wa hin mirovên ku mîr gotibû wan ji bo ku bi mele Serhengê zaxoyî Mihamed re bikevine rê de wa xwe amedekirî hatine ber mizgeftê.Dema ku Mirovên li dore wan ev yek dîtin, dêî fahm kirin ku rêvanî heya.Lê kî bû, haya wê kêlîkê ji nizani bûn.Piştre ku demek têve çû êdî hata kifşkirin ku Mihamed û mele Serhengê Zaxoyî rêvanin.

Wê rewşa li hev kombûne weke kêlîkêkê berdewam kir.Piştre mele Serhengê Zaxoyî û Mihamed ku mîr ji û mele Silêman û faqa Qasim di rax wan de wa derketrine pêş.Dema ku ew derketine pêş hingî bala mirovên li dore bicivîn çûne ser wan.Dema ku bala wan çû ser wan, hingî, yê ku pêş axift û ji cimaate li ser wan got ku wê ew bi rê bikevin mîr bû.Dema ku mîr wilo got êdî bala mirovan çû ser wan.Lê bala faqa Qasim û mele Silêman pir li ser Mihamed bû.Mihamed û mele Serhengê Zaxoyî dema ku derketine pêş ku bi rê bikevin û ku piştre amedekarî bûn û kirin ku bi rê bikevin, Mihamed bi ber faqa Qasim ve hat û hin nivîsên xwe yên ku bidest nivîsandi bûn û ku gelek li ser hevdû bûn radestî faqa Qasim kirin.Dema ku Mihamed her weha kir, êdî baleka mazin çû ser wî di wê heyeme de.Faqa Qasim ji dema ku Mihamed her weha radestî wî kir, wî ji girt û kire bin çengê xwe de.Gelek nivîs bûn.Weke ku sê an çar pirtûk li ser hevdû bin stûr bûn.Her weha dihata berçavan.Dema ku mirov di meyîzend, bi wî awayî bi ber çavên mirov diket.Mihamed pir nivîsandi bû.Li wir li Cizîre bota pir demên xwe bi xwandin û nivîsandinê dibûhûrand.Li medrese sor ji di wê cara dawiyê de dema ku vaqataha bû û ne vegerehe bû pir nivîsên xwe hiştibûn.Ew nivîsa ku mazin û ku bi xwe re anî bû û radestî faqa Qasim kiribû wî pir girîngî dideyê de.Li mizgefte Nebi Nuh beşa pirtûkan hebû.Têde pir pirtûk hebûn.Mihamed xwestibû ku bike wirde.Dema ku pirtûka wî ketibena wir de, hingî, wê haya haya mabana.Wê ne winda bû bûna û ne ji wê ji holê rabû bena.Li wir nivîs û pirtûkên pir zanist û mazinên ku hatin û çûne hebûn.Hemû ji di wir de hew kirî bû.Mirovên ku li wir dirûniştin ji ew nivîs an ji pirtûk dixwandin.

Mihamed ji pir caran li ser rûnişti bû û xwandi bû.Li wir ji gelek mirovan nivîs û pirtûk hebûn.Mirov karîbû ku bêjê ku bi hezaran bûn.Beşeke mazin ji mizgefte Nebi Nuh û dore tirba wî weke pirtûkxane dihata bi kar anîn.Pir mirov ku derfet di dîtin ji dihatina ber tirba Nebi Nuh û li wir hinekî ji xwe re dixwandin.Ev li wir xwandin weke ku xêr dihata dîtin. Her weha nêzîkatî ji dihata kirin.Ji bo wê rewşê di nav kurdan de weke weke kevneşopîyeke ji hebû.Her weha piştî ku seydeyê mazin meleyê Cizîrî digihê rehamte xwe, êdî dore tirba wî ji li medrese sor tişî pirtûk hatibû kirin.Mihamed ji ji ber ku li wir dima, wî bixwe ji hin nivîs nivîsandi bûn û li wir danî bûn, bicih kiribûn.Mirovên ku dîçûne wir ji dixwandin.Lê li mizgefte Nebi Nuh pir pirtûk hebûn.Ji ber ku ji gelek deman ve her zanistên ku di wir de çûbû li wir her weha tiştek ji xwe hiştibû.Bi vê yekê re di demê de pir pirtûk û nivîs li wir li hew bû

bûn.Mirovên ku li wir diman ji û di rûniştin ji dixwandin.Her weha li wir li dore tirba Nebi rewşeke zanistitîyê di demê de ava bû bû..

Ew rewş, ku weke wê rewşê li dore tirba seydeyê mazin meleyê Cizîrî ji çêbû bû.Li dore tirba wî ji hertimî mirov dirûniştin, di hizirîn, dixwandin û dinivîstin.Bi vê yekê re û vê rewşê re mzigefte Nebi Nuh ber tirba wî û medrese sor ber tirba Seydeyê mazin meleyê Cizîrî pir li pêş bûn.Pir navê wan deran hebû...

Piştî ku mele Serhengê Zaxoyî û Mihamed derketibû bûne pêş, êdî piştre ne bi gelekî re kara wan ya bi rê ketine bi dawi bû bû.Wan ji piştî ku derketibû bûne pêş û pir ji du sê gotin kiribûn piştre bidest xatir xwestine kiribûn ji bo ku bi rê bikevin.Hin mirov mîre bota dabû bûne amedekirin ku bi wan re herin.Mirovên ku xwe amedekiribûn ji mirovne ku li ser xwe bûn û simbel qaytan bûn.Weke ku şervanne pir mazin ji bûn.Dema ku mirov li wan di meyîzend, mirov di dit ku pir ji xwe bi êmin in.Her weha rewşa wan dihata berçavan.Dema ku mele serhengê zaxoyî ji hatibû, hingî, pêre ji hin mirovên ku hatibûn hebûn.Ew ji hin mirovên ku weke sofî an ji hin mirovên weha xwanda bûn. Her weha dihatina xuyakirin.

Ew ji amede bûn.Ew ji wê bi rê ketiban.Ew ji di wê dema ku mele Serhengê Zaxoyî li wir mabû li wir mabûn.Nahaka wê vêce mele Serhengê Zaxoyî bi rê ketiba û ew ji wê pêre bi rê ketiban.Ew ji mirovne ku zane bûn.

Mihamed di wê heyeme de pir bihizir bû.Di serê xwe de weke ku çûbû derne din.Her weha dema ku mirov lê dimeyîzend fahm dikir.Ew hizirbûne li ser wî ji çavên faqa Qasim û mele Silêman ne diravî.Ji ber ku bala wan li ser wî bû û her rewşa wî têdigihiştin.Bi vê yekê re Mihamed li ser çavan bû.Li ber çavên wan bû.ne tenê li ser berçavên wan bû, li ber çavên wan mirovên ku li wir hemûkan bû.Ew demeke ku dirêj bû ku Mihamed li wir bû.Bi vê yekê re li pir mazin hatibû naskirin.Ew rewşê xazîne ji hinekî ew derxistibû bû di nav xalkê de bi navê wî re.Wê rewşê pir ew di serê mirovan de bicih kiribû.

Lê ya ku li wir ew di serê mirovan de mazin bicih kiribû, zanebûne wî bû.Bi vê yekê re derketibû pêş.Ew piştî ku bi seydeyê mazin re hatibû wir, êdî ji wir ne vaqataha bû.Haya wê rojê.Hin mirovên ku li wir bûn, hizir dikirin ku Mihamed wê herê û demeke li wan herêman ji bimene û piştre careke dî vegerihê wir.Faqa Qasim ji yê her weha bawer dikir bû.Ew ji bihizir bû ku Mihamed wê piştre careke dî vegerihê wir.

Mihamed, careke dema ku bi faqa Qasim re axiftibû û dema ku di wê carê de çûne wî di nav wan de hatibû rejeve êdî gotibû ku ´ezê careke dî

vegerihime vir´.Ev gotin di serê wî de bû.Lê ka ma ka wê vegerehe bana? Ne kifş bû.Dema ku mirov keta riyan de heya ku sad tişt were serê mirov di riyan de.Mihamed ji ev yek zanibû û faqa Qasim ji ev yek zani bû.Lê biqasî ku Mihamed ji faqa Qasim re gotibû, ku wê çûban pir deran ji wan deran ji weke ku wî gotibû wê hatibana herêma Xizanê û ji wir ku xwude gotibana erê wê demeke li wir ji mabana û piştre wê hatibana wir.Piştre ku hat, êdî wê li wir mabana û an ji wê dise bi rê ne ve çûbana, ew ji xwude zani bû.

Faqa Qasim ew nîqaşên ku di navbera wan de çêbû bûn, hemû ji di bîre wî de bûn.Li ser wan ji dihizirî.Çend ku Mihamed di wê heyeme de bi hizir bû, ew ji her weha di wê heyeme de wilo weke wî di serê xwe de di xwe de bihizir bû.Di serê xwe de ew demên ku bi hev re bûhûrandi bûn di bîre wî de bûn.Li ser wan deman ji di hizirî.Wan pir demên xwe bi hev re bûhûrandi bûn.Pir nîqaş bi hev re kiribûn.Pir dan û standin bi hev re kiribûn.Li ser gelek tişt û hizran bi hev re nîqaş û dan û standin kiribûn.Ew hemû, di wê demê de dema ku faqa Qasim hizirî bû di serê wî de bûhûrtibûn.Dema ku di wê heyeme de careke xwe nêzîkî mele Silêman kiribû, û bahsa hin demên berê kiribû, êdî hatibû têgihiştin ku ew her weha di serê xwe de hizirî bû.Dema ku ew wilo ji mele Silêman re axifti bû bi du sê gotinan êdî ew ji weke ku bikeve hizran de lê hatibû.Lê çavên wan ji li ser Mihamed bû.Mihamed li nig mele Serhengê Zaxoyî sekinî bû.Mîr li nig wam sekinî bû.Hinekî mirovên din ji yên ku bi wan re wê ketiban rê de û yên ku wê ew bi rê kiriban li nig wan bûn.Wan ji êdî kara xwe dikir ku bi rê bikevin. Piştî ku bidest xatir xwestinê kiribûn, êdî ne bi gelekî yên ku wê bi rê ketiban ji hatibû bûne nig hevdû û kara dikirin ku bi xêr û silemet bi rê bikevin.Mirovên ku wê bi wan re ji çûban yên ku wê li haspan sûwar bûban ji êdî sûwar bûn û kirin ku bi rê bikevin.Êdî ew rêviyê rê bûn.Wê çûban.

Ne bi gelekî re ku hinekî dî ji wilo li nig hevdû mana sekinî û êdî ew riye ku wê têre çûban ji berê xwe dane de û gotina wan mirovên ku ew bi rê kirin bixatir û bi rê ketin.Êdî ew di rê de bûn û diçûn.Dema ku ketina rê de ji faqa Qasim û mele Silêman ji ji paş wan ve weke demeke li wan meyîzendin, heya ku ew ji ber çavan winda bûn.Piştre ku ew ji ber çavan winda bûn, êdî bi hev re dane rax mîr û bi hev re hatin ku werine qasre û li qasre li civate mîr li hevdû rûnihin.Hin mêhvanên mîr ji hebû.Wê bi hev re li hevdû rûniştiban.

Faqa Qasim dema ku Mihamed bi mirovên ku wan re çû ku ketibû rê de û çûbû, ji paş ve pir lê meyîzendi bû.Lê di di cihê xwe de mabû sekinî

û ji paş ve lê meyîzendi bû.Li çûbûne wî meyîzendi bû.Heya ku ew ji ber çavan winda bûbû ji ji paş ve lê meyîzendi bû.Piştre ku ew bi yên ku çûn re ku ji ber çavan winda bû, êdî piştre hinekî dî ji li cihê ku lê bû ma sekinî û bi wir ve meyîzend.Piştre ku mîr, ku ew ji ber çavan winda bûbûn û çûbûn, êdî piştre gotibû mirovên dore xwe ku pêre herine qasre li hevdû rûnihin.Wan mirovan ji ew ne şikandi bû.Wê Faqa Qasim ji her weha bi wî re çûbana.Lê belê ew di cihê xwe de mabû sekinî.

Piştre ku her weha ew demeke di cihê xwe de dimene sekinî, êdî piştre ne bi gelekî re ew ji weke ku were xwe lê têt û piştre dike ku bi mîr herê qasre û li hevdû rûnihin.Lê bi hizir û hazn bû.Her weha rewşa wî dihata xûyakirin.

Faqa Qasim, dema ku ji cihê xwe labitî ku bigihê wan û bi wan re herê, mele Silêman ji di rax de kiribû ku pêre bi meşê.Ew ji bi hazn bû.Ew dema ku Mihamed û ew ketibûbûne rê de û çûbûn êdî ji paş wan ve li wan meyîzendi bû.Ew ji bihizir û hazn bû bû.

Piştî ku Mihamed û yên ku pêre, ku çûn êdî piştre yên ku li paş man ji dana dore mîr û bi hev re çûne qasre û li hevdû li civate hevdû rûnihin.Faqa Qasim mirovekî ku pir jê re rêz dihata girtin bû.Dema ku ew ji cihê xwe labitî bû û gahabû nig mîr, êdî piştre bi rê ketibûn. Piştre bi hev re meşî bûn.Dema ku meşî bûbûn ji Faqa Qasim bi mele Silêman re di rax mîr de bû û dimeşî.Lê bi hizir û hazn bû.Mele Silêman ji her weha weke wî bi hizir û hazn bû.Her weha dema ku li wan dihata meyîzendin pir baş û qanc dihata têgihiştin û fahmkirin.Mîr ji di nav mirovên ku pêre dimeşîn de dimeşî û car bi car ji hin gotin ji deve wî derdiket û diaxift. Dengê wî wilo dihat.Mirovên li dore wî ji hemû ne ji Cizîre bota bûn.Hin ji wan mirovan ji dûr hatibûbûne nig mîr.Ew ji bi temenê ji mîrîtîyê ne dûr bûn.Bi vê yekê re mirov karê bêjê ew ji miovne mazin û ji xwe bi bawer bûn.

Her weha ku weke bêhneke bi hev re diaxiftin dimeşîn, êdî tên û têne qasre.Dema ku têne qasre êdî bi hev re dikevine hewşê de û di hewşê de zêde ne mênin û dibûhûrin û diçine mezele ku wê têde li hevdû rûnihin.Dema ku diçin û li hevdû dirûnihin, êdî di pêşengîye mîr de dikin ku bidest axiftinê bi hev re bikin.Bi hev re bikevine nîqaşê de.Dema ku dirûnihin, mîr dike ku herweha nîqaşê bide dest pê kirin.Nîqaşê piştre ne bi gelekî ji dide dest pê kirin.Dema ku axiftine pêşî dike, êdî piştre mirovên li dore wî ji dikin ku bi hev re bikin ku bi axivin.Lê faqa Qasim di cihê xwe de bêdengê.Ti deng û meng wilo jê dernekeve.Tenê wilo di serê de weke ku dihizirê.Her weha têt berçavan.Mele Silêman ji ne kîmî wî ya.Ew ji bêdengê.Piştî ku ji mizgefte nebi Nuh hatibûn û gahabûbûne qasre û li

qasre ji li hevdû li civate hevdû rûnişti bûn ji û li piştî ku li hevdû rûniştibûn ji bi hev re bidest axiftinê ji kirin, faqa Qasim ew bêdengîye xwe xira ne kiribû.Ev yek ji bala mîr ji ne diravî.Piştî ku hatibûbûne qasre û li hevdû rûnişti bûn ji bala mîr çûbû bû ser wî.Faqa Qasim, her weha çend ku bala mîr çûbû bû ser wî ji weke ku ne di wê farqê de bê bû.Her weha dihata berçavan.Lê bala mîr li ser wî bû. Dema ku bala mîr çû ser rewşeke û mirovekî, heya ku fahm ne kiribena ji ne di sekinî.Di wê heyeme de ji wilo bû.Piştî bala wî çûbû bû ser faqa Qasim, êdî bala xwe ji ser wî ne vekiribû. Mereq di serê wî de çêbû bû ku ka çima ew wilo bihizire.Lê dema ku wilo dihizirî ji ne ku hin hizir ne dihatina hiş û aqlê wî di wê heyeme de.Mihamed dema ku li wir bû, hertimî ew û faqa Qasim li nig hevdû bûn.Bi pirranî demên xwe bi hev re dibûhûrandin.Mîr ji heya wî ji vê yekê hebû.Ji ber vê yekê di serê xwe de weke ku ne bê hizir ji bû.Lê dise ku ew wilo bi hizir di dît, êdî di serê wî de hizirne bi mereq çêdibûn... ..

Mihamed û mirovên ku pêre bûn û ketibûbûne rê de ji piştî ku ketibûbûne rê de êdî ne bi gelekî re ji Cizîre bota derketibûn.Ketibûbûne nav çolê de.Mele Serhengê Zaxoyî ji ber ku pir pîr bû, êdî li ser hasp hatibû sûwar kirin.Lê Mihamed her ku ji wî re haspek hatibû amedekirin, ew paya di rê de diçû.Lê haspe ku ji bo wî hatibû amedekirin ji, bi xwe re biribûn.Hizir kiribûn ku piştre heya ku ew ji lê sûwar bibe.Mihamed hij meşê dikir.Di meşê de ji sivik bû.Zû diçû.Dema ku dikete meşê de pir zû diçû.Bi faqikî diçû.Faqa, hertimî di riyan de zû bûn.Ji ber vê yekê ji, ji wê meşa wan ya ku wan dikir re ji di gotin meşa faqakî.Herweha ji wan re dihata gotin.Mihamed ji mazin bû û zanist bû.Lê ji wê jiyana faqatiyê derneketi bû. Hertimî xwe di rewşa fêrkirinê de hiştibû.

Wî hertimî dixwand û dinivîsand.Bixwand û nivîsandine xwe re li Cizîre bota navê wî derketi bû.Ew pir bi wî awayî hatibû nas kirin.Ew weke mirovekî ku hertimî dixwand û di nivîsand dihata nas kirin.Bi vî awayî re navê wi li wir derketibû.Ji ber ku li medrese sor mabû û bi seydeyê mazin meleyê Cizîrî re hatibû wir û piştre ji li wir mabû, êdî baş bi xosletên xwe re ketibû ber çavan de.

Mihamed, di wê dema jiyane xwe de, pir ketibû ber çavan de û li ber çavan mabû.Di wê dema xwe ya jiyana xwe de pir mazin bû bû.Ew di wê dema xwe de bû bû zanist.Her weha derketibû pêş ji.Lê ya ku ew kiribû zanist, ew hizre wî ya ku wê bi mirovan re hem bi nivîskî û hem ji bi dev hevpar dikir bû.Ew bi vê yekê re mazin bû bû.Bi vê yekê re derketibû pêş û navê wî derketibû.Ew hinekî kelegerm bû.Bi vê yekê ji dikir ku ew

hertimî bi hizre wî re li ber çavan bena.Bi vê yekê re ji ew hertimî li ber çavan bû.

Mihamed, ku mirov wê dema jiyana wî şîrove bike, divêt ku mirov wê demê weke demeke girîng û domeneke mazin ya di jiyana wî de şîrove bike.Di wê demê derdikeve pêş.Di wê demê bi hizre xwe mazin têt nas kirin.Bi vê yekê di nav xalkê de dibe hizirvanekî mazin.Bi vê yekê re mazin di serê mirovan de cih û war digirê.Ku mirov li wê dema jiyana Mihamed di hizirê, mirov pir pêşketinan dibîne.Ew pêşketinên ku mirov dibîne ji, ne tenê her weha bi aliyekî xwe didine der li ber çavan.

Wî li wir li Cizîre bota bi hizre xwe re di serê xwe de û di nav xalkê de hizreke mazin bi temen xwe re damazirand.Li ser vê yekê pêşketine wî mazin çêbû.Mirovên ku ew nas kirin ji, ew bi hizre wî re û bi pêşketinn ku wî di xwe de çêkirin û dana nîşandin nas kirin.Bi vê yekê re ew mazin û têra xwe di nav xalkê de li Cizîre bota û li hevirdore wê têt nas kirin.Wî hizreke mazin di serê xwe de bi xwe re çêkir.Hizre wî ku di serê wî de pêşket ji, tenê di serê wî de ne ma.Bi xalkê de û hevirdore wî re hata ser ziman.Herkesekî ya di serê wî de û hizre wî fêrkir. Bi vê yekê em karîn bêjin ku ew bi hizre xwe re têt naskirin.Bi vê yekê re ew weke zanistvanekî mazin têt nas kirin.

Mihamed, dema ku ji Cizîre bota vaqataha bû bû ji, bi çûne wî re weke ku cihê wî vala mabû.Yê ku ev yaka li wir herî baş û qanc weke ku di dît ji faqa Qasim û mele Silêman bû. Dema ku ew çûbû ji, yên ku li ser wî ketibûbûne hizir de ew bûn.Wan cihê Mihamed vala di dît.Wan bi çûne wî re valabûnek li hole di dît.Ji ber vê yekê bû ku ew wilo bihizir bûn.

Mihamed ji, dema ku di rê de dimeşê, bihizir bû.Pir bi hizir bû.Ew ji di riye xwe de diçû û bihizir bû.Weke ku di serê xwe de di riyekê de herê bû.Ew riye ku diçû weke ku di serê xwe de ji diçû.Her weha di rewşekê de bû.Mihamed, her qavza ku diavêt ji, weke ku di serê xwe de di hizran de wilo qavzek di avêt û kur diçû û kur dibû.Her weha bihizir bû û diçû.Mele Serhengê Zaxoyî li nig wî li ser hasp dimeşî.Wî ji, dema ku li Mihamed dimeyîzend ji, her weha ew bihizir di dît.Dema ku ew bihizir ji di dît, bala wî diçû ser wî û ji ser wî ne diçû. Ew demeke dirêj bû ku ketibûbûne rê de û çûbûn, lê belê weke ku Mihamed ne li xwe û di farqa wê de bû.Mihamed, li ser lingên xwe diçû.Lê di serê xwe de di nav hizran de çûbû.Ew di serê wî de pir hizir û têgihiştin hebûn.Ew dema ku di meşî weke ku di nav wan hizir û têgihiştinên xwe de dimeşî lê dihat.Dema ku mirov di wê rewşê de lê dimeyîzend ji mirov wilo di dît ku ew çend xort bihizire.Mihamed, li Cizîre bota jiyaneke mazin bi perwerde û pêşketinê derbas kiribû.Ew di

wê heyeme de dema ku di rê de diçû, ew dem ji serî haya ku hatibû wê kêlîkê de di serî wî de li bîre wî bû.

Mihamed, dema ku di rê de diçû ji, her weha weke ku pir bi hizir bû.Pir di serê xwe de diçû û dihat.Pir di serê xwe de bihzir bû.Çendî rê çûbûn weke ku di wê heyeme de ne di farqê de bû.Her weha dihata xuyakirin.

Ku her weha demeke di meşîn, û her weha di wê rewşê de ku bala mele Serhengê Zaxoyî ji têt ser wî, êdî mele Serhengê Zaxoyî dike ku li ser hasp sûwar hin gotinne bêje û bike ku pê re bi keve axiftinê de.Lê Mihamed, weke ku hişê ne li wir bû.Her weha wî di dît.Mele Serhengê Zaxoyî û Mihamed, dema ku ketibûbûne rê de, bi wan re pir mirov ketibûbûne rê de.Mirovên ku dema ku mele Serhengê Zaxoyî hatibû wir, çawa ku pêre hatibûn wisan ji pêre ketibûbûne rê de û diçûn.Bi vê yekê re ji, hin mirovên li ser xwe û ku simbêl qaytan bûn, mîr dabûbûne amede kirin ku heya cihê ku wê herine de, heya zaxoyê wê bi wan re ban.Bi wan re ji dibûne gelek.Axlabe wan ji li ser hasp bûn.Lê hin ji wan ji weke Mihamed dibêt ku hij meşbûne bi lingan dikirin, ew ji bi lingan dimeşîn.Bi vî awayî pir mirovên ku di wê heyeme de bi lingan dimeşîn hebûn.Lê yên ku li ser haspan ji bûn hebûn

Mihamed, bi rê ketibû û diçû.Lê belê aqlê wî weke li li paş ma bû.Li ser tiştne û rewşne û mirovne dihizirî di serê xwe de.Di serê xwe de diçû û ji xwe dûr diket.Pir dihizirî.Ew di serê wî de pir hizir hebûn.Wî demên xwe yên li Cizîre bota tenê bi xwandin û nivîsandinê buhurandi bûn.Bi vê yekê re derketibû pêş.Mihamed ji aqlê xwe ve ne biçûk.Ew ji her weha alimek bû.Di nav aliman de êdî navê dihata ser ziman û hasibandin.Her weha ew mazin bû û bi nav û deng bû.Nahaka vêce di rê de bû û ji herêmekê diçû herêmeka din.Wê li wir çi serketibena pêşiya wî û dîtibena ji, ku çû wir hingê wê kifş bûbena.

Di serê xwe de li ser vê yekê hizir dikir.Li ser vê yekê ji di serê xwe de diçû.Pir di serê xwe de diçû.Li ser wan herêman pir tişt û vegotin his kiribûn.Pir tişt hatibûbûne guhên wî di wê heyeme de.Ew ji tiştên ku his kiribûn di serê wî de bûn.Ew ji wî di serê xwe de dibirin û dianîn.Li ser wan yên di serê xwe de dihizirî û kur diçû.

Di serê xwe de ne tenê li ser vê yekê diizirî, bihizir bû.Ji xaynî wê yekê ji li ser demên xwe yên ku li Cizîre bota ma bû dihizirî.Faqa Qasim û mele Silêman yên ku herî zêde di aqlê wî de bûn.Bi wan re demeke dirêj mabû.Bi hev re bûbû bûn weke malbateke.Her weha nêzîkî hevdû bûn.Hertimî li hevdû dirûniştin û diaxiftin û do dan û di standin.Bi vê yekê re di nava wan de wan pir dem bûhûrandi bû.Li ser hizrên mazin û zanistên

demê pir di nav xwe de dan û standin kiribûn.Pir hizir ji hevdû standi bûn.Mihamed, piştî ku hatibû Cizîre bota, her weha bi rewşekê re jiyana xwe bi zanistî û bi zanistên mazin re berdewam kiribû.Li ser hizir û zanistên demê û yên demên bûhûrîn ji xwedî hizir bû.

Bi vê yekê re Mihamed pêşketineke mazin jîn kiribû.Bi vê yekê re êdî ji wir qut bûn êdî pir di serê wî de mabû.Dema ku ji wir bi rê ketibû, êdî pir ketibû hizran de.Ew demên ku bûhûrandi bûn ji di serê xwe de biribûn û anîbûn.Bi vê yekê re ji hin hizir û bi bîranîn ji pêre çêbû bûn.Dema ku ketibû bûne rê de êdî berî hingî bi mele Serhngê Zaxoyî re dan û standinek kiribû.Li ser wê herêma ku wê çûbane de dan û standin di nava wan de bû bû.Piştre li ser Cizîre bota ji hin dan û standin di nava wan de çêbû bûn.Mihamed ji dema ku her weha li ser Cizîre bota axiftibûn, pir tişt ji wî re anî bû ser ziman.Piştre ku ketibû bûne rê de ji Mihamed ketibû hizran de di serê xwe de.Li ser Cizîre bota û wan demên ku bûhûrandi bûn.Li ser dema ku mîr jê xazîne xwestibû ji pir dihizirî.Pir hizir dikir.Ew ji dem pir li ber çavan wî bû.Pir di serê xwe de li ser wê de demê diçû û dihat.Ew dem demeke ku mîr gotibûyê de ya tê xazîne ji min re bi bîne yan ji tê serê xwe bide min.Her weha mîr xazîne jê xwestibû.Mihamed li ser vê yekê dihizirî.Ya rastî pir mirov li ser wê yekê dihizirîn.Piştî wê re rewşê re ji, ew rewş hertimî di nav xalkê de dihata ser ziman.Pir li ser dan û standin di nav xwe de dikirin.Ji ber ku hingî, pir di nav xalkê de wê rewşê deng veda bû.Bi wê deng vedabûne re navî Mihamed derketibû. Mihamed pê hêhtir hatibû naskirin.Piştre ku xazîne hata dîtin ji, êdî piştre bêhtir navê mihamed derketibû.Mirovan di nav xwe de di got ku´ew mirovekî ku pir mazina.Bi vê yekê ve girêdayî ji di gotin ku ew di serê xwe de bi hzire xwe re ´wî xwe gahandiya rastteqîniya hizrê´.Ev gotin her weha dihata gotin.Dema ku dihata û mirovan his ji dikir, êdî piştre jê re rêzeke mazin çêdibû.

Dema ku ji bo mirovekî hata gotin ku wî xwe gahandiya rastteqîniye hizrê, hingî, êdî ew di hizir de´pîr´ têt hasibandin.Di vir de bêja pîrbûne di wateyeke hizrî de dihata ser ziman.Di wateyeke di hizir de pêşketinê dihata ser ziman. Di wateya têgihiştineke mazin de dihata ser ziman.Ku mirov di serê xwe de xwe gahandi bena têgihiştineke mazin û û her weha bûbena zanist û weke zansitekî bihatana hasibandin, weke pîrekî ji lê dihata meyîzendin.Weke pîrekî dihata dîtin.Jê re dihatin gotin pîr ji.Bi vê yekê re divêt ku mirov bêje ku hizreke mazin ku mirovekî di xwe de damazirandi bena, hingî, jê re her weha dihata gotin.

Bêja pîrîtiyê, bêjeyek ku bi pîr wate bû.Di wê demê de her weha dihata ser ziman.Ji ber ku rêzeke mazin li hemberê wan mirovan hebû, êdî ew mirovên ku di xwandin û dixwandine xwe bi pêş diketin ji weke mirovne pîr dihatina dîtin an ji hasibandin.Bi vê yekê re divêt ku mirov bêne ser ziman.Di nav xalkê de hin gotin ji di wê nuqtê de hebûn.Hin gotinên ku ji bo mirovên xwandavan dihatina gotin bûn.Ku mirovne xwandavan diçûne nav xalkê de di axiftin û ku axiftineke bi pir bi aqil dikirin, êdî di gotin ku ´ew pir bi aqil axift û weke pîrekî axift´. Her weha ji bû wan dihata gotin.Bi vê yekê re bêja pîrîtîye dibû xwediyê hin wateyên din ji di wate xwe de.Bi wate xwe re hin wateyên din ji tani ser ziman.

Di nav xalkê de, dema ku mirov bahsa mirovekî pîr bike, divêt ku mirov bi rêz bahs bike.Ji ber ku di nav xalkê de hertimî wilo bû.Bê hûrmetîyek ku li ber wan çêdibû ji ku ji kê ji bena, mirovên di nav xalkê de ew bûhûrmetî weke ku li hemberê xwe di dîtin.Weke ku hemûkan ew bêhûrmetî li heberê xwe di dît.Mirovên pîr, ku mirov bahsa wan kir, mirov bahsa çend tiştne ji dike.Mirov bahsa zanistê dike.Mirov bahsa hin mirovên zanist dike.Mirov bahsa hin mirovên ku di serê xwe xwediyê pir hizrî ne dike.Bi vê yekê re mirov bahsa hin mirovên ku bi wê têgihiştine di serê xwe de ya ku pir mazin re bûne yek dike.Her weha dihata dîtin.Bi vê yekê re bi wan mirovên pîr re çandake dîrokî û hin kevne şopîyên pir kevn û dîrok dirêj têne ser ziman û bahsa wan dike.

Mihamed ji, pir deman ku diaxift, di axiftine xwe de weke mirovekî pîr dihata hasibandin. Pir bahsa wî û hizre dihata kirin.Piştî demeke li Cizîre bota re, êdî her weha mazin bûbû.Piştî demeke re êdî bi aqilê wî re ew derketibû pêş.Dema ku di nav xalkê de diaxift ji, pir hizreke mazin ku diaxift dianî ser ziman.Bi vê yekê re her weha mazin bû.Navê wî mazin bû.Cerna ku li Muazgefte Nebi Nuh mêj dikirin, ku ew ji li wir bena, hingî ku faqa Qasim mêj xilas dikir êdî mafê axiftinê dida wî û wî dide axiftin.Dema ku wî dide axiftin, ku ew ji diaxivî ji pir mazin diaxift.Dikir ku mirovên li dore wî tenê lê bihisênin.Bi vê yekê re ew mazin bû.Navê wî mazin bû.Piştre her weha wan rewşan berdewam kir.Piştre ku mêj bidawî dibû, ku ew dihatina medrese êdî pir mirovan didana dore wî û dihatina wir.Li wir li civate hevdû di rûniştin.Li wir dema ku dirûnişt ji, faqihên ku li wir ji li wan dibûne kom.Bi vê yekê re dibûne pir mirov di wê heyeme de.Dema ku her weha civate xwe li dar dixistin, êdî Mihamed di nav wan de diaxift û dirêj ji diaxift.Civatên medrese yê bi vî awayî ne weke civatên ku li qasre li nig mîr li dar diketin bûn.Ev civat, tenê civatên faqa û sofî û mirovên zanist bûn.Wan di nav xwe de tenê hizir û dîrokî

diaxift.Tenê hizir û dîrok dianî ser ziman.Mihamed, pir dixwand.Ji ber vê yekê ji ew di serê xwe de pir kur bû.Pir bihizir bû.Dema ku diaxift ji pir dianî ser ziman.Faqa Qasim ji her weha mirovekî ku mazin û bi zane bû.Dema ku ew ji diaxift, mirovên li dore wî ji pir lê şaq diman.Dema ku mêj dikirin û dikirin ku werine medrese û ku dihatin ji pir caran faqa Qasim û Mihamed di rax hevdû bûn.Mele Silêman ji bi wan re bû. Ilmdar ji bi wan re bû.Ku dihatina medrese êdî li wir ´civate zanistan´ li dar dixistin.Ji wê civatê re civate zanistan dihata gotin, Cerna ji ´civate faqayan´ji dihata gotin.Ew mirovên ku dixwandin û didanan xwandin i hevdû digahana hevdû diaxiftin.Zanebûnên xwe ji hev re di anînine ser ziman.Bi vê yekê re hizrên xwe bi hev re hevpar dikirin.Ew mirovne ku xwedî hizir bûn.Mirovne ku zane bûn.Ji ber ku hertimî dixwandin.Li medrese ji pir derfet ji wan re hebû.Mîr bixwe ji pir cerna dihata wir û li wê civate faqayan dirûnişt û li wan dihisand û bi wan re diketa nîqaşan de.Lê hertimî bi wan re mirovên sofî û navserî xwe di wê civatê de amede bûn.Hertimî li nig wan bûn.

Mihamed, dema ku di rê de diçû ev rewş hemû di bîre wî de bûn.Di serê xwe de li ser wan hizir dikir.Di wê demê de, dema ku ew dihizirî gelek tişt dihatina bîre wî...

**Beş** 3

Mihamed, mele Serhengê Zaxoyî û mirovên ku bi wan re ne, ku weke demeke dirêj di rê de diçin êdî digihine zaxo yê.Dema ku digihine zaxoyê, hingî mihamed dibîne ku wa pir mirov wê di çin û tên.Dema ku ew ew ketine nav wan de êdî ew ji di nav wan de di nav navende de meşîn û çûn.Karwana mihamed û mele Serhengê Zaxoyî, dema ku ketibû hundirê Zaxo de, hingî, di hundurû de bidest meşandinê kiribû.Lê mele Serhengê Zaxoyî li wir dihata nas kirin.Dema ku ew ketibû hundir de û di hundirê navende de bidest meşandinê kiribû, êdî mirovan ji ew farq kiribû û pêre kiribûn ku bi meşîn.Mihamed, dema ku ketibû hundir de tenê çavên li hevirdore digerend.Li hevdordore dimeyîzend.Bi meyîzendinê re mihamed, pir tişt di dîtin.Pir tişt bi ber çavên wî diketin.

Dema ku di serî de ketibûbûne hundir de, hingî di serî de Mihamed dema ku meyîzendin bû, hingî, pêşî çavên wî bi wê ava mazin ku di nava navende de diharikî û di ket.Avake mazin bû.Pir bilind ji bû.Lî dore ava mal hatibûbûne ava kirin.Lê ji dûr ve ji bena, qasre mîr dihata xuyakirin.Qasr li ber ave hatibû çêkirin.Pêşîya qasre li ave bû.Mihamed ji dema ku ew rewş dît, êdî pir bi hey lê meyîzend.Rewşeke pêşketî bû ku mihamed di dît.

Dema ku hinekî di meşîn, êdî piştre karwane wan tê deham ave ku jê re di gotin *Nahit* û ku jê wir de ji jê re di gotin *Qşlê*.Dema ku gahana wanderan, êdî mihamed li herêmê meyîzend.Bi ber çiyê ve ji meyîzend.hevirdor pir şîn dihata ber çavan û xuyakirin.Lê li hevirdore ji hin çiyayên ku ku bilind dibûn hebûn.Li dore wan ji heya ku diçû banî dar û şînî bûn.Weke ku navend di nav çar çîyayan de bimene û li ber wan çiyayan ji hin çiyayên biçûk hebin dihata xuyakirin.Wê rewşê, rewşeke pir xweşik dide berçavan.Dema ku karwan gahabû dehma ave, li wir pêşî mihamed hinekî li ave meyîzend.Av ku diçû ber navende de û ku hinekî ji navende derdiket ji fireh dibû.Li ber navende bifireh dibû û di harikînê de bihêz dibû.Dema ku mirov diçû ber wê herêma ku av lê fireh dibû, an ji ku mirov digaha nêzîkî wir, dengê ave pir bilind dihat.Xuraxureke mazin ji nava wê dihat.Ku ew xuraxur dihata mirov ji, hema ku mirov dixwest ku di cihê xwe de bi sekinê û tenê li wê xuraxurê bihisêne.Li mirov xweş dihat.Ku mirov nêzîkî ave ji dibû, hinkayîyeke ji dûr ji bena mirov digirt.Dema ku hîkayîyê mirov digirt, hingî, tenê mirov dixwest ku mirov xwe li bayê wê hîkayîyê berdê. Mirov ev yek di dilê xwe de ji xwe dixwest di wê heyeme de.

Mihamed û mele Serhengê Zaxoyî dema ku ketibûbûne nava navende de êdî hin mirovên ku mirov li wan dimeyîzend, mirov karîbû ku bêje ku sofî ne, bi ber wan ve hatin û bidest bi wan re meşandinê kirin.Dema ku hin mirov li hevdû her weha li wan gahana hevdû, êdî piştre ne bi gelekî re ew ji hasp paya bû û bi mirovên li dore wan bûne kom re meşî.Mihamed ji xwe di rê de axlabe paya meşî bû.Di rê de li hin derne hinekî ku wastaha bû sûwar bûbû.Lê belê axlabe ji wî rê bi paya qad kiribû.Mihamed, pir hij meşandinê dikir.Pir ku dimeşî dilê wî xweş dibû.Ku dimeşî di serê xwe de dikeve hizran de.Bi wê rewşa xwe de hem hizir dike û dimeşê di riya xwe de û hem ji lez dike û di riya xwe de diçê.Her weha di rewşeke de dimene.Lê ku dikeve riyan de weke ku xwe winda ji bike lê têt.Bi hizirkirinên di serê xwe de di riya xwe de dimeşê.Di wê rewşê de êdî ew ji nizanê ku di rê de çawa û di çi lezê de dimeşê û diçê.Xwe weke ku ji bîr dike.Her weha lê têt.Di wê heyema ku di rê de bûn de ji wilo bû.Di serê xwe de çûbû dûr.Pir bi hizir bû û dimeşî.Her gava ku di rê de diavêt, te di qot ku qey wî gavekê di nav hizran de ji dibe.Her weha lê têt.Mihamed, bi vê yekê re pir rê ji qad kiribû, lê belê nizani bû ku rê çawa qad kirîya.Her weha lê dihat.Dibêt ku di kijan riyê de çûbûn û di rê de di kuderan de çûbûn ji  farq ne kiribû.Ku mirov di serê xwe de xwe di nav hizir û ramanan de winda kir, wilo li mirov têt.Wilo mirov xwe hîs dikêt.

Mihamed, piştî ku bi karwane hatibûn û hatibû bûne nêzîkî zaxo yê êdî farq kiribû li kudere ne.Mele Serhengê Zaxoyî ji ev rewş pêre kifş kiribû.Kifş kiribû ku Mihamed di serê xwe de çûbû bû.Lê mele Serhengê Zaxoyî, weke ku ne xweze ku wê hizirkirinê wî xira neke li xwe anî bû û zêde wilo pêre ne ketibû axiftinê de ji di rê de.Mihamed û ew, piştî ku têne nêzîkî Zaxo weke ku werê xwe lê hatibû.Her weha lê hatibû.Dema ku nêzîkî zaxo bû bûn, êdî di rê de hin bi hin ji dûr ve ji bena mirov di dîtin.Lê ji ber ku hevirdor pir bi dar dar bû û gulistan bû, zêde wilo mirov xwestibena ji wê dûr ne dîtibena.Wan ji dema ku hatibûbûne nêzîkî hevirdore, hin dengên mirovan his kiribûn.Hinekan deng dikire hevdû.Her weha ew deng kirine wan ya hevdû, wan his dikir.Dema ku wan his dikir, êdî fahm dikirin ku li ber navende ne.Mele Serhengê Zaxoyî bixwe ji ewder nas dikirin.Ji ber vê yekê ji, çend ku wan ji wilo fahm dikir, wî ji ji wan re di got ku ewder hevirdore zaxo ya.Hevirdore wê pir şîn bû.Pir xweşik bû.Pir darên mazin û bilind hebûn.Hin darin li ber çavan diketin, ku mirov li wan dimeyîzend, mirov di got ku qey mirov dikare di qurmê wan de malekê çêbike.Her weha wilo stûr bûn.Pir stûr li ber çavan diketin.

Dema ku li wan daran dihata meyîzendin ji, pir baş û qanc dihata têgihiştin ku ew dar pir kevn in. Zûve ne. Her weha dihatina ber çavan û xuyakirin.Pir bilind ji bûn.Dema ku karwane wan berî ku bikeve navende de ku di nav daran de hinekî meşî bû, hingî, mihamed weke ku werê xwe lê hatibû.Dema ku wilo lê hatibû û li hevirdore xwe ji dimeyîzend ji di dît ku ew dar çend mazin û stûr û bilindin.Gelek dar di nav hevdû de bûn.Darên paruyan, darên behîvan, darên tuyan, darên taawan, darên guzan, darên hajîran, darên şînvarokan û hwd.Pir dar hebûn. Dema ku gahabûbûn ber navende hin dêlîyên tirh ku mirovan ji xwe re çandibûn ji hebûn, dihatina dîtin.Ku mirov nêzîkî wan dêlîyan ji dibû, di dît ku tirhê ku pêve hê hasima.Hê zêde ne gaha bû.Ku tirh hê hasim bû, pir miz dibe.Hingî miz dibe, mirov dikarê deve xwe de zêde bidiyê de.Lê ku ne zêde ji bihatana xuyakiirn ji, hin darên sêvan û portaqanan û tiştên wilo ji hebûn û bi ber çavên mirovan diketin.Lê darên tuyan, behîvan û baruyan pir hebûn.Pir dihatina xuyakirin.Hin darên çilo ji hebûn.Lê ew ne li ber navende wanderan bûn.Ew hê dûrtir bûn ji navende.Divîbû ku di nav daristanê de mirov hinekî çûbena haya mirov xwe gahandi bena darên çilo.Mirovên ku diçûn darên çilo ji gelek bûn.Ji bo şawatê mirovan diçûn û dianîn. Ji bo ku tanur pê bêne qamirandin dianîn.Li wê herêmê, weke herêma Cizîre bota tanurên wê bi nav û deng bûn..

Herêm ji ber ku avî bû, êdî tiştên avî ji pir çîn dibûn.Li pir herêman tiştên avî zêde şîn nabin.Li herêma Zaxo ji weke herêma Cizîre bota, ku li ber çemê Diclê çawa ku tiştên avî zêde çêdibin, li wir ji her weha wilo çêdibû, dihata xuyakirin.

Mele Serhengê zaxoyî, di wê heyeemde ew bixwe di civatê li dore xwe de di nîqaşaka mazin de bû.Lê belê ev rewşa mihamed ya hizirkirinê ji ji bala wî ne diravî di wê heyeem de. Bala wî di nav nîqaşana de li ser wî ji bû.Mihamed weke ku li xwe bû û ne li xwe bû di wê heyeme de.Her weha di hata xuyakirin.Her weha berçavan.Mihamed, li cem wî seyde avdirehîmê xaniqî rûniştî bû.Bala seyde Avdilrehîmê xaniqî ji li ser wî bû di wê heyeme de. Lê bala mele Serhengê zaxoyî bêhtir li ser wî bû.Ya rastî ku mirov bêje, ev bala mele Serhengê zaxoyî, dikir ku bêhit bala seyde

Avdirehîmê xaniqî herê ser wî dê wê heyeme de. Ji ber ku bal hemû li ser wî bûn, di axiftinan de.Vêce ku bala wî ji diçû ser mihamed, êdî bala mirovên li wir hema bêja gelekan ji wan ji diçû ser mihamed.Bi vê yekê re mirov karê bêje ku mihamed di bin balan de bû.Lê ma ka, mihamed heya wî ji vênakê hebû?Ew mirovekî di serê xwe de di hizran de bû.Di serê xwe de ketibû hizren de.Ku di wê rewşê hin tişt û gotin hatibûna guhê wî ji, dibêt ku heya wî ne li vê yekê bû.Wî ev yaka baş farq ne kiribû.Lê di wê heyeme de di nav nîqaşana de weke k heya wî li wir ji bû, car bi car li xwe dianî.Her weha wî li xwe dianî.Mele Serhengê zaxoyî ew li xwe anîbûna wî ji kifş dikir.Lê mele Serhengê zaxoyî ti tiştek ne di got.Ti tiştek ne dianî ber çavan.Weke ku bihesteke ku bixweze ku mihamed bi paraze tevdigerehe di wê heyeme de.Wî hij mihamed dikir.Di wê dema ku li cizîre bota mabûn de, wî ew nas kiribû û bi wê nas kirinê re ji, pir xwûna wî li wî germ bû bû.Bi vê yekê re pir hijê ji kiribû.Mihamed ji ew nas kiribû û xwûna wî ji li wî herm bû bû.Bi vê yekê re êdî nêzîkî hevdû bû bûn.Mihamed b´pir bi zane bû.Dema ku diaxift pir hizir bi vegotinên xwe re dianî ser ziman.Vê yekê ji, balaka mazin dikişanda ser wî ji mirovan.Bala mele Serhengê zaxoyî ji bi vê yekê re pir mazin çûbû bû ser wî di wê heyeme de.

Nîqaş, her ku têve diçûn, êdî bêhtir mazin diçûn û di nîqaşê de bal dihata mirovên zane. Mele Serhengê zaxoyî û seyde Avdilrehîmê xaniqî û mele Silhatinê kal û hinekî ew ji axifti bû bûn, êdî piştre weke ku bal bi hinekî axiftina mîr û piştre hatibû ser mihamed ji.Ew ji balên ku weke ku jê bixwezin ku biaxivê hatibûbûna ser wî di wê heyeme de.

Ku her weha nîqaşan weke demek berdewam kiribû bi mirovên zane re ji, êdî piştre di nav nîqaşan de bala htibû ser Mihamed.Mihamed axiftibû.Lê belê bal dise hatibûbûna ser wî di wê heyeme de.Ew mirovekî zane bû.Di wê dema ku axiftibû de, bi wê yekê re pir bal çûbû bûna ser wî.Lê Mihamed, piştî axiftina xwe bidawî kiribû hinekî mabû sekinî.

Dem ji dihata ber dereng bûnê.Êdî mirovên ku li wir li civatê wê rabûbûnan ser xwe ji civatê..Her weha êdî weke ku mirovên ku li wir bûn kara xwe dikirin.Mele Serhengê zaxoyî û Seyde Avdilrehîmê xaniqî ji, piştî wê dama ku di nav nîqaşan de pêde çûbûn piştre êdî mabû bûn sekinî.Her weha ev ji êdî sekinî bûn.Yên ku di axiftin êdî ne gelek bûn.Lê yên ku di axiftin, êdî ne zêde her weha mirovên zanist bûn.Yên ku di gotin, di wê heyeme de li pêş ji bûn, bi zargotina xwe re dengbêj bûn.Bi wê dengê xwe yê xweş ketibûbûna nav de û dilê mirovan di halandin.Pir xweş di

gotin.Bi wan re hinek mirov, car bi car di ketine axiftinê de.Ji wan pêve, wilo zêde ti axiftin ne dibû.

Mihamed ji mabû sekinî.Di hizir de bû.Di serê xwe de çûbû bû.Ka di wê heyeme de çi di hizirî di serê xwe de.Ew di serê xwe de çûbû bû.Dibêt ku hê li wan hizrên xwe yên berê bû.Hê li Cizîre bota wan deran bû.Hê di wan demên xwe de bû.Ew demên wî, demne pir girîng bûn. Ji bo pêşketine û weke zanistekî mazin were naskirin, ew demên wî pir girîng bûn.Di wan deman de pir derketibû pêş.Pir navê wî hatibû bihîstin.Navê ji sînorê xwe derbas kiribû.Di wê de, çend ku ew i Cizîre bota ji bû, navê wî ji sînorî cizîre bota derbas kiribû.

Li Kurdistanê, di nav zanistan de navê dihata bihîstin.Ew ji êdî mirovekî ku pir mazin bû.Li Cizîre bota bi vê yekê re mazin bû.Vêce nahaka ew ne li Cizîre bota bû.Ew, jê derketibû.Nahaka dervî Cizîre bota bû.Li Zaxo bû.Li herême başûrê kurdistanê ku jê re ji wê herêmê re di gotin ´Badinan´, li wir bû.Herêma bandînan, ne tenê zaxo, ji xaynî wê ji, Duhok, Erbil, Xanaqin û hê gelek herêmên din ji di kire nava xwe de.Di wê demê de, herême Musilê ji bi serê xwe bû.Ew herêm, mîrê wê, bihêz bû.Artişaka wî ji hebû.Weke herêmên wê herêmê yên weke Hewlêr û Kerkukê bi nav û deng bû.Mazin bû.

De ne, divêt ku mirov di vir de careke din bêne ser ziman.Hewlêr di wê demê de, ji wê herême başûre kurdistanê ku kerkuk û Musil ji di nav de û ku zaxo û Erbil û Dohuk ji di nav de, ji wan re navendîtî ji dikir.Her weha di wê de li pêş bû.Ji dema Mîr Zengî û vir ve ji pir bi vê yekê re derketibû pêş di herêmê de.Dema Mîr Zengî, di wê demê de, divêt ku mirov li Kurdistanê, bi xosisî ji li wê herêmê kurdistanê, weke demeke zêr binavkê.Ji ber ku di rastiyê de ji wilo bû.Pir pêşketî bû.Mîr Zengî, Xwediyê pirtûkxaneyeke ku di gotin nêzîkî sadhezar pirtûkî têde bû bû. Salahattinê Eyûbî ê kurê Yûsif, di wê pirtûkxaneyê de xwandiya.Di wir de wî zanebûna xwe mazin kiriya.Bi vê yekê re divêt ku mirov navê Mîr Zengî, mazin û bi rêz bêne ser ziman. Di dema Salattinê Eyûbî de li kurdistanê bû.Li herême başûr bû.Hewlêr ji weke navende wî bû. Ew herêm di deme wî de pir mazin d aramîyekê de bû.Salattinê Eyûbî, weke mirovê kurd li wir li kurdistanê çend mazin bû û bi nav û deng bû, her weha divêt ku mirov Mîr Zengî ji wê mazin bûnê kêmtir mazin neyêne ser ziman.

Dema ku li wir di civate xwe de axiftibûn û Mîr Birehîm ku bidest axiftinê kiribû, wî hinekî ji wan û mazinatiya wan ji anîbû ser ziman.Mîr Birehîm hinekî bahsa wan kiribû.Dema ku wî bahsa wan kiribû ji pir li ser mazinatiya wan kiribû.Bahsa zanebûne wan û qancîtiya wan kiribû.Bahsa

hizre di serê wan de kiribû.Dema ku bahsa Mîr Zengî dikir û di got ku ew xwediyê pirtûxaneyeke her weha mazina, hingî, singa wî weke ku bi warimê lê dihat.Her weha mazin dibe.Her weha ji xwe êmin bawerîyek di anî ser ziman, bi xwe re.Mîr Birêhim, mîrekî wê herêmê bû.Navê wî ji hebû.Wî ji pir xwandi bû.Li qasre wî ji pirtûkxaneyeka mazin bû.Navê wî ji gele caran bi wî pirtûkxaneyê dihata ser ziman.Lê bêguman, ku navê wî dihata ser ziman, ne weke ya mîre hewlêr ku di qasra xwe de pirtûkxane mazin ku di herêmê de bi nav û deng bû ava kiribû, hebû.Navê wî pir mazin bû.Wî ji weke ku çav li mîre bota kiribû.Mîre bota di qasre xwe pirtûxaneyeke mazin ku ji gelek deman ji pirtûkên zanist û aliman ji têde bû hebû.Dema ku mirov bahsa pirtûkxaneya ku li qasre mîre bota bike, divêt ku mirov bêje ku pirtûkxaneya li qasre mîra bota, navê wê ji weke navê mîre bota ji sînorên herême xwe derbas kiribû.Rêzeke wê ji hebû.Pir dihata ser ziman.

Mihamed pir têde mabû.Têde xwandibû.Bi faqa Qasim re pir demên de têde derbas kiribûn. Ew pirtûxane mîr ya li cizîre bota ji, rengek ji rengê cizîre bota bû.Rastiyeke wê dianî ser ziman, bi xwe re.

Ku mirov li kurdistanê bahsa mîran bike, divêt ku mirov ji bîr neke û bêne ser ziman ku ew mirovne ku mazin bûn.Zanebûne wan hebû.Kevneşopîyeke wan ya ku bi çend hezar sal hebû.Bi vê yekê re wan ji di qasrên xwe de û bi xwe re hin kevneşopîyên mazin çêkiribûn, bi xwe re.Bi vê yekê re ji di hatina ser ziman û nas kirin.Mîre bota di nav waqas sal û kevneşopîyên mîrîtîyê li kurdistanê, ew xwediyê taca kurdistanê bû.Bi vê yekê re navê wî hebû.Do serê mirovan de her weha ji ew hebû.Di nav xalkê de ji her weha ew hebû.Her weha navê wî hebû.Bi vê yekê re mazin bû.Rêze wî hebû.

Pir rêxdayîneke mazin ya li wan hebû.Mirov nikarê wê rêze li wan, tenê bi hinek nêzîkatên demê re bêne ser ziman.Ji ber ku wê têrê neke.Divêt ku mirov dîrokekê mazin şîrove bike û bêne ser ziman.Pêre ji, divêt ku mirov dîrokeke zanstîtîyê şîrove bike û bêne ser ziman.Bi zanebûnê re weke li Cizîre bota teolojîyek çêbû bû, û mîre bota ji para xwe ji wê digirt û bi wî re ji mîrîtyê para xwe jê digirt.Her weha mazin bû.Mîrîtî, bi vê yekê re xwediyê dîrokeke ku ne tenê bi serê xwe re werê ser zimana.Pêre ji, xwedîyê dîrokeke ku pêre hizir û dîroke hizir werê ser zimana.Bivê yekê re divêt ku mîrîtî baş û qanc werê ser ziman.

Bi vê yekê re dema ku mirov bahsa mîrîtîyê kir û mirov bahsa Cizîre bota kir û pêre ji bahsa başûrê kurdistanê kir û mirov bahsa mîrîtîya li herêmê başûrê kurdistanê kir, mirov dibîne ku her yekê bi serê xwe

xwediyê hin xosletên teybetin ji.Ew xosletên wan, ji dîroke wan tên.Li herême başûrê kurdistanê ku mirov rojhilatê kurdistanê ji bixe nav de û şîrove bike, mirov wê bibîne ku çend xwediyê dîrokeke mazina.Ev dîroke ku me got mazina, me ji aliyê pêşketin û sazmendîye wî ve got.Ji dema Medan ve ku mirov bidest şîrove bike, mirov dibîne ku pergaleka mazin ku pêşketî heya.Kurdên êzîdî, piştî têkçûna Medan ya li hevberê pêşketine rêvebere Persen ji, ew pergal bi hebûnên xwe re û hizrên xwe re li ser lingan hiştin.Di wê demê de pirtûkxaneyên qasre mîrên Musilê, Hewlêr, Zaxo, Şengal, Kerkuk û hê gelek deverên din, tişî pirtûkên ji wê demê bûn.Wan pirtûkan çand û hizir bi gelek awayan bi pêş dixist.Bi vê yekê re divêt ku mirov bêje ku kurdên êzîdî ji dîrokê ji bo xwe rûmeteke mazin heq(maf) dikin.

Li kurdistanê, her weha dema ku mirov li dîrokê dimeyîzenê, bi xosisî ku mirov li demên piştî Medan di meyîzenê, mirov dibîne ku wan hizir û çandaka mazin parast û gahanda demên piştre.Bi vê yekê re, ku mirov ji bo wan bêje, wan tenê parastitîya dîrokeke mazin a mirovahîyê li kurdistanê kir, wê ne gotineke mazin bê..Wê gotineke rast bê.

Dema ku mirov di wê demê de, li herême bakûr û pêre ji li bixosisî li botanê û bigiştî li başûr û rojhilatê kurdistanê dimeyîzend, mirov vê yekê baş û qanc di dît.Li wan herêman çandaka mazin ku pêşketî hebû.

Li başûrê kurdistanê, di wê demê de, her weha ev yeka dema ku mirov diçûyê de baş û qanc didît.Mihamed ji dema ku çûbû wir, ev yeka li wir baş û qanc di demeke kin de dîtibû û fahm kiribû û têgihiştbû.Mihamed, di wê demê de di civatê de ji, dema ku dihata nîqaşkirin, di nav gotinên ku ji bo dîroke herêmê û zanebûne herêmê de dihatina ser ziman de, ew ji hebû û dihata ser ziman û wî ji baş û qanc didît.Pir baş û qanc fahm dikir.Pir baş û qanc têdigihişt. Bi vê yekê re di demeke kin de di wê heyeme de di civatê de di serê xwe de gahabû hizreke mazin, di derbarê wê herêmê û hizre wê ya ku heya û têgihiştine wê ya ku heya û zanist û dîroke wê de.Bi vê yekê re mirov karê bêje ku ew di wê heyeme de di civate li qasre mîr Birehîm de di niqaşan de gahabû hizreke mazin.Hê civate wan ji hevdû belav ne bûbû.Hê ji nîqaş dikirin.Lê dema wan hatibû ber derengîyê ku ji hevdû belav bibin.

Dem hatibû ber derengîyê ku ji hev belav bibin.Wê mirov çûban malên xwe.Lê haya ku her weha civat li dar ji bana û li hevdû rûniştin ji hebene, wê her weha li hevdû rûniştin hebene.Xosisî ji, haya ku mele Serhengê zaxoyî ne dabana xwe, wê ti kesekî ne dabana xwe dê heyeme de.Mîr ji wê li bendî wan bana.Mîr ji wî ti tiştek ne gotibana ji bo rabûnê..Her ku yê

mazin yek ji wan ew ji bana, û her timî ku wî ji rewşên wilo re pêşengîtî dikir ji, dise di wê rewşê wê ne daban pêşiya mele serhengê Zaxoyî an ji Mihamed.

Mele Serhengê Zaxoyê çawa ku hatibû wir, di cih de mîr hatibû nig wî, pêşîya wî û ew biribû qasre xwe û li qasrê bi gelek mirovên li dore xwe re li hvdû rûniştibû bûn.Piştre ku rûniştibûbûn, êdî piştre ji, careke rabûbûn û çûbûn û mêj kiribûn û piştre careke din hatibûn û li hevdû li civate hevdû rûniştibûbûn.Piştre xwarin ji bi hev re xwaribûn.Nahaka vêce nîqaş dikirin.Di wan demên dawiyê yên civatê de mirovên dengbêj ketibûbûna devre de.Wan di got û dilê mirovên li civatê xweş dikirin.Wan bi wê dengê xwe yê ku pir xweş dilê mirovan xweş dikir.Bi dengê xwe re , di dilê mirov de zîzkirin çêdikirin.

Nahaka vêce civat hatibû ber dawiyê.Wê ji hevdû belav bûbana.Lê belê di wê heyeme de, hingî, civateke ku pir xweş û mazin û bi zane li dar xistibûn, êdî weke ku dilê wan ranadigirt kuu wê civatê jev belav bikin.Her weha di rewşekê de di çûn û dihatin.Lê wê jev belav bûbana.Wêmirovên ku çûbana mala xwe, wê çûban mala xwe û yên ku mababa ji wê maban. Wê mele Serhengê zaxoyî ji wê çûbana medrese..Wê çûbana dergaha xwe.Her weha ew ji divêt ku çûbana.Ji ber ku hê ji dema ku hatibû ve neçû bû.Vêce divîbû ku çûbûbana.

Di nav xalkê de her weha weke kevneşopîyeke bû ku dema ku mirovek ji riyekê hat, an ji bi nêhta ku herê malekê mêhvandarîyê, êdî piştre ku çû, divêt ku çûbana wê mala ku di serê xwe de kifş kiribû ku wê çûbana.Dema ku hat ji, divîbû ku pêşîke çûbana mala xwe, û piştre çûbana derên ku wê çûbane de.Her weha pir girîngî ji vê yekê re dihata dayîn.Dema ku mirovekî got ku ezê çima filan herêmê û mala filan kesî bi mêhvandarî û ku kete rê de û çû, û ku dema ku çû û gaha wir û neçê wir pêşî, ne baş dibû.Her weha ev yeka weke ne nêzîkatîyeke rast ji dihata dîtin...Di wê rewşê de weke ku mirov li gotina xwe bê a ji ne li gotina xwe bê dihata şîrove kirin.

Mele Serhengê zaxoyî, piştî ku bi Mihamed re û hinek mirovên din re ji hatibû wir, êdî ne bi gelekî re ew mirovên ku bi wan re ji cizîre bota ku mîr kar kiribûn û bi wan re bi rê xistibûn ji, ku hinekî li wir mabûn û rûniştibûbûn piştre êdî ne bi gelekî re ew ji ketibûbûna riye xwe de û vegerehe bûn.Dema ku ew ji, ji zaxo derketibûbûn, pêşî riye xwe ku bi aliyê cizire bota v kiribûn, pêşî, riye xwe bi rawastgaha pêşî ya ku li ser riya wan bû, xistibûn û çûbûn wir û ji wir çûbûn û vegerehebûn Cizîre bota.Ew rawastgah ji, Silopîya bû.Ew der, cihekî ku di naqabîna Zaxo û

Cizîre bota de dima bû.Her weha rawasgahaka mazin ji bû.Ewder ji, dema ku mirov bahsa wê bike, divêt ku mirov bahsa wêderê ji baş û qanc û mazin bikêt.Ji ber ku ewder ji her weha mazin bû û bi nav û deng bû.Li wir ji medreseyeke mazin hebû û bi nav û deng bû.Pir xwandavan li wir ji dixwandin.Ji ber ku ewder ne dûrî Cizîre bota bû, êdî li wir ji kom bûn çêdibû.Ji wir, xwe gahandina cizîre bota bi lingan, weke çend kêlîkên biçûk bû.Her weha zêde ne dûr bû ji wir.

Cizîre bota, dema ku mirov bahsa wê kir, hertimî ji gelek tişt û hizir têne bîre mirov.Ji aliyê herêmê ji wilo ya.Cizre bota, piştî ku mirov kete hundur de, êdî ji hundur riye hevîrîşîmî ji diçû haya Nisêbînê.Nisêbînê hinekî jê wirde bû.Zêde ji hevdû ne dûr bûn.Ewder ji pir kevn bû.Gelek kelehên hûrrî-mittanîyan yên kevn têde hebûn.Hingî li wir, herême Merînê weke nanedeke bû.Hin şûnpê, ji dema Gutîyan ji têde hebûn.Ewder pir kevn bû.Ji ber ku hevirdore wê pir avî bû, êdî mirovan xwe lê digirt.Bi vê yekê re mirov divêt ku bêje ku pir mazin pêşketî bû.Dîroke xwe de ji navê xwe mazin bi kar anîbû.Berî wan deman, di dema Gutîyan wan de, jê re Nisibîs dihata gotin.Ew nav di dema Nebi Nuh de ji hebû.Hin vegotinên ku bi Nebi Nuh re li herêmê dihatina vegotin, di nav de ev nav ji pir mazin dihata ser ziman.Pir qanc dihata ser ziman.Haya gaha ber Amudê, ew herê hemû pir mazin pêşketi bûbûn.

Di wê xatê re, haya ku mirov diçû hinek bi rojavayê kurdistanê de û xwe digahanda Afrînê, mirov ew pêşketin di dît.Ew ji weke cihekî pêşketî hebû.Navê wê ji di dîrokê de mazin hebû.Hinek kirman ji dema Hurrî-mittanîyan û Guttîyan ji li wir hebûn.Ew qasre wê yên mazin ku pêykelên şêran danîbûbûna deve derîyê wê, pir mazin û bi ihtişam bûn.

Lê herême Zaxo, ji gelek aliyan ve ji xweş bû.Dore wêderê, hema bêja hemû daristan û gulistan bûn.Çemên ku di ber de û di nav de dû buhurtin ji, jiyan li ser lingan zîndî dihiştin. Her weha mirov karê bêne ser ziman.

Dema ku mele Serhengê Zaxoyî û yên ku pêre bûn ku hatibûn, di riye xwe de pir li wan deran ji şaq mabûn.Li wanderan ji li hin deverne bêhne xwe ji berda bûbûn.Piştre riye xwe berdewam kiribûn û hatibûbûn û ketibûbûna hundir de.Hevirdor pir şîn bû.Gelek darên mazin û bilind hebûn.Mirov ji wan daran ji fahm dikir ku ewder kevne.Hin darna ku ku qurmên wan pir stûrbûn bi ber çavan diketin.

Dema ku ew ji hatibûn, ew dar û der, hemû bi ber çavên wan ketibûn.Mele Serhengê zaxoyî ewder, berê hingî ji dîtibûbûn.Ji ber vê yekê ji, ewder jê re ne xarîb bûn.Lê Mihamed û hin mirovên din yên ku bi wan re hatibûn, ne wî bi nas bûn ji wanderan re.Dema ku hatibûbûn û

ketibûbûna herêmê de, Mihamed pir bi bal heya xwe dide hevirdore û li hevirdore di meyîzend.Piştre ku hatibûn û ketibûbûna hundir de ji, heman xweşikatî bi ber çavên wan ketibû.

Piştî ku katibûbûna hundir de, ne bi gelekî re êdî gelek mirovan dore wan girtibû, û li dore wan bûbû bûna kom di wê heyeme de.Piştre ne bi gelekî ji mîr ji hatibû û piştre ew bi xwe re hildabûbûn û li qasrê li hevdû rûniştibûbûn.Qasre Mîr Birehîm pir xweşik bû.Nêzîkî çem bû.Ji aliyê ku mirov li çem dimeyîzend ve, ku mirov dimeyîzend, êdî hin dîmenên pir xweşik bi ber çavên mirov diketin û mirov di dîtin.Ew dîmen ne tenê ji çem û hevirdore wê bûn.Çavên mirov ji wir dûr ji di dît.Çavên mirov bi aliyê daristanê ve ji pir dûr ji di dît.Ku çavê mirov ewder di dît, êdî ji dîtinê bêhne mirov xweş dibû.Haçiyê ku dihata wir û ewder di dît, êdî hewî ku pir heyren dima, pêre ji ji bo mîr di gotin ku pir hij xwe dike.Piştre ji, di gotin ku ancax mîr karê li wir bijî..Her weha ku di dîtin di gotin.

Dema ku hatibûbûna wir, her weha ewder pir xweş dîtibûn.Cihê ku medrese ji lê dima xweş bû.Nêzîkê ber kêş bû.Di ber de ji av di harîki.Li wir dema ku mirov di rûnişt, mirov pir cih di dîtin.Lê hê mirov ewder ne dîtibû.Hê ji dema ku hatibûbûn ve ne çûbû bûna ti derên din ji qasre mîr pêve.

Dem dihata ber dereng bûne, êdî wê rabûbûna û ku mele Serhengê zaxoyî çûbana wir û ew ji wê pêre bana û hingî ji wê wî ewder dîtibana.Wê çavên wî bi wanderan ketibana. Wê hingî dîtibana ku ewder çend xweşa.

Di civatê de êdî wilo zêde axiftin ji nema dibû.Êdî mirovên ku li wir bûn, hemûkan ji fahm dikir ku êdî dema rabûnê ya.Êdî wê wê mirov rabin.Mîr Birehîm ji di wê têgihiştine bû.Lê wî ti gav çend her weha têgihişti bû ji ne avêt.Weke ku li bendî mele Serhengê zaxoyî, seyde Avdirehîmê xaniqî û mihamed wan ma.Ew ji li hevdû rûniştibûbûn.Ew ji vêce weke ku li bendî wî bin, sekinî bûn di cihê xwe de di wê heyeme de.

Wê rewşê, ku her weha weke qadarekê berdewam kir û mele Serhengê zaxoyî j fahm kir ku her kesek li bendî rabûna, êdî wî kir ku gotina pêşî bêje û bi hev re rabin.Ji xwe weke ku mîr ji li bendî wî bû.Mîr, di qasre xwe de ji maf ji wî re hiştibû.Mele Serhengê zaxoyî ji her weha têgihiştibûbû.Mele Serhengê zaxoyî, piştî ku her weha hizirî û hinekî ji ma sekinî, êdî piştre ne bi gelekî re li dore xwe ji meyîzend û piştre berê xwe da mîr û got ku ´êdî dema rabûna me ji hatiya.Em ji divêt ku rabin.Dema ku wî wilo got, êdî hin deng di nav hevdû derketin.Piştre ku wî wilo got êdî mîr ji, ku ji adetê bê axift û got, ´de ne,em li hevdû rûniştina, em hinekî dî li hevdû mabana rûniştî´.Dema ku wî wilo got, êdî mele Serhengê zaxoyî

careke din mafê axiftinê girt û her weha gotineke din got, ji dema ku em hatina ve, min xwe ne gahandiya, medrese, li wir rewş çawa ez wê ji bibînim.Ji xwe, ve hin faqayên me va li vir in.Lê ne hemû.Ka em herin û wan yên din ji bibînin.Dema ku wî wilo got, êdî mîr ji got, ´dê nexwe, destûr te ya, ya we ya´.Piştre ku mîr her weha got û ma sekinî, piştre ne bi gelekî re êdî wan ji da xwe ku rabin û herin.

Piştî ku mîr weha got, êdî piştre mele Serhengê zaxoyî hinekî ma sekinî di cihê xwe de. Çavên mirovên li dore wî ji li ser wî bû.Di wê heyeme deHer kesekî li wî dimeyîzend. Dema ku wî gavak avêtibana, êdî ew ji wê gava din li pey bi avêtina.Her weha kesek sekinî bû. Mihamed ji di rax seyde Avdilrehîmê xaniqî de bû.Ew ji çavên wan li ser wî bû.Dema ku karkir û rabû, êdî ew ji wê pêre rabûban.Her weha sekinî bûn.

Piştre ne bi gelekî re êdî bi dana xwe ya mele Serhengê zaxoyî re êdî ew ji rabûna ser xwe ji cihê xwe.Dema ku ew rabû ser xwe, êdî bi mîr re yên ku li civatê bûn, hemûkan ji pêre dana xwe û rabûna ser xwe di wê heyeme de.Dema ku rabûna ser xwe, êdî Mihamed ji di rax seyde Avdilrehîmê xaniqî re pêre rabû ser xwe di wê heyeme de.Dema ku her weha rabûna ser xwe, êdî mele Serhengê zaxoyî weke ku weke du an ji sê qavzan xwe nêzîkî Mihamed kir. Mihamed, ev yek farq kir.Dema ku farqkir ji, êdî bala wî çû ser mele Serhengê zaxoyî û êdî weke ku bi wî re gavên xwe bi avêje, êdî gavên xwe avêt.

Mihamed, bi wî re hatibû wir.Mêhvanê wî bû.Yê ku herî zêde ji wê pêve mabana ji ew bû.Divîbû ku wilo bana.Mîr ji bala wî çûbûbû ser Mihamed.Demên ku Mihamed di nav civatê de axiftibû, hingî, balaka mazin mihamed kişandi bû ser xwe ji mirovên dore û ji mîr ji.Ji ber vê yekê ji êdî ew ketibû ber çavan de.Ew êdî li ber çavan bû.Dema ku ew rabûna ser xwe ji, ev yek kifş bû.Hingî ji, dema ku rabûna ser xwe, bal li ser hebûn.Herkesekî lê dimeyîzend.Mîr ji lê dimeyîzend.Mîr pir lê dimeyîzend.Weke ku ne dixwest ku avir û heya xwe ji ser wî bi birrê lê dimeyîzend.Ji xwe, ji ser ne di birrî ji.Her weha Mihamed li ber çavan bû.Ku rabûna ser xwe, êdî piştre, ku mele Serhengê zaxoyî li pêşîya wan, bi hev re derketina derve di wê heyeme de.Dema ku derketine dervê, di rê de, Mihamed kete rax mele Serhengê zaxoyî de. Di nav mirovan de ev yek xweza dibû.

Mihamed, dema ku ew û mele Serhnegê zaxoyî hatine dehma hevdû êdî bi hev re meşîn.Lê di wê dema ku hatina dehma hevdû de, hingî, Mihamed û mele Serhengê zaxoyî hatina ber hevdû, bi çav bi çavan.Dema ku her weha hatina ber hevdû, êdî mele Serhnegê zaxoyî bi dilekî xweş, li nav

çavên mihamed meyîzend.Mihamed, dema ku wî wilo meyîzend, êdî wî ji wilo lê meyîzend û hinekî weke ku di dilê xwe de bi ken bibe lê hat.Mele Serhnegê zaxoyî di wê heyeme de ev di xweşiya xwe di dilê mihamed de çêbû, di wê heyeme de fahm kir.Dema ku famkir ji, her weha ew ji heman weke wî bi kêf û dil xweş bû, li ber wî di wê heyeme de.Ew ji bi dil ken bû, bi dil şa bû.

Mîr ji di rax wan de bû û di meşî.Mîr divîbana ku li pêş bana.Lê wî di wê heyeme de xwe nadabû pêş.Wî xwe dabû dehma wan di wê heyeme de.Li dehma wan di meşî.Ew meşîbûbana wî ya weha ji, ji rêze wî ya li hevberê wan dihat.Rêzeke wî ya mazin li hevberê mele Serhengê zaxoyî hebû.Piştî ku mihamed di civate wî de axiftibû û wî ji dîtibû û fahm kiribû ku ew ji çend zane ya, êdî mêla wî ji çûbû ser wî di wê heyeme de.Wî êdî di serê wî de mazin cih û war girtibû.Bi vê yekê re ji, divêt ku mirov bêje ku rêzeke mazin ji ya wî li hevberê wî çêbû bû.Mihamed ji, li wir hatibû fahmkirin û naskirin ku zanistvanekî ku mazina.Her weha ew di wê heyeme de di nav civate mîr Birehîmê zaxoyî de hatibû nas kirin.Mîr Birehîm bi xwe ji, divêt ku mirov bêje ku mirovekî zane bû.Mirovekî ku navserî xwe bû.Di nav xalkê de ji ji wî re û ji zanebûne wî re rêzeke mazin hebû.Dema ku ew derkete dervê, hingî, li derve, di cih de li dore wî mirov li hevdû digahana hevdû.Ew di ti demê de di meşa xwe de li derve bi tenê ne dihata hiştin.Her timî mirov pêre bûn.Dema ku mirov li dore wî li hevdû digahana hevdû ji, wî ji ji wan re di nav wan de axiftin dikir.Ji wan re ji mazin û zanistên di der haqê wan de xwedî fêr bû, ji wan re diaxift û dianî ser ziman.Di derbarê gelek mirovên zanist de ew xwediyê zanebûneke ku mazin bû.Lê pir caran ji, dema ku ew li wan digaha hevdû, êdî ji wan re bahsa kalkê xwe û bavê xwe dikir.Bahsa mazinatîya wan dikir.Bahsa zanebûne wan dikir. Cerna ji ku di axift, bi serê kalkê xwe sûnd dixwar.Ji ber ku ew mirovekî ku mazin bû û di rastîyê de ji, ew mirovekî ku mazin bû û gelek tişt kiribûn bû.Navê wî ji hebû.Navê kalkê wî ji mîr Mîrze bû.Navê xatuna mîr mîr Mirze ji Şengê Hêja Xatun bû.Ji dema wî ve pêşketineke mazin li wê herêmê hebû.Gelek êrîş ji bû bûn, lê belê dise herêmê bi zanebûne xwe re karîbû ku wê aramî û hebûna xwe bi paraze.Hêze wan hebû...

Di pêşengîya mîr û mele serhengê zaxoyî de civat hêdî hêdî êdî derdikete derve.Êdî wê rabûban û çûban.Dema ku derketina derve ji, li derve êdî hinekî dî ji li hevdû mana sekinî.Ji xwe re ta ku hatina derve diaxiftin.Piştre ku hatina derve, êdî mihamed û hin mirovan zan kir ku wê êdî li wir ji hevdû bi qiyatin.Wê xatir ji hevdû bi xwezin û herin.Lê wilo

ne bû.Her ku dem dereng ji bû, hema bêja mirovên ku li wir bûn di wê heyeme de, hemû ji bi mele Serhengê zaxoyî re meşîn ku pêre herine dergaha wî.Dema ku dimeşîn ji ji wan deng derdiket.Ji xwe re diaxftin.Her weha dengê axiftinê ji wan dihat.Mihamed di meşê de ketibû rax mele Serhengê zaxoyî ji de.Bi hev re dimeşîn.Mîr ji di rax wî de bû.Seyde Avdilrehîmê xaniqî û mele Silhatinê kal ji li nêzîkî wan di meşîn.Lê bala seyde Avdilrehîmê xaniqî li ser Mihamed bû.Her weha dema ku lê dihata meyîzendin, ev yek pir baş û qanc dihata dîtin. Mihamed, di wê demê de di rax mele Serhengê zaxoyî û mîr de dimeşî.Lê bêdeng bû.Bi hizir bû.Di serê wî de weke ku hin tiştin hebûn ku li ser wan dihizirî.Dema ku lê dihata meyîzendin, ev yek pir baş û qanc dihata fahm kirin.Mihamed, weke ku hê ji hişê wî li ser cizîre bota bû.Wî ti carî ewder ji bîr ne dikir.Di wê heyeme de weke ku her weha di serê xwe de di haznekê de bê di hizir de bû.Her weha dema ku lê dihata meyîzendin, dihata dîtin. Mihamed pir dihizirî.Di demên li Cizîre bota de ji her weha wilo dihizirî..

Pir dihizirî.Ew di serê xwe de pir diçû.Pir kur û dûr dibû ji dinyê.Dema ku mirov lê di meyîzend,herweha ev yek pir baş dihata fahm kirin.Mihamed, ku mirov demên wî yên li cizre bota, hinekî weke şîrove gotinekê bêje, mirov karê ve yeke vebêje.Piştî ku ew hata Cizîre bota û di zanist û zanebûnê de kur çû, êdî weke ku bibe mirovekî din lê hat.Her weha hata guharandin.Ew êdî ne ew ciwanê ku ji Verezûzê ketibû riyan de û li wir li hevirdorên wê herêmê garahabû û piştre hatibû Cizîre bota bû.Ew êdî mirovekî ku mazin bû.Mirovekî zanist bû.Mirovekî her weha bi zanebûne xwe re di nav xalkê pir mazin dihata nas kirin bû.Wî di demên xwe yên li Cizîre bota de pir pêşketineke mazin di xwe de dabû çêkirin.Pir di hizir de û zanebûnê de mazin bû bû.Her weha divêt ku mirov vê yekê bi teybet bêne ser ziman.Ji ber ku ev yeka, ji bo wî rastîyeke mazin e wî têne ser ziman.

Mihamed, divêt ku mirov pir li ser hizre wî bi sekinê.Ji ber ku ew pir bi hizir bû.Hizre wî pir hebû.Wî hizre xwe di nav xalkê de dianî ser ziman.Lê anîne wî ya ser ziman, di xwe de hinek teybetmendî ji di parast.Dema ku mirov anînîya wî ya ser ziman, şîrove bike, divêt ku mirov bi hizir ku zanebûne wî ji li ber çavan bigirê bêne ser ziman.Awayê ku wî pê di anî ser ziman, dikir ku di serê mirovan de bimene.Dikir ku di serê mirovan de mayînda bibe.Ji ber vê yekê, ew awayê wî yê ku pê dianî ser ziman girîng bû.Wî bi zêdeyî ji, dema ku di anî ser ziman, weke ku hebesteke bixwene di anî ser ziman, Bi vê yekê re dema ku di anî ser ziman, dikir ku mirov bala xwe baş û qanc bidiyê de.Ev yek di vegotine

xwe de bi gotine xwe  dikir. Bi vê yekê re di nav xalkê de di serê mirovan de pir hizrên wî yên dayimî dihatina ser ziman hebûn.Ji xaynî wan ji, pir nivîsên wî yên ku nivîsandine hebûn.Ji medrese sor wî, dema ku bi rê ket, hin nivîsên wî yên ku mirov ji wan re bêje pirtûk mabûn.Ji xaynî wan ji, dema ku bi rê ketibû, di dema li ser rê de, berî ku bi rê bikeve, hinekî nivîsên wê yên ku bi hev re tamar kirî û radestî faqa Qasim kiribû, hebûn.Ji xaynî wê yekê ji, divêt ku mirov bêje ku pêre ji hin nivîsên wî hebûn.Ew tûrikê wî yê li pişte wî bûn, di hundurê wê de ji hin nivîsên wî hebûn.Li kuderê ji bena, ku derfet di dît, car bi car hin hizrên xwe dirijandina ser rupel.Her weha divêt ku mirov vê xosletê wê ji bi teybet bêne ser ziman.Di wê heyeme de, dema ku bi mele Serhengê zaxoyî û mîr re dimeşî ji, ew tûrikê wî yê ku hertimî hinek tiştên wî têde bûn û li pişte wî bû, pêre bû.Di meşî.Lê bi bêdeng dimeşî.Ti deng û meng jê dernediket.Di dema ku di nav civatê de ku mihamed ketibû hizir de û bala mele Serhengê zaxoyî çûbû bû ser wî, hingî, mele Serhengê zaxoyî ji li ser wî di serê xwe de ketibû hizir de ku ka ew li ser çi di hizirî.Wî dibêt ku dema ku katibû hizir de, hizir kiribû ku mihamed li ser wan mijarên ku di wê demê de di nav xwe de nîqaş dikirin li ser wan di hizir de ya.Lê ew ya ne kifş bû.Mihamed di serê xwe dibêt li ser tiştne din ji hizir dikir.Di serê mihamed de pir tişt û rewş hebûn ku li ser bikeve hizran de.Demên wî yên ku li Cizîre bota û hin demên wî yên berî wê demê ji hebûn ku mihamed pir li wan dihizirî.Weke dema ku rastî Dilberê hatibû û piştre tişt û rewşên ku hatibûbûna jin kirin û weke demên wî yên ku li nig şêx li Idirê mabû, ev dem, demne ku di jiyane wî de pir girîng bû.Dema ku wî ya li cizîre bota ji pir girîng bû.Ew dem, bi serê xwe hin teybetmendîyên ku werine têgihiştin di xwe de di paraze.Weke hebûne meleyê Cizîrî û deme wî ya li mederese sor û hin rewşên din ku bi hev re, wan teybetmendîyan hê bêhtir girîngtir dikin, hene.Ew ji divêt ku di vir de werine ser ziman.

Dema ku mirov li ser demên Mihamed yên ku li Cizîre bota dihizirê, hingî, ku mirov digihijê hizreke ku mazin.Mirov pêşketineke ku mazin dibîne.Ew dema wî di xwe de hin deman di afirêne.Lê bi giştî ew dem, weke demeke mazin ya jiyana wî têt xuyakirin.Jiyane mihamed ya li Cizîre bota, jiyaneke ku pêşketi ya.Jiyaneke bi zanistî ya.Jiyaneke ku mirov bêje jiyana zanistvanekî ya.Mihamed di wê dema xwe de xwe digihijenê asteke zanîtiyê.Her weha mazin dibe.Piştî ku têt wir, êdî li wir mazin dibe.Bi hizre xwe re mazin dibe.

Ku mirov wê mazinbûnê şîrove bike, mirov divêt ku bêje ku ew mazinatî mazinatîyeke ku bi zanatîya.Her weha ev yek pir

girînge.Mihamed hizrê xwe, di wê demê de mazin dike. Di wê demê de bidest nivîsandinê dikêt.Di wê demê de her weha afirandineke mazin dikêt.Bi vê afirandinê re mazin dibe.Her afirandinek, afirandineke di şaxsiyete mirov de ji ya.Her weha her afirandina wî ji afirandineke di şaxsiyete wî de ya.Ew her hizre ku têne ser ziman, bi têgihiştin jiyan dike.Her weha divêt ku mirov vê yekê bi teybet bêne ser ziman.

Di wê demê de bi zanisê re xwe û hevirdore xwe nas kirin, pêre mazin derdikeve pêş.Ya muhra xwe li pêşketine wî dixe ji ev yeka ya.Ji ber vê yekê çend mirov li ser têgihiştinê wî bi sekinê û têbigihê, avçend ji mirov wê li ser wî bixwe bi sekinê û wî têbigihê.Bi vê yekê re divêt ku mirov baş li ser bisekinê.Mihamed her weha bi têgihiştin jiyan dibe û dike.Ji ber vê yekê ji, mirov divêt ku vêbêje ku her hizre ku bi xwe re çêdike, wî ji mazin çêdike û bi pêş ve dibe.Hizir, di xwe de têgihiştinê weke xosletî mazin di paraze û pêre jîn dibêt.Bi vê yekê re, mirov dema ku her demên pêşketine wî şîrove kir, divêt ku mirov ji, ji bîr neke ku mirov her weha hin demên wî ji ya yên ku jîn dikê û yan ji yên ku buhurandina di têgihiştine wî de şîrove dike.Her weha ew di pêşketinê de ji deman buhurtina deman jîn dikêt.Mihamed, bi aqilê xwe re mazina.Fahma wî mazina.Jiberkirineke wî ji ya mazin heya.Di aqilê xwe de girtin û her weha pê xwe gahandina têgihiştinekê mazina.Ji ber vê yekê ji, dema ku mirov wî şîrove kir, mirov divêt ku bêne ser ziman ku zû bi pêşketin pêre hebû.

Li ser jiyanê pir hizir dikir.Li ser hebûn û bûbûnên ku di jiyanê de dibûn ji pir di sekinî. Li ser wan ji xwe û ji dore pirs ji car bi car di pirsîn.Li ser ave û axê hizir dikir.Li ser demên buhurti û mirovên mazin ku jîn bûna hizir dikir.Di derbarê wan de xwedî hizir bû.Pir di xwand.Ji ber vê yekê ji pir zanibû.Li ser demên xwe yên buhurtina pir di sekinî.Dema ku di axift ji di nav axiftinên xwe de pir li ser wan deman û pêşketinan û mirovên mazin ku jîn bûna di sekinî.Hizre wî di derbarê wan deman de hebû.Di derbarê wan mirovên ku di wan de jîn bûna û nav dana ji hizre wî hebû.Pir li ser wan di hizirî.Hizre wan di nav mirovên dore xwe de dikire nav nîqaş û danûstandinê de.

Dema ku li medrese sor di rûnişt û diaxift, hingî, ne tenê faqihên ku li wir li dore wî di rûniştin û lê dihisandin.Ji xaynî wan ji pir mirovên ku zane û navserî xwe û sofî ji hebû û di hatin û li wir li wan dirûniştin.Wan ji li wan dihisand.Wan ji hizre xwe car bi car dianî ser ziman.Tişte ku têdigihiştin û fahmdikirin ji dianîne ser ziman.Di nav faqihên wî de yên ku herî jîr ji bûn, bi hizira wan dide vegotin.Wan ji hizre xwe, bi tişte ku têgihiştin, weke ku dubare bikin ji mirovên dore xwe re dianîne ser

ziman.Ev xoslet, hertimî bi cih dihata anîn. Ji ber ku xosletekî fêrkirînê bû.Ne tenê faqihên ku bifahmbûn, hema bêja yên ku dixwandin hemûkan ji ev yek dikirin.Tişte ku fêrdikirin û fahmdikirin, divîbû ku an ji seydeyê xwe de an ji ji mirovên dore xwe bênine ser ziman.Her weha weke xosletekî perwerde kirine li pêş bû. Vêce ku di nav wan mirovên zane de her weha anîne ser ziman çêdibû, êdî bi nav derketina pêş ji çêdibû.Dema ku her weha dihata kirin, êdî ew faqihê ku her weha dikir, bi hebûne xwe re navê wî ji derdikete pêş.Çawa ku navê torînekî hertimî bi mazin bûne xwe re li ser ziman bû, her weha êdî navê wan de li ser ziman dima.Piştre ku her weha wilo di wê tempoyê de berdewam kirin ji, êdî mazin di nav xalkê de di demên xwe yên pêş de weke zanistan dibûn. Weke ku mirovne mazin dihatina ser ziman.Êdî hertimî li ber çav dibûn.

Li Cizîre bota, ev yaka bêhtir li pêş bû.Bêhtir li ber çavan bû.Bêhtir ku bicih dihat, navê mirov derdixiste pêş di nav xalkê de.Cizîre bota her weha mazin bû.Lê pir zanist hebûn. Mirovên lê ji mirovne ku zane bûn.Mirovne ku ji dinye xwe fahmdikirin bûn.Mirovne ku têgihiştine wan mazin bûn û pêşketîbûn bûn.Mihamed, dema ku hatibû Cizîre bota, pêşî, mirovên ku lê meyîzendibûn, lê meyîzendibûn ku ka ma ka ew çend bi fahma û zûr fêr dibêt. Dema ku her weha ev xoslet pêre kifş kiribûn, êdî ew hertimî li ber çavên mirovan mabû.Her weha êdî qadrekî ku mazin ji aliyê mazinên xwe ve hilda bû.Mihamed, ji ber ku dema ku di serî de çûbû Cizîre bota, ji ber ku bi seydeyê mazin meleyê Cizîrî re çûbû, êdî ew ji di serê mirovan de bû.Dema ku mirovan lê dimeyîzend ji weke ku li meleyê Cizirî meyîzênin li wan dihat.Piştre ji mihamed ji ji ber ku pir hij meleyê Cizîrî kiribû, êdî ji medrese sor ne vaqataha bû, êdî ew ji di ber çav de dihata girtin, dema ku li wî dihata nerîntin.

Meleyê Cizîrî, bi xwe re demeke dabû vekirin di pêşketin û têgihiştinê de.Mihamed ji weke ku ew dem dabû berdewam kirin dihata dîtin.Ji xwe ji wilo bû.Têgihiştine meleyê Cizirî, divêt ku mirov bêje ku di ya mihamed jîn dibû.Mihamed pir ji wî şûd girtibû.Pir encam ji wî derxistibû bûn.Mihamed, hizreke pir mazin dabû çêkirin.Bi vê mazin çêkirina hizir re, ew ji mazin bûbû û bi wê mazin çêkirinê re ji mazin kiribû.Bi vê yekê re têgihiştinê wî mazin bû û di dema xwe de temenê wê dema nû mazin kiribû û kur kiribû.Yên ku meleyê Cizîrî fahm dikirin û têgihiştin, ji dema xwe û virde jîn dibûn.Mihamed ji her weha ji wê demê û virde jîn dibû.Di vê yekê de bi mihamed re meleyê Cizîrî bi hizir, bi têgihiştin û hizreke mazin jîn dibêt.

Mihamed, bi vê yekê re dema ku mirov wî şîrove bike û bêne ser ziman, divêt ku ji pir aliyan ve werê ser ziman.Hingî wê baş û qanc werê têgihiştin.Dema ku mirov wî fahmkir û têgihişt êdî mirov wê dema wî ji bi pêşketinên wî re mazin fahm bike û têbigihê.Her weha ev herdû nûqte bi hev re ne.Bi hev ve girêdayî ne.Mihamed ji di nîvê wan de jîn dibe bi hizir û têgihiştine xwe re.

Dema ku mirov bahsa meleyê Cizirî bike bi mihamed re, hingî mirov wê bibîne ku hizrê meleyê Cizîrî çend mazina û di pêşketine wî de xwedî role.Lê ne tenê ev yek, her weha bi wî re di wî de xwedî role di pêşketine wî de.Di wê demê de hin hizrên mazin ku herkesekî zani bûn û divîbana ji ku zanibin hebûn.Weke hizre Nebi Nuh.Li ser wî û hizire wî ji pir nivîs ji hebûn.Ew ji di wê pêşketinê de xwediyê wateyeke mazin bû.Di hizir û pêşketine mihamed de ev ji bi wate ya.Divêt ku mirov her weha vê yekê bi teybet bêne ser ziman.Ev hizir, hizrên ku hizre dema xwe di afirandin, û her weha hizrên ku mazin bûn.Hizrên ku hizre dema xwe di afirandin, hizrên pêşketinê bûn.Hizrên pêş ve birine bûn.Hizrên mazin kirinê bûn.Bi vê yekê re di wê demê de ev hizir ji hebûn û mazin di aqil û hişan de bûn.Mihamed, ew ji pir baş û qanc xwandibûbûn. Ew ji mazin têgihiştibû bûn.Li ser wan hizran ji xwedî fêr bû.Xwedî têgihiştin bû.Di serê xwe de li ser wan mazin bihizir bû û gelekî ji li ser wan hizir dikir.Li medrese sor, di wan demên xwe de, dema ku bi faqihên xwe re dikete danûstandinan de an ji nîqaşan de her weha pir li ser wan hizir dikir û dida hizirkirin.Bi vê yekê re di ser de hizir dikir ku mazin bike.Bi danûstandinê û nîqaşê, mirov bi hizire xwe re û têgihiştinê xwe re mazin dibê.Mihamed ji di vê farqê de bû.Bi vê yekê re pir dikete axiftin û danûstandinan de.Bi mele Silêman û faqa Qasim re, dema ku li wir bû, ku firsand di dît, diçû nig wan û bi wan re dikete nîqaş û dan û standinan de.Bi vê yekê re divêt ku mirov bêje ku di nav mihamed, mele Silêman û faqa Qasim de pir dan û standinake mazin hebû.Danûstandina wan ji, bi hizir bû.Wê danûstandinê, mihamed mazin têdigahand..

Piştre, di demên xwe yên li cizîre bota yên di dawiyê de, dema ku mele Serhengê zaxoyî têt, êdî di nav wan de ji her weha hin danûstandin û nîqaşên fêrkirin û fêrbûne dibin.Piştre ji, mele Serhengê zaxoyî lê germ dibe.Pir hijê dike.Mihamed, bi hizire xwe re mazin dikeve ber çavên wî de.Her weha êdî mazin di nav wan de danûstandinek dest pê dike.

Mihamed bi mele serhengê zaxoyî re pir danûstandin kiribû.Pêre pir peyivî bû.Dema ku mele Serhengê zaxoyî li wir bû, hingî, her weha bi hev re pir danûstandineke mazin di nava wan de dest pê kiribû.Bi vê yekê re

mirov karê bêje ku mele Serhengê zaxoyî serwext bû li ser hizre wî û ew ji serwerxt bû li ser hizre wî.Her weha li ser hizre hevdû, ya di serê hevdû de û têgihiştin û pêşketine hevdû serwext bûn.Bi vê yekê re êdî nêzîkbûneke mazin di nav wan de dest pê kiribû.Mihamed, pir bi hizir bû.Dema ku mele Serhengê zaxoyî ji ev yeka dîtibû û têgihiştibû, êdî pir tema wî çûbû ser mihamed di wê heyeme de.Pir êdî xwestibû ku bi wî re bana.Her weha piştre êdî ji hevde ne vaqatahabû bûn...

Di wê dema ku li civatê de rûniştî bûn, û ji hevdû re diaxiftin, û dema ku mihamed ji di nav civatê de ji civatê de axifitibû, hingî, mirovên li wir wir mihamed ku çend bi hizre xwe re mazina dîtibûn û fahm kiribûn.Dema ku her weha fahmkriibûn, êdî bala wan ji çûbû bû ser wî û ji ser wî êdî ne vaqatahabû bû.Mîr Birehîm ji, dema ku ew axivibû û wî lê hisandibû, êdî pir lê şaq mabû.Li axiftina pir bi heyren mabû.Pir bala wî çûbû ser wî.Piştre ku mihamed axiftine bi dawi ji kiribû, bala wî ji ser wî ne birrî bû.Her weha êdî mihamed pir ketibû ber çavan de. Lê yê ku herî mazin bala wî çûbû ser Mihamed û avirên xwe jê ne di girtin seyde Avdilrehîmê xaniqî bû.Wî pir avirên xwe dabûbûna ser Mihamed û lê dimeyîzend.Pir lê di nêrt.Mihamed, ew bala seyde Avdilrehîmê xaniqî ya di civatê de kifş kiribû.Piştre kifş dikir.

Seyde Avdilrehîmê xaniqî mirovekî ku zane bû.Hizre wî pir hebû.Pir garaha ji bû.Dinya pir dîtibû.Li dore Cizîre bota û li navende wî bi xwe ji mabû.Lê demeke xwe ya dirêj li rojhiletê kurdistanê li Dinwerê buhurandibû.Li wir ji mabû.Ji ber ku wî Abu Hanîfê Dinwerî xwendibû û piştre xwestibû ku herê û warê wî di cih de bibîne.Bi vê yekê re çûbû wir û li wir weke demeke dirêj ji mabû.Abu Hanîfê dinwerî, çend ku berî wan bi çend sadsala ji jîn bûbû ji, hê ji, navê wî mazin li ser lêvan bû.Ji ber ku ew mazin bû.Wî hizreke mazin danîbû hole. Wî ji gelek aliyan ve aqilekî mazin danîbû hole.Mirovên zanist yên ku di nav kurdan de navê wî nizanibûn ne bûn.Navê wî pir dihata zanin.Pir mirovan navê wî dihilda.Pir bahsa wî hizre wî dihata kirin.Wî hizreke mazin danîbû hole.

Seyde Avdilrehîmê xaniqî ji mirovek ji wan mirovên zanist ku navê wî bihistibû bû.Wî ji ew xwandibû.Hizre wî fêr bûbû.Ji ber vê yekê re pir li ser wî sekinî bû.Dema ku seyde Avdilrehîmê xaniqî ji bakûr hatibû başûr û j başûrê kurdistanê ji çûbû rojhilat herême kirmanşanê, êdî li wir wî xwe gahandibû Dinwerê ji.Li wir, li hin herêmên din ji mabû.Bi hin zanistvanên mazin re yên din re ji mabû.Weke Şêx hiseynê Musilî zanistvanên nav dayî ji hebûn.Ew ji mazin bûn.Bi wan re ji rûniştibû û danûstandin kiribû.

Di wê heyeme de di civatê de seyde Avdilrehîmê xaniqî axivî bû ji,hinek ji wan zanistvanên ku di derbarê wan de ew xwedî fêr bû ji, anîbû ser ziman.Her weha bahsa wan ji kiribû.Dema ku wî bahsa wan kiribû, êdî navê wan di serê mihamed de ji cih û war girtibûbû. Mihamed di wê heyeme de dema ku ketibû hizir de hinekî li ser wan ji hizirî bû.De ne, ji wan zanistvanên mazin yên ku navê wan di civatê de hatibû ser ziman, navê wan gelekan ji berî ji hingî ji aliyê mihamed ve li cizîre bota hatibû bihîstin.Ji ber vê yekê ku ew nas ji ne kiribana û ne dîtibana ji, di derbarê wan de xwedî fêr bû.Hinekî hizre wan ji xwandibû bû.Lê ne zêde.Ji bo ku hizre zanistvanekî mirov fêr bibe ji, mirov ku pêre hewdîtin kir, hingî, derfet heya ku mirov baştir wî û hizre wî fêr bibe û nas bike.Ev yeka di wê heyeme de di serê gelek zanistanan de bû. Mihamed li ser vê yekê xwedî têgihiştin bû.Wî ji wilo hizir dikir.Hevdû dîtin, mirov di derberê hevdû û hizre hevdû de dike xwedî hizir û têgihiştin.Ma ne ji ber vê yekê bû ku dema ku mihamed xwe ku werê Cizîre bota û meleyê Cizîrî bibîne.Ji ber ku di wê navenge de mirov bêhitr bi têgihiştin dibe û bêhtir nas dikêt.Naskirin, di vir de, dema ku mirov bêne ser ziman, divêt ku mirov ji bîr neke ku bêjeyeke ku bi hizir ji bû.Dema ku di hata ser ziman, bi xwe re hin hizrên ku bi hizir ji di anîne ser ziman.

´Hevdû naskirin´, dema ku em li ser di sekinîn û tênine ser ziman, weke nêzîkatîyeke hizrî em tênine ser ziman.Ji ber ku her weha bi wê wate û nêzîkatîyê têt ser ziman.Di nav kurdan de bêja ´naskirinê´, di gotinê de û vegotinê de hinekî bi teybet têt ser ziman.Girîngîyek ji vê bêjê re heya.Di axiftinan de ji ew girîngî dihata ser ziman.Bizêdeyî ji di vir de dema ku mirov bahs bike, mirov bahsa zanistanan dikêt.´Naskirin´, ´fêrkirin´, ´fêrbûn´, ´dîtin´, û hwd, hin bêjeyên teybetin di gotinê de di nav kurdan de.Li ser wan bêjeyan, hin gotinên ku ji dev di nav xalkê de dihatina gotin ji di nav kurdan de hebûn, dihatina ser ziman.Di civatan de her weha bi zêdeyî ev gotin dihatina ser ziman.Bi zêdeyî ji ji devê zanistvanan di hatina ser ziman.Bêje, di devê zanistvan de bi hizir û têgihiştin dibe.Lê çend ku bi têgihiştin û hizir dibe ji, dise weke ku li rastteqîniyeke bigerihê hertimî ji di hiş de dimene.Her weha ku zanistvan ji rast nêzîkatî li wê bêjê kir û bifahm û têgihiştin anî ser ziman, hingî, mirov karê bêje ku wê li gor xwe werê ser ziman.Li gor hebûna xwe werê ser ziman.Her bêjê, dema ku têt ser ziman, di zimanê mirov de wate distenê.Ji bo ku bêjeyeke ji bo rewşeke bibe nav an ji deng, divêt ku nêrîn û dîtin bi hev re hebin.Bi vê yekê re ji têgihiştin hebe.Hingî, mirov karê bêjê ku wê fahmkirin bibe û hebe.

Mihamed, dema ku mirov li ser wî dihizrê, mirov dibîne ku li ser vê rewşê bêjeyan ji xwediyê hinek nêzîkatîyana.Di bêjeyên ku tên ser ziman de li hin wateyan ji digerihê di serê xwe de.Car bi car bûya ku ji xwe her weha ji pirsî ya.Ku ji bo rewşeke bêne ser ziman, hin bêje hatina ser ziman, hingî, wî pirsîya ku ´ma gelo ev rewş çiya û ew gotin çiya´.Her weha pirsbûn pêre çêbû ya.Bi pirsbûnê re ji, di serê xwe de pir hizirîya.Xwestiya ku bi wan bêjeyên ku hatina ser ziman, xwe bigihinê wate wan.Bi vê yekê re ji, xwe bigihinê rastêya ku dihata ser ziman.Di vir de bêje ´rastiyê´, ji devê wî derdiket.Wî di pirsî ku ka rastî çiya.Dema ku di pirsî, divêt ku mirov bêje ku di serê mihamed de, di cevherê hizre wî de hizreke rastteqîniyê ku hizre wî û pirsbûne kifş dikir ji hebû.Dema ku di pirsî weke ku dixwest ku xwe bigihinê wê rastreqîniyê.Her weha di hewldanekê de bû û di hizrekê de bû.Bi vê yekê re pir dihizirê. Bi vê yekê re pir dixwand û di hizirî.`Bêjeyên rast´, wî li wan lêgerinek dikir.Li gor wê yekê ji wî di serê xwe de hin astên zanebûne dabûbûn çêkirin.Li gor wan û hizrên wa ew bêjeyan di wan de li rastîyê di gerehe.Ku mirovek di vir de ji me bi pirsê ku di bêjeyan de ji kî bi wate wê re li rastîyê garahaya.Wî çaxî, wê navê mihamed her weha di cih de werê bîre me.Ji ber ku dema ku mirov wî dixwanê mirov vê yekê pir baş û qanc dbîne û têdigihê.Lê li gor mihamed, cevherê bêjeyan ji rastteqîniyek kifş dike û divêt ku mirov xwe bigihinê wê rastteqîniyê ji.Dema ku mirov xwe gahanda nêzîkî wê rastteqîniyê ji, mirov hingî, wê têgihiştineke mazin bi xwe re bike û çêke.. Ji ber ku li gor wî, ti tişt ne bê rastteqîniya.Lê li gor wî, çawa ku ti tişt ne bê rastteqîniya, her weha rastteqîniyeke mazin ji heya ku waqas rastteqîniyan di xwe de li hevdû dide hevdû heya. Li gor wî, dema ku mirov xwe gahanda wê cevherê hingî mirov wê xwe bigihinê rastiyeke mazin di jiyanê de...

Dema ku di civatê de di wê heyeme de axiftibû ji, her weha li ser vê yekê pir sekinî bû.Bi vê yekê re pir di nav hizir de kur çûbû bû.Pir bi hizir diaxift.Dema ku di vê xalê de axiftibû, êdî bala mirovên zane hemûkan yên li dore xwe ku lê dihisandin kişandibû ser xwe di wê heyeme de.Êdî her weha ketibû ber çavan de.

Mihamed, pir xwandibû, bi vê yekê re pir hizir pêre hebû.Têgihiştine wî ji mazin bû. Dema ku diaxift ji, pir mazin diaxift.Dema ku diaxift ji, dikir ku mirovên ku lê dihisênin ji, lê şaq bimênin.Her weha li mirovan dikir.Di wê heyeme de di nav civate mîr de li qasre wî, wilo li mirovan kiribû.Bala mirovên zane yên li dore wî hemûkan ji çûbû ser wî di wê heyeme de. Mele Serhengê zaxoyî, di wê heyeem de weke ku careke dî wî

li wir kifş bike lê hatibû.Bi vê yekê re pir bala wî çûbû ser wî di wê heyeme de.Bi vê yekê re di wê heyeme de, weke ku wî ew li wir di wê heyeme de nas kiribe û dîtibe lê hatibû.Bi vê yekê re ew ji weke mirovên li wir li dore wî ku lê dimeyîzendin, lê şaq mabû.Pir lê dimeyîzend.Pir lê bi hizir bû.Pir lê bi aşq dimeyîzend.Di wê heyeme de dema ku rabûbûna ser xwe û kiribûn ku herin, hingî ji, mele serhengê zaxoyî ketibûbûne rax hevbû de.Hingî ji, bala mele Serhengê zaxoyî li ser mihamed bû di wê heyeme de.

Her weha haya ku hatine derve êdî bi hev re meşîbû bûn.Lê li derve ji mele Serhengê zaxoyî û mihamed bi tenê ne hatibû hiştin.Wilo xuya dikir ku wê mîr, bi mihamed û mele Serhengê zaxoyî re haya cihê ku wê çûbanê de wê bi wan re bi mirovên li dore xwe re wê çûbana.Her weha rewş dihata xuyakirin.

Piştî ku derketibûbûna derve, êdî li derve zêde wilo ne sekinî bûn.Mele Serhengê zaxoyî li pêşîya qalibalixa ku li dore wan bû.Mîr di rax de bû.Mihamed ji li pêş bû.Li dehma mele serhengê zaxoyî di sekinî.Seyde Avdilrehîmê xaniqî ji li pêşîye qalibalixê bû.Di rax wî de ji mele Silhatinê kal hebû dimeşî.Her weha di rewşekê de dimeşîn.Li dore wan ji gelek mirov hebûn.Mirovên li dore wan ji, yên ku hertimî li dore mîr dirûniştibûnYên ku navserî xwe bûn.Yên ku gotina wan lê dihata hisandin bûn.Her weha mirovne ku mazin bûn.Mirovne ku bi gotine xwe mazin bûn..

Bi hev re piştî ku têne derve, êdî li derve, mîr mele serhengê zaxoyî û mihamed û wan bi tenê ne hêle û dema ku ew dimeşîn ku herine medrese, êdî ew ji bi wan re di keve rê de haya bi wir.Dema ku mîr bi wan re kete ser rê de û çû, êdî ne hewceyî gotinê bû ku em bêjin ku wê ew miovên li dore wan ji bi wan re wê herin.Wan mirovên li dore wan wê ti carî ew bi tenê ne hiştana.Di wê demê de ji ne hiştin.Dema ku derketibûbûna derve ji bo çûne, êdî ku mele Serhengê zaxoyî kara çûne xwe kiribû êdî mîr ji pêre xwe dabû ser rê.Êdî piştre ji xwe êdî gotin ji ti kesekî derneketibû.Ne mele Serhengê zaxoyî gotibû newe û ne ji mîr gava xwe di cih de hiştibû ku weke ku neçê.Her weha rewş ji xwe re bi xweze çêbû bû.Lê çend ku di hundurû de ji xwe re di axiftin, her weha piştî ku derketibûbûna derve ji ew axiftina xwe ne birrî bûn.Ji xwe re di nav xwe de ew axiftina xwe berdewam kiribûn.Weke ku ew xwe di nav axiftinê xwe de winde bikin li wan hatibû.Mele Serhengê zaxoyî pir diaxift.Mirovên li dore wî ji lê dihisandin.Ew mirovekî ku mazin bû û zane bû, û rêzeke ku mazin ji jê re dihata nîşandin.Mîr ji di wê heyeme de di rax wî de bû.Lê belê ew ji di rax wî de bi bêdeng dimeşî. Wî ji guhê xwe dabû ser wî û li wî

dihisand.Mihamed ji xwe di serê xwe de di hizran de bû. Her weha dihata xuyakirin.Dema ku mirov li wî dimeyîzend, mirov her weha rewşe wî didît. Ew di rewşe xwe de bêdeng sekinî di rax mele Serhengê zaxoyî û mîr de dimeşî.

Di meşê de, bala seyde Avdilrehîmê xaniqî û mele Silhatinê kal ji pir weke ku li ser Mihamed bû.Wan ji avirên xwe dabûbûna ser wî û li wî dimeyîzendin.Li wî bi bal bûn.Dema ku mirov li wan dimeyîzend, mirov her weha rewşe wan ji kifş dikir.

Piştre ku her weha seydeyê mazin ji careke fêrên ku zarokan hildabûn ku li nig wî hatina dubara kirin, êdî piştre belavbûn çêbû.Lê yên ku belav bûn ji, tenê zarok bûn.Yên mazin belav ne bûn.Zarok hê zûkanê dihata medrese ku fêrên xwe hildin.Ku fêrên xwe hildan ji, êdî wê çin û wê li malê ji hinekî bixwênin ji bo revakirinê.Lê faqihên mazin wê li wir mabanan.Wê, ku zarok çûn, êdî wê ew bihatan û li dore mele Serhengê zaxoyî li hew kom bûban û wê li wî bihisandan.Dema ku mele Serhengê zaxoyî axift, êdî wê ne tenê ew, wê gelek mirovên ku hatibûbûna wir ji wê li wî hisandiban.Ji xwe, di wê rewşê de ji bo ku lê bihisênin, pir mirov hertimî li wir di wê demê de dibûna kom.Dema ku mele Serhengê zaxoyî diaxift, wan ji bi bala heya xwe didayê de û lê dihisand.Mele Serhengê zaxoyî mirovekî ku pir bi zane bû.Hizre wî pir hebû.Dema ku diaxift ji pir bi zane diaxift.Di wan deman de, ne tenê faqih an ji hin mirovên ku werin û lê bihiênin li wir amede dibûn.Pir caran ji, mîr dihata wir û lê dihisand. Demên ku mîr dihat ji, êdî ku mele Serhengê zaxoyî diaxift û ku axiftina xwe bidawi dikir, êdî piştre bi hev re dirabûna ser xwe û bi ber qasrê ve diçûn.Diçûn û li qasrê ji xwe re dirûniştin. Dema ku diçûn û li qasrê dirûniştin ji, piştre ji ne bi gelekî re pir mirov li wan digahana hevdû.Êdî li wir wan civate xwe mazin li dar dixist.Mîr,ji xwe, di ti demê de bi tenê ne dihata hiştin.hertimî li dore pêre pir mirov hebûn.Mirovên ku pêre bûn ji, mirovne ku navserî xwe bûn û yên ku gotina wan mazin bû bûn.Di nav xalkê de ji hertimî li wan dihata hisandin. Gotina wan li ardê ne dihata hiştin.Bi vê yekê re mirov karê bêje ku mirovên ku mazin bûn. Yên ku xwedî wasf bûn.

Di wê heyeme de piştî ku zarokan fêrên xwe hildan û rabûn û çûn, êdî piştre ne bi gelekî re bi faqihên mazin re mirovên ku li wir bûn ji, li dore mele Serhengê zaxoyî li hew gahana hevdû û mele Serhengê zaxoyî ji ji wan re bidest axiftinê kir.Dema ku ew li wî gahana hevdû û wî ji wan re bidest axiftinê kir, êdî wan ji pir bi hey lê dihisandin.Heya wan, tenê çûbû bû ser mele serhengê zaxoyî.Mihamed li nig wî rûniştibû.Bal li ser Mihamed ji hebûn.Lê dema ku mele serhengê zaxoyî bidest axiftinê kiribû, êdî herkesek bi bêdeng mabû.Dihisand. Mihamed ji her weha bi bêdeng mabû.Dihisand.Ku mele Serhengê zaxoyî bidest axiftine xwe kir û ku hinekî axift ji, êdî piştre ku hinekî di nav axiftinê de pêde çûyîn çêbû, êdî mirovên ku li wir bûn yên ku navserî xwe bûn û zanebûn ji, hin bi hin êdî bidest tevlîbûna axfitinê kirin. Ku ew ji tevlî axiftinan bûn, êdî nîqaşaka ku pir mazin di nav wan de derkete hole.Ku mele Serhengê zaxoyî axift û pişt wî re ku seyde Avdilrehîmê xaniqî ji hinekî pişt wî re axift, êdî weke

ku bal herine ser Mihamed li wan hat.Dema ku wilo weke ku bal herine ser Mihamed bû, êdî mele Serhengê zaxoyî ji ev yek fahm kir.Dema ku wî ev yek fahm kir, êdî wî berê xwe pêşî da mirovên li wan meyîzend û piştre bire ser Mihamed û ji Mihamed xwest ku hinekî ew ji biaxivê û çend gotinan ji wan vebêjê.Mihamed, dema ku her weha bal çûne ser wî û mele Serhengê zaxoyî ji jê xwest ku biaxivê, êdî wî ji xwe di cihê xwe de xwe adiland û kir ku ji wan re bi peyivê.Mihamed, dema ku bidest axiftinê kir, pêşî çend gotinên baş û qanc li ser mele serhengê zaxoyî vegotin û piştre axiftine xwe bihizir berdewam kir.

Mihamed, ku xwe di cihê xwe de adiland û kir ku bi peyivê, êdî piştre bidest peyivtinê kir di nav wan miorvên li dore xwe de û li pêşîye mele Serhengê zaxoyî.Dema ku Mihamed bidest axiftinê kir, pêşî hin gotin li ser vegotinên ku mele Serhengê zaxoyî kir.Ji wan vegotinên wî hin minaq ji di nav axiftine xwe de anî ser ziman.Piştre axiftine xwe bire ser rastîyetê û rastteqîniyete.Li ser rastîyetê û rastteqîniyete axift.Dema ku Mihamed her weha li ser rastîyete û rastteqîniyete axift, pir bi hizir axift.Pir bi zanetî axift.Mirovên li dore wî bala wan pir bi hey çû ser wî.Mihamed, dema ku bidest axiftinê kir, weke ku xwe di nav axiftinê de winda bike lê hat û bidest axiftinê kir.Weke ku heya wî ji dinye derve werê qutkirin lê hat. Tenê di nav hizrên di serê xwe de ma.Di wê dinyê de ma.Di serê xwe de çend kur bû û kur diçû, di wê heyeme de danî ber mirovên li dore xwe.Bi mele Serhengê zaxoyî re mirovên ku li wir hemûkan ji bala xwe dana ser wî.Tenê, berê xwe dana wî û li wî meyîzendin û hisandin. Mihamed, bi axiftinê xwe re mirovên li wir, yên li dore xwe, weke ku ji xwe biribû bûn.Ew ji bi axiftina Mihamed re weke ku ji xwe herin li wan hatibû bû.Her weha li wan hatibû bû. Mihamed, her weha demeke dirêj axift li wir di nav mirovên li dore xwe de ji wan re. Mihamed, axiftineke ku pir xweş û biaqil kiribû..

Dema ku Mihamed hinekî her weha axift, êdî piştre ne bi gelekî re ma sekinî.Lê dema ku Mihamed ma sekinî, ew ne dihata wê watê ku wê axiftin sekinî bana.Mirovên ku li dore wî bûn ji, miorvên ku pir zane bûn û yên ku navserî xwe bûn.Mirovekî ku her weha mazin û bi aqil bi axivê, ne mumkun bû ku pêre ne ketan nîqaşê de.Ji xwe, dema ku Mihamed ma sekinî, êdî mirovên li dore wî berê xwe danê de û kirin ku pêre bikevine nîqaşê de.Mihamed ji ev yek fahm kir û têgihişt.Lê wî ti bertek ne da nîşandin.Weke ku li bendî wan axiftinê bêt li wan meyîzend û ma bi bêdeng.

Mihamed, pir bi zane axiftibû.Dema ku axiftibû ji di axiftinê xwe de pir hizir û dîrok anîbû ser ziman.Ew hizir û dîrokên ku wî anîbûbûne ser ziman, ew mirovên ku li dore wî bûn, hinek ji wan ji, hinek ji wan hizir û dîrokan ji, di derbarê wan de xwedî têgihiştin bûn.Ji ber vê yekê ji, yên ku her weha xwedî zane bûn bêhtir bala wan çûbû bû ser Mihamed û axiftine wî di wê heyeme de.Bi vê yekê re, bi wan re xwesteke axiftinê ru dabû.Mele Serhengê zaxoyî ji ev yek fahm kiribû.Lê bêdeng mabû.Lê bi kêf ji li Mihamed dimeyîzend.Dilê wî, ji Mihamed xweş bû bû.Her weha ji ru dêne wî dihata têgihiştin.

Piştî ku Mihamed, axiftine xwe bidawi kiribû yên ku xwestibûn ku pişt wî re bi axivin hebûn.Lê yê ku pir xwestibû ku pişt Mihamed re bi axivê seyde Avdilrehîmê xaniqî bû.Wî ji pir xwandibû û gerahabû.Gelekî dinye dîtibû.Li gelek deveran geraha bû û mabû.Bi gelek zanistan re mabû û hizran zanibû.Li ser hizre wan pir bifêr bû.Li ser hizre zanistên ku di demên berê de ji jîn bûne û navê wan heya ji, xwedî zanebûn bû.Bi vê yekê re mirov karê bêje ku ew pir bi zane bû.Pir bi hizir bû.Piştre ku wî xwe dabû pêş, êdî bal çûbûbûna ser wî ji.Bala mele Serhengê zaxoyî ji çûbû bû ser wî di wê heyeme de.Piştî ku bala mele Serhengê zaxoyî çû ser wî, mele Serhengê zaxoyî kir ku du sê gotinê bi wê bala xwe ya li ser wî vebêjê.Dema ku wî berê xwe da wî, êdî piştre ne bi gelekî re mele Serhengê zaxoyî axift û çend gotin ji gotin.Lê mele Serhengê zaxoyî zêde dirêj ne axift.Dema ku axiftibû, di axiftine xwe de bal anîbû ser hizrên ku Mihamed anîbûbûnê ser ziman.Bal anîbû ser ziman axiftine wî di wê heyeme de.mele Serhengê zaxoyî, dema ku di axiftine xwe de ji Mihamed axiftibû, gotibû ku ´ew pir mazin û zane û biaqil xaber da´.Pêre ji, hinek gotin li ser axiftine wî anî bûbûne ser ziman.Gotinên ku wî gotibûn, di serê mirovên li dore wî de cih girtibûn.Dema ku ew axiftibû, bi balaka mazin wan mirovên li dore wî lê hisandibû.Bi heyeke mazin lê hisandibûn.Lê mele Serhengê zaxoyî axiftine zêde dirêj ne kiribû.Weke ku fahmkribû ku seyde Avdilrehîmê xaniqî wê biaxivê û bisekinê û mafê axiftinê jê re bihêle, ma sekinî.Mirovên li dore wî û Mihamed ji ev yek fahm kir.Ji xwe seyde Avdilrehîmê xaniqî ji weke ku li bendî wî bû sekinî bû.Her weha ji rewşa wî dihata xuyakirin.Mihamed, dema ku her weha di seyde Avdirehîmê xaniqî de farq kir, êdî bala xwe bihey bire ser wî û li wî meyîzend.Weke ku li bendî wî axiftinê bû lê bibal meyîzend..

Piştî ku mele Serhengê zaxoyî axiftine xwe bidawi kiribû, êdî piştre ne bi gelekî re seyde Avdilrehîmê xaniqî mafê axiftinê hilda bû û peyivî bû.Dema ku ew ji peyivî bû, êdî wî ji ji zanebûnên xwe bidest axiftine xwe

kiribû.Hinekî li ser dîtin û nêrînên xwe axiftibû.Hinekî li ser demên buhurtî axiftibû.Li ser derên ku çûyê de û li wanderan çend mirovên zane dîtibûn û rastî wan hatibû, bahsa wan kir.Dema ku ew axift, pir xweşik axift.her gotinê ku ji devê wî derdiket, weke ku helbestekê bixwêne li duv hevdû bûn, li mirov dihat.

Seyde Avdilrehîmê xaniqî weke demeke dirêj axiftibû.Piştre axiftine xwe bidawi kiribû. Dema ku axiftina xwe bidawi kiribû û mabû sekinî, êdî piştre yê ku pişt wî re dise mafê axiftinê hildabû û axiftibû mele Serhengê zaxoyî bû.Mele Serhengê zaxoyî ji pişt wî re demeke dirêj axiftibû.Mele Serhengê zaxoyî, dema ku axift, wê naqlê ne tenê ji hizir û dîrokê axift.Hinekî ji bûyerên ku di wê demê de dibûn ji, li ser wan ji hinekî axift.Hinekî bahsa wan ji kir.Hinekî hizre xwe ji li ser wan bûyarên ku dibûn anî ser ziman.Ku ew diaxift, Mihamed bi balaka mazin lê dihisand.Heya xwe pir mazin dabû bû ser wî û axiftine wî.Ji axiftine wî Mihamed, li ser herêmê û bûyarên ku li herêmê dibûn, hinekî dî ji fêr bû bû.

Mele serhengê zaxoyî, ku weke demeke axift, êdî piştre ne bi gelekî re ma sekinî.Piştî ku ew ma sekin, êdî pişt wî re weke ku hinekî bêdeng bûn çêbû.Dengê wî û axiftinên wî di serê miorvên li dore wî de bûn.Dengê wî di guhê mirovên li dore wî de zing dikir.Dengekî wî yê zîz hebû.Ku nimz ji axivî bana, bala mirov dikişanda ser xwe di her heyemê de.Bi vê yekê re bala mirovên li dore wî ji çûbû bû ser wî..

Di wê heyeme de, ne tenê hinek mirovên ku bi mele Serhengê zaxoyî re hatibûbûne wir li wir bûn.Pêre ji, gelek mirovên ku weke ku sofî bûn û hertimî ku di dibû ew waxt, êdî rê di girtin di hatina wir hebûn.Ew mirovên ku dihatina wir, yên ku dayimî dihatina wir bûn. Dayimî yên ku li wir li fêran dihisandin bûn.Bi vê yekê re mirov karê bêje ku ew weke wan faqihên ku li wir, hertimî li wir bûn.Bi vê yekê re naskrinek bi wan re di nav xalkê de çêbû bû. Di nav xalkê de di bihatana pirsîn ku di wê heyeme de wê kî li wir bana, wê navê wan bigotan.Bi vê yekê re her weha dihatina naskirin.Her weha navê wan hebû.

Di vir de divêt ku mirov bêje ku rêzek ji wan mirovan re di nav xalkê de hebû.Xalkê li wan û li gotina wan dimeyîzend.Dihisand.Dema ku bahsa wan dihata kirin, bi gelek xosletên baş û qanc re bahsa wan dihata kirin.Ew weke hinek zanistên xweza yên ku di nav xalkê de dihatina dîtin.Her weha bahsa wan dihata kirin.Ew ji zanebûne wan mazin bû.Hertimî li medresê an ji her weha deran, li wanderan diman.Li medresê ji ku di dema fêran de bana an ji di dema axiftin û nîqaşan de bana, ew amede bûn.Ew ji weke

faqahan amede dibûn û dihisandin. Hizrên ku dihatina ser ziman, wan ji di serê xwe de di girtin.Piştre ku derdiketine derve di nav xalkê de, dianîne ser ziman.Xalkê, her weha ji devê wan ji hizrên ku dihatina ser ziman, di bihîstin.Ew, weke qasidên hizrê bûn.Yên ku hertimî, hizrên ku di medresê de hatina ser ziman, bibin û di nav xalkê de di civatan de bênine ser ziman bûn.Bi vê yekê re, weke ku bixweza bi berpirsîyar bûn.Xalkê li wan dihisand û hizre wan ji hêjatîyek di dayê de.Bi vê yekê re navê wan ji hebû.Di wê heyeme de, di dema ku mele Serhengê zaxoyî û Mihamed û seyde Avdilrehîmê xaniqî axift û ew mirovên din ku axiftin, ew li wir bûn. Dihisandin.Hizrên ku dihatina ser ziman, wan ji di serê xwe de digirtin.Ew ji weke hin mirovên ku navserî xwe li wir bûn û dihisandin.Ew, daqihên dayimî bûn.Ew sofîyên medresê bûn.Ew xwûdê nasê xalkê bûn.Bi vê yekê re dihatina naskirin û navê wan hebû.Mele serhengê zaxoyî, ku axiftibû û mabû sekinî, êdî piştre weke qadarekê bêdengî çêbû bû.Lê piştre wê bêdengîyê zêde berdewam ne kiribû.Yê ku ew bêdnegî xirakiribû ji dise ew bû.Piştî axiftine xwe re mafê axiftinê careke dî hilda bû û hinek gotin gotibûn ji bo ku axiftin berdewam bibe.Piştî ku wî her weha hinek gotin ji bo ku axiftin berdewam bibe, êdî piştre ne bi gelekî re yê ku pişt wî re mafê axiftinê hilda û axift seyde Avdilrehîmê xaniqî bû.Dema ku ew axift ji, wî berê xwe da Mihamed û axift.Dema ku wî berê xwe da Mihamed û axift, êdî Mihamed ji fahmkir ku seyde Avdilrehîmê xaniqî dixweze ku bikeve axiftinê de bi wî re.Ku Mihamed her weha fahm kir, êdî piştre wî ji berê xwe baş da wî û di cihê xwe de xwe adiland û weke ku li bendî wî û axifitna wî bê, ma sekinî.Mele Serhengê Serhengê zaxoyî ji ew rewş fahm kir û dema ku fahm kir ji berê xwe da Mihamed û ma sekinî.

Ku seyde Avdilrehîmê xaniqî axift, êdî piştre Mihamed li ser wî û mirovên ku li dore wan bûn, bidest axiftinê kir.Mihamed, dema ku bidest axiftinê kir, hingê, bala mirovên li dore wî hema bêja hemûkan ji li ser wî bû.Mihamed, ku axift, êdî mirovên li dore wî çit ji ti kesekî derneket û lê hisandin.Ew ku axivî, pir xweşik û mazin axift.Ew ku axivî, pir bi zane axift. Mele serhengê zaxoyî berê xwe dabû bû wî û lê dihisand.Mele Serhengê Zaxoyî bidil û kêf lê dimeyîzend û dihisand.Mihamed, Dema ku axift, hingê, ji fahm kirin û têgihiştinê axift.Berî hinegê ji, li ser têgihiştinê bi mirovên li dore xwe re axiftibû bû.Dema ku her weha bi wan re axiftibû ji, Mele Serhengê zaxoyî ji di nav wan mirovên li dore wî ku lê dihisandin bû.Wî hingî lê hisandibû.Di wê heyeme de ji dema ku axiftibû bû, wî lê hisandibû.Mihamed, dema ku axiftibû, ji zirektîya faqayan û mirovên

xwanda bidest axiftinê kiribû.Piştre axiftine xwe ji wir anîbû ser ziman fahmkirin û têgihiştinê.

Den ne, divêt ku mirov li vir, hinekî li ser bisekinê.Di nav xalkê de pir girîngî dihata dayîn ji mirovên ´bifahm´ re.Di nav xalkê de bêja *bifahm* bi gelek awayan dihata bi kar anîn.Bêja li dijî vê bêje ji bêja ´ şevekortiyê´ bû.Bêja şevekortiyê, di wate bi kêr ne hatinê di vir de dihata bi kar anîn.Bêja bifahm bûne ji, ne tenê bi bi wate fahmkirin û têgihiştinê dihata bi kar anîn.Ji xaynî vê yekê ji, di wate zîrektiyê de ji bi kar dihata anîn.Ji ber vê yekê, ev herdû bêja pir girîng bûn.Li ser van herdû bêjayan, pir vegotin û çîrok û çîvanok ji dihatina vegotin.

Di nav xalkê de ji, ti kesekî ne dixwest ku jê re şevekorî bêt gotin.Ji bo ku newê gotin ji, pir hewldide ku xwe bi kar û bar bide nîşandin.Bi vê yekê re, divêt ku mirov bêje ku dema ku ji mirovekî re her weha şevekorî bihatana gotin, hingê, ew gotin, di nav xalkê de ji belav dibû. Êdî wê li ser devê xalkê bana.Mirovan ku ew dîtibana, wê bi anîyana ser ziman.Ji ber vê yekê ji, mirovan hewldide ku ne hêlin ku ew bêja ji wan re werê gotin.

Bi vê yekê re, divêt ku mirov bêje ku heman tişt ji bo bêja bifahm bûnê ji dibuhurî. Mirov ku di nav xalkê de hata naskirin û bi awayekî ku bifahm û zirek hata naskirin, êdî her weha pir bahsa wî dihata kirin.Pir navê wî dihata hildan.Mirovên bifahm û zirek, weke *minaq* bûn.Her timî bahsa wan dihata kirin. Navê wan bi başî û qancî û zirektî dihata ser ziman û hildan.Ku bahsa wan dihata kirin, hingê, li ser wan dihata axiftin.Di nav civatan de bê, an ji di komeke de bê, her weha bahs dihata kirin.Axlabê ji, di vir de divêt ku mirov li ser bahsakirina ku di civatan de dihata kirin bikêt.Ji ber ku di vir de ya herî girîng û mazin di aqilan da dima ji ew bû.Ku di civatan de bahs hata kirin, û nav hata hildan û ku bi başî û qancî hata hildan, êdî wê bi wî awayî ji piştre ji bihatana hildan.Di civatan de, mirovên ku xwedî gotin bûn, yên ku mazin û navserî xwe bûn.Ew mirovên navserî xwe ji, gotina wan hertimî li ser seran dihata hiştin.Qadrê wan dihata girtin.Gotin, ku ji devê wan derket, êdî bi rêzeke mazin dihata pêşwazikirin.Ji ber vê yekê ji, di civatan de ji devê wan, bi başî û qancî hatina ser zimên ji, girîng dibû.Mirov, ku ji devê wan bi başî bahsa wan dihata kirin, êdî wê ew mirovên ku bahsa wan hata kirin, wê rêzeke mazin ji xalkê ji hilda bana.Lê ku di civatan û ji devê wan mirovên navserî xwe de, ne baş bahsa wan hatan krin, êdî wê ji aliyê xalkê ve ji heman nêzîkatî lê bihatana kirin.Ji ber vê yekê ji, ev yeka pir girîng bû.Bi kêrhatî bûn û ne bikêrhatî bûn, ji devê mirovên navserî xwe dihata hisandin.Ku ji devê wan lê hata hisandin ji, êdî ne dihata ji bîr kirin.Hertimî di aqilan de

dima.Divirde, divêt ku mirov bêje ku ya ku mirov bi kêrhatî li ber çavan dide nîşandin ji, kirina mirov bixwe bû.Ku mirovekî ku bi kirin bû, êdî wê her weha bahsa wî bihatana kirin ku ew mirovekî ku bi kirina.Lê ne mirovekî ku bi kirin bû, êdî wê bahsa wî bihatana kirin ku ne mirovekî ku bi kirina.Bi vê yekê re, bêjeyeke dî ji di nav xalkê de derdiket pêş.Ew bêja ji, bêja ´kirinê´ bû.Bi bêja kirinê re, bêja ´bikêhatîbûnê´ dihata bi kar anîn.Bêja bikêrhatîbûnê, bêjeyeke ku bi kevneşopî bû.Li ser vê yekê, divêt ku mirov pir bi sekinê û bêne ser ziman.Bi vê bêjê re, pir hizir û nêzîkatî dihatina ser ziman.Di serê mirovan de ev bêja, bêjeyeke ku di wate wê de hin astên kirinê ji hebûn bû.Ji ber vê yekê divêt ku mirov pir bahsa wê bikê û li ser bisekinê.Ya rastî ev bêja, ku têt ser ziman, ne tenê bi wate xwe têt ser ziman.Bi wate xwe, weke kirineke bi simset têt ser ziman.Bi vê bêjê re, kêrhatîbûn û zirekbûn dihata ser ziman.Bi vê bêjê re, di demên berê de, hin nêzîkatîyên olî ji dihatina şîrove kirin û dihatina ser ziman.´Kirin´, bi wa re xwe re weke rastteqîniyê ji dihata ser ziman. Di hizir û ramanên ku hebûn de, ´rastteqîni´ pir girîng û mazin dihata ser ziman.Rastteqîni, di jiyanê de lê dihata lêgerîn.

Di hizir de weke rastîyekê divêt ku mirov bêne ser ziman.Di nav xalkê de dihata hizir kirin ku ´têgihiştin heya´ û divêt ku mirov xwe bigihêne de.Têgihiştin li dinyê ya.Her weha dihata erê kirin.Bi vê yekê re hewl dihata dayîn ku mirov xwe bigihêniyê de.Rastteqîniye Şahmaran, ku dihata ser ziman, weke rastîyeke têgihiştinê ji dihata ser ziman.Dihata erêkirin ku şahmaran, hizir û têgihiştine gerdûnê hemû pêre ya.Bi vê yekê re mirovê ku xwe bigihêne Şahmaran, wê xwe bigihêne hizir û têgihiştine gerdûnê hemûkî.Bi vê yekê re, hizir ji û têgihiştin ji, du bêjeyên ku weke ku simset bûn.Her weha dihatina dîtin.Bi vê yekê re, dihizre xalkê de, li ser vê yekê çandak bi ramanên xwe re hatibû afirandin.Têgihiştin ji û hizir ji, ji mirov dûr ne dihata şîrove kirin.Di vê çandê de, her weha ji hizir xwe gahandinê têgihiştinê û ji têgihiştinê xwe gahandina hizir û bi vê yekê bi mirov re bi hizir û têgihiştînê re ji xwe gahandina rastteqîniyê ji weke rastîyekê dihata dîtin.Hizir, têgihiştin û rastteqîni, divirde dihata gahandin li hevdû.Di vê gahandina li hevdû de, ´hizre mazin´ di xwe gahandina rasttêqîniyê de dihata dîtin.Ku mirov xwe gahanda rastteqîniyê, hingê, mirov wê xwe gihêne hizre mazin.Hizrê mazin ji, ku dihata ser ziman, bi gelek awayan ji mazin dihata ser ziman. Mirov, ne tenê di serê xwe de hewl dide ku xwe bigihêne wê.Ji xaynî wê ji, di jiyana xwe de ji hewl dide ku xwe bigihêne wê...

Rastî di jiyanê de ya.Jiyan ji raste.Hebûna jiyanê, bi xwe re pir rastiyan ji di demê de di afirêne.Dem, çend ku têve diçê û bi pêşve diçê, avçend ji rastiyên nû diafirêne.Her weha mirov di jiyanê de di nav wan rastiyan de ya.B vê yekê re, derfete mirov heya ku mirov xwe bigihêne cewherê wan rastiyan.Ev yeka dihata pejirandin.Dihata erêkirin.Rastiyên mazin ji hena. Û rastiyên biçûk ji hena.Mirov, bi rastiyên biçûk, hin bi hin xwe digihêne rastiyên mazin, ji ber ku her rastiya biçûk, di xwe de hinekî ji rastiya ya mazin di parezê.Lê ku mirov xwe gahanda rastiya mazin ji, êdî mirov karê xwe bigihêne rastiyan hemûkan.Rastiyek, hemû rastiyan kifş dikê.Ew rastî ji, di cewherê xwe de rastteqîniya.Ti mirov ji ji wê yekê ne dûre.Lê ji bo xwe gahandina wê ji hewldan pêdivê heya.

Her weha rastî û rastitî dihata ser ziman.Bahsa wê dihata kirin.Qadrek ji bi vê yekê re divêt ku mirov bêje ku ji bêja rastitîyê re hebû.Ku bahsa wê dihata kirin, biqadr bahsa wê dihata kirin.Bikêrhatibûn ji, di cewherê xwe de bi hizra xwe re ji vê rastiyê dihata ser ziman, ji vê rastiyê dihata zanîn.Dema ku li mirovan dihata meyîzendin û ji bo wan bêja bikêrhatibûne dihata bi karanîn, hingê, ji wan mirovên ku ew bêja ji bo wan dihata ser ziman, rastbûn ji dihata xwestin.Rastbûn, ji zanebûne dihata zanîn û ser ziman.Bi vê yekê re, dema ku Mihamed bahsa faqayan û bikêrhatibûnê kiribû, ji bahskirina wan çûbû bahskirina hizir.Bi vê yekê re bahsa rastiyê kiribû.Bahsa rêya xwe gahandina rastteqîniyê kiribû.Bahsa rastbûnê kiribû.Her weha dema ku axivî bû ji, kiribû ku bala mirovên li dore wî pir bi hey herine ser wî di wê heyeme de.Mihamed, pir xwandibû.Bi wê xwandina xwe re xwe pir bi zane kiribû. Dema ku Mihamed her weha bidest axiftinê kiribû, mele Serhengê zaxoyî û mirovên din yên li dore wî tenê bala dabûbûnê de û lê dihisandin.Mihamed, bi gotina xwe re ew dibirine cihê ku ew di çûyê de.Mihamed, pir xweşik û zane, zanibû ku biaxivê.Bi wê zanebûne xwe re û hizrên di serê xwe de di wê heyeme de diaxivê, ji mirovên li dore xwe re.Mihamed, her weha weke demeke dirêj diaxivê.Dema ku diaxivê ji, mirovên ku li dore wî bûn, pir bi bal heya xwe didinê de û lê dihisênin.Bala pir didinê de ku wî fahm bikin û têbigihin.Mihamed, ku her weha weke demekê axift, êdî axiftine xwe bidawî kir û ma sekinî.Dema ku ma sekinî, êdî deng ji ti kesekî derneket.Piştî ku ew mabû sekinî, êdî piştî wî re dise yê ku mafê axiftinê hildabû û axiftibû mele Serhengê Zaxoyî bû.Seyde Avdilrehîmê xaniqî ji mabûbû sekin û bala wî li ser Mihamed bû.Li Mihamed dimeyîzend.Piştre, ku weke qadarekê ma sekinî, êdî piştre li Mihamed meyîzend û mafê xaberdanê hilda û axift...

Seyde Avdilrehîmê xaniqî, ku mafê xaberdanê hilda û bidest axiftine xwe kir, di axiftina xwe de ew ji weke Mihamed li ser wan mijarên ku Mihamed li ser axiftibû axift.Ew li ser wan sekinî.Ew ji li ser rastî û rastitîyê rawasta.Mihamed, pir mazin axiftibû.Di axiftine xwe de pir hizir û felsefe anîbû ser ziman.Mirovên li dore wî, yên ku lê dihisandin ji, yên ku mirovne zane û navserî xwe bûn.di wan mirovên wilo de axiftin ji ne hasanî bû.Ew di nav mirovên wilo de axiftibû û bal kişandibû ser xwe di wê heyeme de.

Seyde Avdirehîmê xaniqî ji mirovekî ku mazin bû, zane bû û navserî xwe bû.Wî ji pir xwanda bû û dîtibû.Li pir deveran geraha bû û bi pir zanistên demê re mabû.Hizir û ramana wan zanibû.Dema ku wî ji bidest axiftinê kiribû û li ser hizir û ramanê û rastiyê û rastitîyê rawastaha bû, kiribû bal hemû herine ser wî di wê heyeme de.Wî ji bi zaneti axiftin dikir. Seyde Avdilrehîmê xaniqî, dema ku axiftibû, ji demên ku buhurtibû bûn ji axiftibû.Li ser hizre mazinên ku bi wan re mabû ji sekinî bû.Ji wan ji hinekî hizir û raman û felsefe anîbû ser ziman.Dema ku axiftibû ji bala mirovên li ser wî bû.

Li wir di wê heyeme de pir mirov hebûn.Ne tenê mirovên ku bi mele Serhengê zaxoyî re hatibûbûna wir hebû.Ji xaynî wan ji, faqihên medrese yên ku mazin bûn hemû ji li wir amede bûn.Yên ku aqlê wan dikişandi û karibû ku bigirê, li ser wir bûn û dihisandin.Ji xaynî wan ji, mirovne ku ji wan re hetimî dihatina tamaşa fêran ji di wê heyeme de li wir bûn.Ji xwe, mirovên sofî ji li wir amede bûn.Bi vê yekê re, mirov karê bêje ku li wir, di wê heyeme de li dore wan pir mirov hebûn ku li wan dihisandin.Mirovên ku li wir bûn, Seyde Avdilrehîmê xaniqî nas dikirin.Ji ber ku ew, ew demek bû ku li wir bû.Bi wan re mabû.Le Mihamed ji nûve nas dikirin.Mihamed, hê nûka hatibû wir, nav wan di wê heyemed de.Lê piştî ku Mihamed hatibû wir ji, wilo zêde ti beyentî ne kişandibû.Zû bi mirovên wir re germ bû bû. Bi vê yekê re mirov karê bêje ku êdî li ber çavên hevdû bûn.Êdî gotina wan li hevdû diçû.Gotin li hevdû çûbûn, gotineke ku pir girînge di nav mirovên zane û xalkê de ji.Mirovên ku gotina ji hev re diçû, yên ku yên hevdû bûn û yên ku ji hev re weke bavûbira bûn.Mirovên ku li wir hemû ji, gotina wan li hevdû diçû.Bi vê yekê re mirov karê bêje ku mirovên ku ji hev re pir başbûn bûn.Başbûn, temenê xwe li ser hestên hizir û naskirinê di dêne.Bi vê yekê re mirov karê bêje ku bi gotin li hevdû çûbûne re hestên wan yên ku hebûn ji, ji aliyê hevdû ve dihatina fahm kirin.Her weha li hevdû çûbûn, bêjeyeke ku girîng bû.Di nav xalkê de pir dihata bikar anîn.Ji mirovên ku ji hevdû re başbûn û pir ji jev re qancbûn re dihata gotin.

Seyde Avdilrehîmê xaniqî, piştî ku bidest axiftine xwe kiribû, êdî piştre kiribû ku bala mirovên li dore wî hemû, herine ser wî di wê heyeme de.Seyde Avdilrehîmê xaniqî pir zanibû ku axivê.Zimanê wî ji xweş bû.Ku diaxift, bi wî zimanê xwe yê xweş û dengê xwe yê xweş bala mirov di cih de dikişanda ser xwe di her heyeme de.Bi vê yekê re mirov karê bêje ku di wê heyeme de ji bala mirovên li dore xwe hemûkan kişandibû ser xwe di wê heyeme de. Mirovên ku dîtibe û xwanda bê, zane bû biaxivê.Dîtin, zanisteke mazin dike serê mirov de. Pêre ji, xwandi ji ku bû, êdî di serê mirov mejiyekî ku afrîner çêdibe.Her weha dibêt ku mirov bêje ku di fêrkirinê de cihê dîtinê, pir girînge.Seyde Avdilrehîmê xaniqî ji pir dîtibû.Ji dîtin xwe, ku diaxift diaxivî.Di wê heyeme de ji, ji dîtina xwe diaxift û pir bizane diaxift.Bi vê yekê re mirov karê bêje ku ew pir mazin diaxift.Di wê heyeme ku bidest axiftinê kiribû de, bala mirovên li dore wî hemûkan li ser wî bû.Dema k Mihamed axiftibû, çend ku bala mirovan li ser wî bû, avçend ji her weha bala mirovan li ser wî ji bû dî wê heyeme de.Bi zêdeyî ji ku li mirovên ku lê dihisandin dihata meyîzendin, dihata dîtin ku weke ku çawa ku Mihamed di dema axiftina xwe de yên ku lê hisandin bûn biribûbûna dûr, her weha wî ji di dema axiftina xwe de ew dûr biribû bûn.Di wê heyeme de, her gotine ku ji devê wî derdiket ji, di serê mirovên ku lê dihisandin de naqş dibû.Bi gotinên xwe re seyde Avdilrehîmê xaniqî, di serê mirovên li dore xwe de ew ji dinyeyekê biribû bûne dinyeyeke din.Her weha rewşek afirî bû di wê heyeme de.Seyde Avdilrehîmê xaniqî ku her weha weke demekê axift, êdî piştre axiftine xwe bidawi kir û ma sekinî di cihê xwe de di wê heyeme de.

Piştre ku Seyde Avdilrehîmê xaniqî ma sekinî ji, bala mirovan li ser wî bû.Bala Mihamed ji li ser wî bû.Mihamed weke ku di serê xwe de bi hziir ji bû.Lê bi wê hizirkirine xwe re bala wî li ser seyde Avdilrehîmê xaniqî bû.Lê dimeyîzend.Seyde Avdilrehîmê xaniqî, li ser rastî û rastitîyê û rastteqîniyê axiftineke ku pir xweşik û biaqil kiribû.Gotinên ku ji devê wî derketibû bûn, di serê mirovên li dore wî de diçûn û dihatin.

Piştî ku seyde Avdilrehîmê xaniqî axiftine xwe bidawi kir û ma sekinî piştre êdî ne bi gelekî re, mele Serhengê zaxoyî mafê axiftinê hilda û bidest axiftinê kir.Dema ku wî bidest axiftinê kir, pêşî li seyde Avdilrehîmê xaniqî zivirî û gotiyê de ´ti pir bizane û xweşik li ser rastteqîniyê axiftî´.Dema ku wî wilo jê re got, êdî ew ji ma sekinî di cihê xwe de.Ti gotin ji devê wî derneket.Weke ku mafê xaberdanê û gotin gotinê ji wan re bihêle ma sekinî.Mele Serhengê zaxoyî ku bidest axiftinê kir, wî ji weke Mihamed û Seyde Avdilrehîmê xaniqî li ser rastiyê û hizir rawastaha û

axift.Lê divir de divêt ku mirov tiştekî bêje.Ew ji, her weha ew bû ku divêt ku mirov bêje ku çend ku dema ku Mihamed axiftibû û bala mele Serhengê zaxoyî li ser wî bû, her weha di dema axiftina seyde Avdilrehîmê xaniqî de ji li ser wî û di wê heyeme ku ew diaxift de ji, çend ku diaxift û hişê wî di serî wî de li ser axiftinê wî ji bû, wilo ji hinekî ji weke ku li ser Mihamed bû.Her weha dihata ber çavan û xuyakirin.Berê wî li Mihamed bû. Lê dimeyîzend.Mihamed ji, ne ku ev yeka farq ne dikir.Farq dikir.Lê deynedikir.Ti gotin ji devê wî dernediket.Bêdeng bû di cihê xwe de di wê heyeme de.

Mele Serhengê zaxoyî, ku weke demeke axift, piştre axiftine xwe bidawi kir û ma sekinî. Piştre ku ew ma sekinî ji, bal li ser wî bûn.Mirovên ku li wir bûn, çavên wan li ser wî bû.Li wî dimeyîzendin.Mihamed ji lê dimeyîzed.Piştî ku wî axiftine xwe bidawi kiribû û ma sekinî, êdî piştre weke demekê bêdengî di nav wan de çêbû bû.Lê wê bêdengîyê zêde her weha berdewam ne kiribû.Piştre dise axiftin di nav wan de çêbû bû.Lê wê naqlê ji, axiftina ku di nav wan de çêbû bû, bi nîqaşkirine di nav wan de berdewam kiribû.Li wir, di wê heyeme de, mirovên ku karîbûn ku gotin bigotina û niqaş kiribana gelek bûn.Piştî ku mele Serhengê zaxoyî axiftine xwe bidawi kiribû, êdî piştre ne bi gelekî re ku ew ji di nav de niqaş di nav wan de çêbû bû.Mihamed, di cihê xwe de bi bêdeng bû.Di hisand.Seyde Avdilrehîmê xaniqî ji bala wî li Mihamed bû.Li wî dimeyîzend.Ew sekne Mihamed ya di bêdengîyê de, dibû weke dîmenekî li ber nerîne seyde Avdilrehîmê xaniqî..

Ku her weha niqaşê di nav wan de dest pê kiribû û ketibûbûne niqaşê de, êdî her weha weke demekê di nav xwe de niqaş kiribûn.Dema ku niqaş kiribûn ji, li ser gelek tişt û hizran niqaş kiribûn.Kê çi zanebûne wî hebû, di wê heyeme de ji mirovên li dore xwe re dianî hole û ji wan re divegot.Bi vê yekê û awayî re, niqaşê di nav wan de weke demekê berdewam kir. Mihamed ji, bi bêdeng bû.Zêde wilo ti gotin di dema niqaşan de ji nav lêvên wî derneketin. Tenê li mirovên ku diaxiftin dihisand.Li gotine wan dihisand.Li wan dihisandin ku ka çi dibêjin û çawa dibêjin.Ji wê pêve di wê heyeme de wî ti tiştek ne kir.Bi vê yekê re, çend ku niqaş mazin dibû û hizir derdiketine hole û mirovan hizre xwe li ser wan hizran ji divegot, bal diçûne ser Mihamed ji.Hizre wî mereq dihata kirin, ku ka ew di derbarê wan mijar û hizrên ku wan hizre xwe li ser anîye ser ziman, ew çi dihizire û hizre wî çiya.Her weha mereq ji di derbarê hizre wî de ji çêdibûn.Lê Mihamed bi bêdeng bû.Di hizirî.Di serê xwe de dihizirî.Di serê xwe de

weke ku ne li wir bê, dihata berçavan.Dema ku mirov lê dimeyîzend, her weha têdigihişt.Mirov fahm dikir.

Niqaş û danûstandin, her weha di nav wan de weke demekê berdewam kir.Piştre ku demek têve çûbû, êdî hin bi hin ji xwe re niqaşkirin kêm bû.Mirovên ku di serî de di niqaşê de aqtiv bûn, êdî ne weke di dema serî de aqtiv bûn.Ew ji êdî hinekî bi bêdeng bûn.Mele Serhengê zaxoyî ji ev yek fahm kir.Êdî hinekî weke ku wastandin çêbû bû.Weke ku mejiyê wan wastaha bû.Bi vê yekê re, ku weke qadarekê dem ji têve çûbû, êdî zêde wilo niqaş nema bû. Lê niqaşkirin hê ji dibû.Yên ku hê gotin digotin hebûn.Bi vê yekê re, ku wê rewşê weke kêlîkêke berdeam kir, êdî piştre ji derve xaber hat ku wa mîr ji bi mirovên li dore xwe re û bi mêhevanên wî yên ku hene wê bi ber medrese ve têt.Dema ku wilo xaber hata ji mele Serhengê zaxoyî re û mirovên li dore wî re, êdî weke ku awartebûne di nav wan de çêbibe li wan hat.Piştre, ku her weha xaber hat, êdî ne bi gelekî wan ji dît ku wan mîr bi mirovên bi pêre ne, wa kete hundurê hewşa medresê de.Ku ew hatin û ketine û ketine hewşa medresê de, êdî bi mele Serhengê zaxoyî re, mirovên ku li wir bûn hemûkan bi hev re dana xwe ku rabine ser xwe û herine pêşîya wan û wan pêşwazi bikin.

Ku mele serhengê zaxoyî û mirovên ku li dore wî bûn, ku dîtin ku wa mîr di nav gelek mirovan de wê têt, êdî ji ber xwe rabûna ser xwe û kirin ku bi ber wan herin û wan pêşwazi bikin.Dema ku rabûne ser xwe, mele serhengê zaxoyî êdî kete pêşiye civatê de û ku Mihamed ji di rax wî de, ketine ser rê de û bi ber wan ve çûn.Dema ku ew ji çûn, êdî li devê derî gahana hevdû û devê hevdû girtin û silav dana hevdû û destê hevdû û piştre ketine nav hevdû de û dana rax hevdû ku careke dî werine hundur û bi hev re ji xwe re rûnihin.Mihamed di wê heyeme de di rax mele Serhengê zaxoyî de bû.Seyde Avdilrehîmê xaniqî ji di rax wî de bû.Bi wan re ji, li dore wan gelek mirov hebûn.Dema ku derketibûbûna derve, êdî bi hev re ku faqihên ku hene ji di nav wan de ketibûbûna, çûna pêşiye mîr di wê heyeme de.Mîr, dema ku hatibû, pêre gelek mirov hebûn.Li dore wî pir mirov hebûn.Gelek ji wan mirovên ku pêre bûn, mêhvanên wî bûn.Yên ku ji deverên dûr û çûr bi çûr hatibûn bûn.Ew ji pêre hatibûn wir ku li mele Serhengê zaxoyî di dergaha wî de lê rûnihin.Mele Serhengê zaxoyî mirovekî ku mazin bû.Pir mirovan ew nas dikir.Gelek mirovên ku navê wî bihîstibûn û ew ne dîtibûn ji hebûn. Ew ji, ew cara pêşî bû ku ew di dîtin.

Ku mîr û yên ku pêre ne, hatina pêşswazikirin, êdî bi hev re buhurtine hundur û li hundur bi hev re rûniştin.Dema ku mîr hatibû wir, êdî weke ku rewşeke awarte ji xwe re werê avabûn, bû bû.Mîr, bixwe, di wê heyemê

de mirovên ku rêz ne didanê de ne bûn.Di nav xalkê de mîr, xwediyê rêz û hûrmeteke ku mazin bû.Dema ku ew hata wir, hingî, ji wê pêşwazikirna wî ev yeka pir baş û qanc dihata têgihiştin. Mîr, di nav xalkê de xwediyê hebûneke mazin bû.Ji ber vê yekê, çend ku berî nahaka em li ser wê hebûnê sekinî ji bûn, dise divêt ku mirov li vir, du sê gotinan li ser bêne ser ziman.Çend ku li ser werê ser ziman, di cihê xwe de ya.Ji ber ku hebûne mîr mazin bû.Mîr, bi hebûn, çand, kevneşopî û hebûne hizre xwe re, di nav xalkê de weke nirxeke mazin bû.Her weha ew dihata ser ziman.Mîr bi xwe ji, dema ku lê dihata meyîzendîn, ev yeka ji wan nerînên li ser pir baş dihata fahmkirin.Mîr mazin bû.Mîr biasl bû.Mîr xwedi nirx û hizir bû.Xwedî dîrok bû.Mîrîtî, bi hebûne xwe ya dîrokî re, xwediyê dîrokeke ku ne bin pênc hezar salan re bû.Her weha mazin bû.Her weha bi kevneşopî bû.Her weha bi hizir bû.Mîrîtî, dema ku mirov bahsa wê dikê, divêt ku mirov zanibe ku mirov bahsa çandaka mazina e dîrokî, hizreke mazina e dîrokî, kevneşopîyeke mazin ku di hundurê xwe de pir keneşopîyên demên berê û dîrokî di pareze, mirov bahsa wê dikê.Her weha mirov divêt ku mîrîtîyê mazin bêne ser ziman.Kengî, mazin hata ser ziman, hingî, wê li ser hebûne xwe ya ku heya wê werê ser ziman.Di wê demê de, dema ku mîr hata pêşwazikirin, hingî mirov fahmdikir ku çend rêzeke mazin bi vê yekê re jê re hebû.Mîr, Dema ku hat, çend ku mirovên mazin bûn ji, hemû li ber wî rabûne ser xwe û çûne pêşîye wî ku wî pêşwazi bikin.Bi vê yekê re, mirov divêt ku wê mazin şîrove bike.Piştre ku mîr û yên ku pêre ne, ku hatibûbûne wir, êdî piştre ku hatibûbûne pêşwazikirin ji, êdî piştre di cih de buhurtibûbûne hundur û li hevdû rûnihin.Dema ku ji hewşê kiribûn ku herine hundur, mirovên ku li wir bûn, hem yên ku bi mele Serhengê zaxoyî re bûn û hem ji yên ku bi mîr re hatibûbûn, bi hev re rê dana mîr û mele Serhengê zaxoyî ku bikevine rax hevdû û ew ji bidine dore wan û ku ew li pêşîye wan bi hev re herine hundur û li hevdû ji xwe re rûnihin.Piştî ku her weha hata kirin, êdî piştre mîr û mele Serhengê zaxoyî ku di rax hevdû re û mirovên ku li wir hemû ji li dore wan, bi hev re ketine rê de û hatina hundur.Ku hatina hundur, êdî li hundur bi hev re li hevdû rûniştin. Dema ku rûniştin ji, dise mele Serhengê zaxoyî li cihê xwe rûnişt û mîr ji di rax wî de li pêşîye civatê rûnişt.Mihamed û Seyde Avdilrehîmê xaniqî ji, her yekê li aliyekî li nêzîkî wan rûniştin. Herdûk ji li ber çavan bûn.Herkesekî, çawa ku mîr û mele Serhengê zaxoyî di dîtin, her weha ew ji dî dîtin.Ew ji weke wan li ber çavan bûn.

Mîr û yên ku pêre ne, ku hatina pêşwazikirin û hatina hundur û li hundur rûniştin, êdî bi hev re di nav wan de axiftin dest pê kir.Mele

Serhengê zaxoyî û mîr bi hev re pêşengitî ji danûstadinên ku dibûn re dikirin.Yên li dore wan ji, li wan dimeyîzendin û li gor wan gavavêtinên xwe dikirin.Mele serhengê Zaxoyî, mirovekî ku mazina bû.Mîr ji mirovekî ku mazin bû.Mirovên ku li dore wan ji bûn, yên ku navserî xwe bûn, yên ku zane bûn.Dema ku bidest axiftinê kirin, êdî mele Serhengê zaxoyî û mîr kir.Lê pêşî, mîr zêde wilo xwe ne da nav axiftinê.Weke ku bixweze rewşe axiftinê, pêşî têbigihê û piştre biaxivê.

Yê ku pêşî ji danûstaninan re pêşengitî dikir ji, mele Serhengê Zaxoyî bû.Dema ku wî bidest axiftinê kir, êdî gelek mirovên ku li dore wî bûn ji, kirin ku têvlî axiftinê bibin.Yên ku kirin ku tevlî axiftinê bibin ji,mirovên ku navserî xwe bûn.Pîr bûn û bizane bûn.Rêz ji wan mirovên wilo re pir hebû.Mîr ji bana û ku kî ji bana, li ber wan bêhûrmetî û bêrêzî ne dikir. Nikarîbû ku bikirina ji.Ku kiribana, wê ji aliyê xalkê ve ji, pir bihatana raxne kirin.Di vir de, divêt ku mirov bêje, ku mîr ji bana û mirovek ji xalkê ji bana, pêşî lê dihata meyîzendin ku ka li ber mazinên xwe çawa ya û çend bihûrmet û birêze.Dema ku lê dihata meyîzendin û ku her weha ew birêz û hûrmet dihata dîtin, êdî li ber wan ji bi hûrmet û rêz dihata sekinan din.Lê ku ew rêz û hûrmet bi wan re ne hatibana dîtin, êdî li ber wan bi rêz û hûrmet ne dihata sekinandin.Ji xaynî wê yekê ji, raxnên pir giren ji li wan dihatina girtin.Dema ku ew wilo bê rêz û hûrmet dihatina dîtin, êdî di nav civatan de ji, ew bêrêz û bêhûrmetbûna wan dihata ser ziman û piştre ji di nav xalkê de ji, ku haya ku sax ban ji wê navê wan bi bêrêz girtin û bêhûrmet girtin wê bihatana ser ziman.Wê wilo bahsa wan bihatana kirin.Bi vê yekê re, wê hertimî ji, ku ew li kuderê bihatan dîtin, wê raxne li wan bihatana girtin.

Bi vê yekê re, divêt ku mirov bêje ku rêzeke mazina li hevberê mirovên ku pîr hebûn.Ew bêgotin birêz û hûrmet bûn.Li ber wan ne dihata sekinandin.Ku yekî li ber wan sekinî bana, ku dê û bavê wî bana, wê raxnên mazin lê hatibana girtin.

Li wir, di wê heyeme de, dema ku mele Serhengê zaxoyî axiftibû, mirovên ku li wir bûn hemûkan birêz û bi bêdeng lê dihisand.Deng ji ti kesekî di wê heyeme de dernediket.Herkesek di cihê xwe de bi bêdeng bûn.Faqihên ku li wir diman ji, li wir bi bêdeng li mirovên ku di civatê de diaxiftin dihisandin.Li wan dihisandin ku ka çi dibêjin.De ne, divêt ku mirov bêje ku dema ku ew derketibana derve, wê ji wan ji bihatana pirsîn ku ka ma ka di civatê de çi hata axiftin.Divîbû ku wî ji bersive wan bidana.Ev yek, jê re weke mesûlîyetekê bû.Divîbû ku bigotina.Divîbû ku bifahm bigotina.Dema ku wî gotibana ne nizanim an ji nayê bîre min,

hingî, wê jê re bihatana gotin ku ti şevekorî yî.Mirovên şevekorî, yên ku his ji bikin fahm nekin in.Yên ku ji aliyê têgihiştinê ve kêm bûn.Her weha dihatina dîtin.Ji ber vê yekê, ti kesekî ne dixwest k weke ku şevekorî bê, bêt dîtin an ji naskirin.Bi vê yekê re divêt ku mirov bêje ku li faqihan ji pir bi bal dihata nerintin.Pir bal li wan dihata meyîzendin.Li wan dihata meyîzendin ku ka jîrin an ji nejîrin.Bifahm in an ji bêfahm in.Di serî de ku çawa bihatan naskirin, êdî ew naskirin wek qiyetekê li ser wan hebû ku mabana.Ji ber vê yekê, herkesekî hewl dide ku xwe jîr û baş bide nişandin.Di serî de, ev yek ji faqihan dihata xwestin.Vêce, mirov ku faqih bê û li cem mirovên weke mele Serhengê zaxoyî û wan faqih bê, êdî pir di nav xalkê de li ser vê yekê dihata sekinandin.Ew mirovên zane bûn.ne mumkun bû ku mirovên li cem wan bêaqil mabana.Li dore mirovên wilo mazin, hertimî civate mazin ku ji mirovên zanist û yên ku navserî xwe pêkdihat li dar bû.Ew ji, dema ku civat li dar diket, amede dibûn û dihisandin.Seydeyê wan, çi got û ne got, wan ji di serê xwe de qeyd dikir.Bi vê yekê re, wan ji hizir di serê de çêdikir.Bi vê yekê re, li wan dihata meyîzendin ku ka çend jîrin an ji nejîrin. Jîrbûn, weke ku xwediyê hinek astan bû.Bi di serî de girtinê re û têgihiştinê re xwediyê hinek astan bû.Di wê heyeme de, piştî ku mîr ji hatibû wir, êdî mirovên ku li wir bûn, hemûkan ji li wir li civatê bûbû bûne kom û bala xwe bi hey dabûbûna ser wan û axiftina wan.Çi gotin ji devê wan derdiket, di serê mirovên ku li wir de cih û war digirt.Mirovên li wir bûn, mirovên ku zane bûn.Ji ber vê yekê ji, ku axivîban, wê ne vala û bêwate wê axivîban.Wê tişî û bi wate axivî ban.Herkesek ji di vê qiyetê de bû.Ji ber vê yekê ji, bala herkesekî li ser wan bû û axiftina wan bû ku ka wê çi biaxivin di wê heyeme de.

Mîr, piştî ku mirovên ku li dore wî bûn re, ku hatibûbû wir û ketibûbûne nav wan de û di nav wan de rûniştibû bûn, êdî ne bi gelekî re ji xwe re bi hev re bidest axiftinê kiribûn.Mele Serhengê Zaxoyî, yên ku axiftin dabûbû dest pê kirin.Piştre, hinek mirovên li dore wan ji, kiribûn ku tevlî wî bibin û axiftinê bikin.Mirovên ku li wir bûn, yên ku di civatan de bi destût bûn û yên ku karibûn ku biaxivin bûn.Yên ku navserî xwe bûn.Yên ku hertimî gava pêşî ya wan bû bûn.Bi vê yekê re mirov karê bêje ku ew mirovne ku bi serbixwe bûn.Bi gotinê xwe û axiftine xwe, mirovne ku bi serbixwe bûn.

Di wê heyeme de, dema ku axiftinê di nav wan de dest pê kiribû, êdî pêşî, hinekî mele serhengê zaxoyî mafê axiftinê hilda bû û hinekî li ser axiftinên wan yên ku berî wan di wan de bûbû bûn axift.Weke ku ji wan re bêje, em berî wa li ser van mijaran axiftin, bahsa wê axiftine xwe ya

berê kir.Piştî ku mele Serhengê zaxoyî hinekî her weha axift, êdî piştre ne bi gelekî re, mîr tevlî axiftine wî bû.Lê mîr dema k tevlî axiftine wî bû, wilo zêde ti axiftin ji ne kir.Çend gotin vegotin û piştre ma sekinî.Weke ku mafê axiftinê ji wan miorvên zane yên li dore xwe re bihêle ma sekinî.Dema ku her weha mîr ma sekinî, êdî wan mirovên li dore wî ji ev yeka fahm kir.Fahmkirin ku mîr mafê axiftinê ji zanistan re hişt.Lê dema ku mîr sekinî û bêdeng ma, ti lavz ji ti kesekî derneket.Herkesek mabû sekinî.Ew sekinandin, ji rêzeke dihat. Mîr ji wan re hiştibû û weke ku ew ji mîr re bihêlin mabû bûbûne sekinî.Her weha weke qadarekê bêdeng ji di nav wan de çêbû.Lê wê bêdengîyê di nav wan de zêde berdewam ne kir.Vê naqlê, yê ku axift û ew bêdeng zira kir, seyde Avdilrehîmê xaniqî bû.Wî mafê axiftinê hilda û pêşî hinekî gotinên baş û qanc ji bo mîr anînien ser ziman û piştre hinekî ji axiftinên xwe yên berî wê demê berdewam kir û axift.Dema ku axift ji bala herkesekî li ser bû.bala mîr ji li ser wî bû.Mîr ji balaka mazin dabû bû ser wî di wê heyeme de.Weke ku bixweze ku ka ew çi diaxivê fahm bike û têbigihê lê bibal lê dihisand.Mele Serhengê Zaxoyî ji bi bêdeng lê dihisand.Seyde Avdilrehîmê xaniqî, ku axift, ew axiftinê wî wilo li mirovan xweş hatibû ew di cih de geş û mêrş kiribûn.Weke ku ew mirovên li dore wî ji, bi careke re werine xwe li wan hatibû.Her weha geşbûn çêbû bû.

Mihamed ji wilo lê hatibû.Ew ji di cihê xwe de bi bêdeng bû.Lê bi wê axiftine seyde Avdilrehîmê xaniqî, weke ku ew ji bi careke re werê xwe lê hatibû.Mihamed, di wê heyemede, weke ku ji wan hizirkirinên di weke demekê dûr bikeve lê hatibû.Weke mirovekî ku di demekê de di cihê xwe de bi ponijê û weke qadarekê ji xwe herê û piştre her weha bi rewşekê re werê xwe, lê hatibû bû.Herweha Mihamed lê hatibû.Mihamed, di wê heyeme de lê dise ne ku ne bi hizir bû.Bi hizir bû.Di serê xwe de dihizirî.Lê belê, di wê heyeme de wê naqlê bala wî hatibû ser axiftinan.Seyde Avdilrehîmê xaniqî wilo xweş zanibû ku biaxivê, ku di axift, weke ku helbestekê bixwêne li mirovên li dore wî dihat.Her weha li mirovên li dore wî dihat.Wî pir zanibû ku biaxivê û lev bêne.Bi xweşikzanîn axiftine xwe û levanîna xwe, bala mirovên li dore xwe kişandibû ser xwe di wê heyeme de.Mihamed ji weke wan mirovên li dore wî bala wan çûbû bû ser wî.Seyde Avdilrehîmê xaniqî, bi wê xweşikaxiftina xwe re geşbûnek di wan de dabû çêkirin û niqaş û axiftin dabû bû dest pê kirin.Bi vê yekê re ji, di nav wan de axiftin û danûstandinê dest pê kiribû.Bi mele Serhengê zaxoyî re êdî gelek mirovên din ji tevlî bûn û niqaşê di nav wan de dest pê kir.Mîr ji ku piştî wê xweşik axiftine seyde Avdilrehîmê xaniqî re ma

sekinî, êdî piştre ne bi gelekî re tevlî axiftinan bû.Mîr, dema ku hatibû û ketibû hudurû de û ku hê ku ne rûniştibûn, bala wî çûbû bû ser Mihamed.Çavên wî çûbû bûne ser Mihamed di wê heyeme de.Bi wê yekê re, êdî wî ji bala xwe ji ser wî ne vekiribû.Bala wî li ser Mihamed bû.Mihamed di cihê xwe de rûniştî bû û bi bêdeng bû.Deng jê dernediket.Lê Mîr zanibû ku ew çend bi zanebûne û çend hizrekî ku mazin di serê wî de heya.Hê ku ew ji nûkava hatibûbûna wir, wî aw biribûbûna qasrê û li qasrê dabûbûna rûnandin û hingî, lê hisandibû.Hingî, dîtibû ku ewçend bi zanebûne.Ew rewş li ser çavên wî bûn.Mîr, dema ku li Mihamed dimeyîzend, ew rewş hemû di ber çavên wî de dibuhurî û diçû di wê heyeme de.Weke avaka ku di nivîna xwe de bidil û geş biharikê û herê û xuraxurekê ji nava xwe bêne, her weha ew dem, di ber çavên mîr de ji diçûn û dibuhurîn.Bi vê yekê re çavên wî li ser Mihamed bûn.Li Mihamed dimeyîzend.Lê belê weke ku di serê xwe de tiştekî dî di hişê wî de bû.Weke ku ne ew dema ku ew di wê kêlîkê de li wir rûniî bû, li bîre wî bû di hişê wî de bû.Weke ku ew dema ku ew bi hev re li qasrê li hevdû di civate hevdû de rûniştî bûn, li bîre wî bû, di hişê wî de bû.Her weha dihata xuyakirin.Dema ku li Mihamed di meyîzend, jidil û kur lê dimeyîzend.Pir kur lê dimeyîzend.Dema ku mirov li rudêna mîr di meyîzend, mirov ev yeka di wê heyeme de pir baş û qanc fahmdikir û têdigihişt.Mirov dî dît ku mîr çend jidil û kur lê dimeyîzenê..

Mihamed, weke ku lê wê meyîzendine mîr bihey bû.Wilo dihata xuyakirin.Wilo dihata dîtin.Wilo dihata berçavan.di wê heyeme de, mîr wilo bi hey lê dimeyîzend.Lê ku Mihamed ji her weha ew hevbûn kifş kiribû, êdî bala wî ji çûbû bû ser Mîr di wê heyeme de.Ew ji êdî di serê xwe de li wî bihey bû û ew ji di serê xwe de li wî bihey bû.Her weha herdû li hevdû bi heu bûn.Dibêt ku di wê dema ku mele Serhengê zaxoyî di axivî heya wan ne li ser wî ji bû. Dibêt ku wî çi digot wan deng ji ne dikir.Mihamed, bi bêdeng bû û dihizirî û dimeyîzend û mîr bi bêdeng bû û dihzirî û dimeyîzend.Herdûk ji her weha bi bêdengbûn û bihizir bûn û dimeyîzendin.Pir jidil û kur ji dimeyîzendin.

Mihamed, di wê heyeme de ji wê rewşa xwe ya bihzir û bi meyz, weke ku bi hilçenê lê hat.Bi careke re serê xwe hinekî dî ji rakir û li dore xwe meyîzend.Dît ku wan Mele Silhatinê kal wê diaxivê,Berî wî, mele Serhengê zaxoyî diaxift.Wî axiftina xwe bidawi kirya û mele Silhatinê kal mafê axiftina hilda ya û nahaka di axivê.Mihamed, di wê heyeme de fahm kir ku hinekî ji xwe çûya.Hinekî hişê wî ji wî çûya derne din.Dê heyeme de, weke ku werê hişê xwe lê hatibû.Dema ku Mihamed wilo lê hat, weke

ku werê xwe lê hat, ev yeka ji bala mele Serhengê zaxoyî ne ravî.Lê mele Serhengê zaxoyî, di wê heyeme de heya wî li ser axiftvanan bû.Kî çi diaxift ew li ser wê bihey bû.Kî dikir ku biaxivê ew li ser wê bi hey bû.Di wê heyeme de, dema ku Mihamed her weha li xwe anîbû û geşbû bû, êdî mele Serhengê zaxoyî ew lixwe anîbûn û geşbûn weke ku Mihamed xwe amede bike ji bo axxiftinê fahm kiribû.Wilo fahm kiribû.Dema ku wî wilo fahmkir, êdî wî ji bala xwe da bûbû ser wî di wê heyeme de.Mele Serhengê zaxoyî, ku wilo di Mihamed de kifş kir, êdî bala wî li ser wî bû.Weke ku li firsandekê digerehe ku mafê axiftinê bêne ji Mihamed re sekinî bû.Lê miorvên ku diaxift ji di wê heyeme de mele Silhatinê kal bû.Ew ji mirovekî ku zane bû.Pir xwanda bû.Pir dîtibû.Ew ji pir geraha bû.Wî ji pir cih û war dîtibûn.Li wan cihên ku dîtibû ji, li gelekan ji demên dirêj mabû.Piştre hatibû bû wê herêmê.Mele Serhengê zaxoyî, de ne, pir bi bal bû li Mihamed.Wî hij Mihamed dikir.Cihê Mihamed di wî de mazin bû.Hê ku li cizre bota ji, weke demekê bi hev re mabû bûn.Li wir, wî Mihamed baştir naskiribû.Xosletên wî fêrkiribûn.

Li cizîre bota, mele Serhengê zaxoyî, wê dema ku li wir mabû, bi Mihamed re mabû û ew nas kiribû.Ew pir baş û qanc naskiribû.Hizre wî fêrkiribû.Ew çend bizane ya, hingî wî fahm kiribû.Piştre ku hatibûbûna wir ji, ku li qasrê Mihamed axiftibû, hê bêhtir ew naskiribû.Dîtibû ku Mihamed di nav civatan de çend bizanebûn diaxivê.Li qasrê, di wê dema ku ji nûkava hatibûn, hê ku wilo wastahî bûn, çûbûbûna qasre mîr û lê rûniştibûbûn.Mîr qadrê wan mazin girtibûbû.Di wê demê de Mihamed, dema ku axiftibû, bi axiftine xwe re weke ku ji mirovên dore xwe re bide nişandin ku çend bi zanebûne axivî bû.Herkesekê li wir ji, ew naskiribûn, fahmkiribûn ku ew çend bi zanebûne û di serê xwe de bihzire.Mele Serhengê zaxoyî, di mirovên li wir de, yê herî baş ew nasdikir bû.Ji ber ku li Cizîre bota ew bi hev re mabû bûn. Mele Serhengê zaxoyî bi vê hizrê bû ji bo wî di wê heyeme de.Ji ber vê yekê ji, dema ku wî wilo kifş kiribû di Mihamed de, êdî bala wî çûbû bû ser wî.Wî ji dixwest ku Mihamed biaxivê di nav civatê de.Bi wê xwesteke xwe re li wî dimeyîzend.Mele Serhengê zaxoyî, piştî ku wilo di Mihamed de kifş kiribû, êdî lê bi hey bû.Bi vê yekê re, heya wî zêde li dore wî ji weke ku nema bû.Mele Silhatinê kal, ku weke qadarekê axift, êdî ma sekinî.Dema ku ew ma sekinî, êdî ne wilo biaxiftinên dirêj lê bi axiftinên kin, hinek mirovên din ji hinek gotin pişt wî re gotin. Ku hinekan wilo axiftin, êdî piştre weke ku bal çûna ser Mele Serhengê zaxoyî û mîr. Lê mele Serhengê zaxoyî ji berê xwe da Mihamed û kir ku jê bixweze ku ew biaxivê.

Dema ku mele serhengê zaxoyî Mihamed wilo bixwe dîtibû, êdî bala wî çûbû ser wî di wê heyeme de.Lê piştre ku mirovên ku axiftibûn ku axiftinên xwe kiribûn, êdî balên wan çûbû bûna ser wî di wê heyeme de.Lê di wê heyeme de bala wî li ser Mihamed bû.Dema ku wî Mihamed her weha wilo li xwe û bixwe dîtibû, êdî bala wî çûbû bû ser wî di wê heyeme de.Bi vê yekê re, dema ku bal çûbûbûna ser wî, êdî ew balbûna wî bala mirovên li dore wî ji kişandi bû.Wan ji êdî bala xwe dabû bû wî di wê heyeme de.Mele Serhengê Zaxoyî, weke ku bike ku biaxivê li xwe anîbû di wê heyema ku bala wî çûbû bû ser Mihamed.Weke ku wê tişte vebêje li xwe dide der.Mirovên li dore wî ji, her weha fahmdikirin û têdigihiştin.Wê rewşê, weke qadarekê berdewam kir.Lê zêde dirêj ji berdewam ne kir.Kin berdewam kir.Ku bala mele Serhengê zaxoyî çûbû bû ser Mihamed û weke k wê biaxivê li xwe anîbû, êdî mirovên li dore wî ji, weke ku li bendî wî û axiftinê bûn lê dimeyîzendin.Mele Serhengê zaxoyî ew bala xwe ya li ser Mihamed xira ne kir û bi weke ku ne hişt ku ew balên li ser ji herin li xwe anî der.Bi vê yekê re bal li ser wî man.Piştre ku weke qadarekê her weha dem ji têve diçê, êdî ne bi gelekî re, gotin ji devê mele Serhengê zaxoyî derdikeve.gotinê ku ji devê wî derdikeve ji, ewê ku dibêje Mihamed ku biaxivê hinekî ji wan re, ku ew ji tevlî axiftinan bibe.Mihamed, dema ku mele Serhengê zaxoyî diaxivê û her weha jê dixweze, êdî balên ku li ser Mele Serhengê zaxoyî bûn, weke ku bi careke re herine ser wî.Mîr ji bala wî li ser Mihamed bû.Mihamed bi vê yekê re, dibin balan de dimene.

Mihamed, dema ku her weha xwe di bin balan de dibîne, êdî piştre ne bi gelekî re êdî bidest axiftinê dike.Dema ku Mihamed bidest axiftinê dike, balên ku çûne ser wî, li ser wî dimênin.Mîr bala wî bi hey li ser Mihamed dimene.Mihamed, dema ku bidest axiftinê dike, pêşî hinekî ji axifitnên mirovên ku berî axiftinê diaxivê û bahsa wan dike ku çend xweşik û di cih de axiftine. Piştre bidest axiftine xwe dike.Mihamed, dema ku bidest axiftine dike, pir bi zanebûne diaxiftine.Li wir di wê heyeme de, di dema axiftinan de hizrên ku hatina ser ziman, mihamed hinekan ji wan ji axiftine xwe re weke hîm digirê û ji wê gav diavêje û axiftine dest pê dike. Bi vê yekê re, divêt ku mirov bêje ku dema ku diaxivê ji pir xweşik û bi zane diaxivê.Bi vê yekê re bala mirovên li dore êdî biêhtir dikişene ser xwe di wê heyeme de. Mihamed, di wê heyeme de, xosletekî wî hebû.Her zanistên ku dixwand li ser wî hizre wî hizre xwe ji dianî ser ziman.Bi vê yekê re, gelek zanistên demên berî wî, wî xwandibûn û di derbarê wan û hizre wan de xwedî hizir bû.Dema ku axiftibû, li ser wan hizre xwe anîbû ser ziman.Gelek zanistên ku wî xwandibûn, hizre wan, di wê heyeme de ji

mirovên ku lê dihisandin re  têne ser ziman.Bi vê yekê re bi rêzeke mazin re balaka mazin dikişene ser xwe di wê heyeme de.Mirovên ku li wir in, wê di wê heyeme de fahmdikin ku ew çend bi zane ya.Wî careke dî kifş dikin.Hizre wî kifş dikin.

Mihamed, dema ku diaxift, bi mîr û mele Serhengê zaxoyî re mirovên li wir bûn, bi bal lê dihisênin.Di wê heyeme de çit ji ti kesekî dernekeve. Herkesek bi bêdenge.Deng ji ti kesekî dernekeve.Tenê, dengê ku têt, dengê Mihamed yê axiftina wî ya.Dengê wî bi vê yekê re, di wê heyeme de di nav wan mirovên li dore wî de û di serê wan de zing dike.Mihamed, di wê heyeme de, dema ku axiftibû, hinekî li ser Nebi Nuh û Cizîre bota axiftibû.Li ser Hizre wî û dema wî û hizrên ku li ser dihatina ser ziman dike.Bi vê yekê re, hinekî bahsa faqa Qasim ji dike.Faqa Qasim, mazin di dilê wî de û di serê wî de cih girtibû.De ne, divêt ku mirov bêje, Nebi Nuh, Nebîyekî mazin bû.Bi vê yekê re ji, pir bahsa wî û nebîtiye wî dihata kirin.Pir mirovên zanist li ser Di sekinîn.Bahsa hizre wî û dema wî dikirin. Tişte k dihata gotin ku bi wî re qawimîye, pir bahsa wê dihata kirin.her ku çi pêre qawimî bû, li wan ardan qawimî bû.Li ber diclê qawimî bû.Her weha ji dihata hizir kirin.Bi vê yekê re, divêt ku mirov bêje ku bi Nebî Nuh re, weke kevneşopîyekê ji hebû.Ew kenveşopî ji, dema ku mirov diçû Cizîre bota, êdî pir baş û qanc didît û fahm dikir.Mihamed ji li wir mabû.Wî ji pir dîtibû û fahmkiri bû.Bi vê yekê re, ji xaynî vê yeê ji, wî pir xwandibû.Bi vê yekê re, divêt ku mirov bêje ku ew pir bi zane ji bû.Pir bi zane bû bû.

Dema ku Mihamed axiftibû, li ser Cizîre bota ji û zanistên ku têde ne û yên ku dihatinê de ji axiftibû. Bahsa wan ji kiribû.Bi vê yekê re ji di serê mirovên ku lê hisandibûn, hizrek çêkiribû.

Mihamed, her weha weke qadarekê diaxivê,Ku weke qadarekê diaxivê, êdî piştre axiftine xwe bidawi dike.Dema ku axiftina xwe bidawi dike.Mihamed, dema ku sekinî û êdî hew axift, êdî piştre hinekî weke ku bidengî çêbû.Di wê heyeme de bi bêdengbûne de weke  çav çûne ser mele Serhengê zaxoyî û mîr.Di wê heyeme de, mirovên hêvî dikir ku wê gotin pêşî ji devê mele serhengê zaxoyî derkeve, pêşt wî re.Lê wilo ne bû.Yê ku pêşî mafê axiftinê hilda û axift, mîr bû.Mîr dema ku Mihamed axiftinê xwe bidawi kir û sekinî, êdî piştre ne bi gelekî re mafê axiftinê hilde bûbû û axiftibû.Dema ku axiftibû ji, gotinê ku ji devê wî derketibû ji, ew bû ku ew çend xweşik û bi zane axift.Mîr, dema ku wilo  got û hinekî axift, piştre êdî ma sekinî.Piştî ku ew ma sekinî, êdî piştre yê ku mafê axiftinê Hilde êdî seyde Avdirehîmê xaniqî bû.Wî ji her weha weke mîr got û piştre hinek

axift û piştre axiftina bidawi kir.Mihamed, dema ku wan wilo di got ji, weke ku şerm bike lê hat.Mirovên dore wî ji ev yek lê farq kirin.

Piştî ku mîr axift û pişt mîr re ji hinek mirovên din ji axiftin, êdî piştre mele Serhengê zaxoyî ji axift û hinek gotinê pir baş ji bo Mihamed anîne ser ziman.Mihamed, dema ku wilo his kir, her weha êdî weke ku serê xwe bike ber xwe de lê hat.Dema ku mele Serhengê zaxoyî axift, ew hinekî dirêj axift.Hinekî bahsa dema ku li cizîre bota ji mabû kir.Li ser wê dema xwe ji du sê gotin vegotin.Di nav wê axiftina xwe ya ku li ser wê dema xwe kir, bahsa Mihamed ji kir.Bahsa hinekê jiyana wî ya wir ji kir.Bahsa medrese sor kir.Mihamed, bixwe, ew demek bû ku li wir, lê hê zêde bahsa çawa çûne xwe ya cizîre bota ne kiribû.Bahsa wê jiyana xwe ne kiribû.Lê mele Serhengê Zaxoyî di wê dema ku ew li wir mabû de, ew beşa jiyana pir baş fêr bûbû.Di wê heyeme de bahsa wê beşa jiyana wî kiribû.Pêre ji bahsa seydeyî mazin meleyê Cizirî ji kiribû.Meleyê Cizîrî, mirovekî ku mazin bû.Mirovên ku gotibana xwe zanist û yên ku navserî xwe bana, ne mumkun ku navê wî ne bihîstbana.Navê Meleyê Cizîrî, li herderî hatibû bihîstin.Ew bixwe ji li gelek deveran mabû û bi gelek zanistên dema xwe re rûniştibû û hizre wan hilde û hizre xwe bi wan re hevpar kiribû.

Meleyê Cizîrî, ku navê wî têt holê, di serê herkesekê ku navê hiskir de, pir tiştên ku weke hizir bêne ser ziman dibin.Ji ber ku ew mirovekî mazin bû û pir bizane bû.Wî, bi zanetîya xwe re muhra xwe li dema xwe da.Wî bi hizre xwe re, demeke nû afirand.Ji xaynî vê yekê ji, bi hizre xwe re hîmê hizre demên pişt xwe re yên ku avêtin yek ji wan re bû.Yek ji wan yê mazin bû.Mele hisêne batê ji wilo bû.Li herderî navê wî ji dihata bihîstin.Wî ji, weke meleyê cizîrî, bi hizir û berhenên xwe re navê xwe mayinde kiribû.Hê gelek zanistên demê hebûn yên ku mazin bahsa wan dihata kirin.Yên ku navê wan dihata ser ziman.Yên ku bi hizire xwe re di nav xalkê de û di serê mirovan de cih girtibûbûn.Mele Serhengê Zaxoyî, dema ku çûbû Cizîre bota, li ser wan zanistên demê, pir zanist bidest xistibû.Wî xwe pir bi fêr kiribû.Bi vê yekê re dema ku diaxift bahsa wan dikir.Di wê heyeme de ji dema ku diaxift, bahsa wan dikir.Pir li ser meleyê Cizîrî kiribû.Li ser wî û hizre wî û navê pir anîbû ser ziman.Mirovên ku li wir li dore wî rûniştibûn ji, yên ku ne kêmzan bûn.Yên ku bizan bûn.Yên ku pir dixwandin bûn.Ew, gelek ji wan, bi pirranî, demên xwe di pirtûkxanê di buhurandin.Bi vê yekê re, divêt ku mirov bêje ku pir bizana bûn.Dema ku mele Serhengê Zaxoyî diaxift ji, wan ji pir bi bal lê dihisandin.Geleke ji wan, berî hingî li ser meleyê Cizirî bihîstibû.mele Silhatinê kal, bixwe, berî hingî wî meleyê Cizirî dîtibû ji.Ew careke di

civatekê de rastî wî têt.Wî li ser nas dike.Bi vê yekê re divêt ku em bêjin, dema ku mele Serhengê zaxoyî bahsa meleyê Cizîrî kiribû, yê herî zêde bala wî çûbû bû serî w û axiftine wî, ew bû.Ji ber ku dema ku ew li ser axiftibû û bahsa wî kiribû, wî ji ew dema ku rastî wî hatibû bibîr kiribû.Ji ber vê yek, wî ji bala pir dabû ser mele Serhengê zaxoyî û axiftine wî di wê heyeme de.Wî wilo mele Serhengê zaxoyî dimeyîzend, weke ku bêje,´hinek tiştên ku ez ji li ser wî bêjim bi min re hene´.Her weha wilo bi bal dimeyîzend.Dema ku mele Serhengê zaxoyî ji dev bahsa meleyê Cizîrî kiribû, hingê ji, weke ku dilperîyek ji bi mele Silhatinê kal re çêbû bû,Her weha dihata xuyakirin.Piştre ku demek têve çû û mele Serhengê Xazoyî axiftina xwe bidawî kir û ma sekinî, êdî mele Silhatinê kal kir ku bal herine ser wî, di wê heyeme de.Weke ku wê biaxivê kir ku bal herine ser wî di wê heyeme de.Piştre, ku bal çûne ser wî, êdî piştre wî ji xwe di cihê xwe de, xwe kar kir û kir ku biaxivê..

Mele Silhatinê kal, mirovekî ku zane bû.Pir dîtibû.Pir pîr ji bû.Mirovên weke meleyê Cizîrî wî dîtibûn.Ew mirovekî ku mazin bû.Pir bahsa wî dihata kirin.Mirovên ku ew ne dîtibana ji, ne mumkun bû ku ew ne bihîstibana.Ne mumkun bû navê wî ne bihîstibana.Meleyê Cizîrî, mirovekî ku bi nav û deng bû.Mirovekê ku navdar bû.Mele Silhtinê kal ji pir pîr bû. Ew ji li gelek civatên mîran rûniştibû.Li civatan, ji aliyê mîran ve bê, an ji aliyê mirovên ku amede bûn ve bê, rêzeke mazin hilda bû.

Mele Silhatinê kal, pir li herême amede û Xizanê ji mabû.Li wanderan li civat mîr û zanistan mabû.De ne, divêt ku mirov bêje, di wê heyeme de, xizan ji bi pêşketitîya xwe ve bi nav û deng bû.Pir mirovan bahsa wê û mirovên zane yên ku lê diman ji dikir.Li ser Ew medrese mazin ya xizanê ku têde fêr dihata dayîn, ku ne weke medrese sor bi nav û deng bana ji, ji wê ne kêmtir bû.Li wir ji, vê yekê re, divêt ku mirov bêje ku navek hebû.Li wir pir mirovên zane li hevdû digahana hevdû.Dema ku li hevdû digahana hevdû ji, pir bi hev re diaxiftin.Li ser zanistên dema xwe û yên demên buhurî dihata axiftin.Di wê demê de ji, yên nav dabûn di civatan de bê, an ji di her weha di civinên zanistan de bê, navê wan dihata hildan û bahsa wan dihata kirin.Bi vê yekê re, qadrek ji ji wan re dihata dayîn.De ne, divêt ku mirov dise bêje, ku mirov ne bi zane û bi qadr bana, di civat û civînên zanistan de bahsa wan ne dihata kirin.Ev yek ji pir girîng bû.Divêt ku mirov bi teybet bêne ser ziman.

Mele Silhatinê kal ji mirovekî ku navserî xwe bû.Mirovekî ku zane bû. Ew ji li herêman geraha bû.Her herême ku çûbûyê de ji, lê, li qasrên mîran mabû.Li qasrên mîran li civatên wan rûniştibû.Li wan civatan ji, pir

mirovên zane yên ku navdar navê wan his kiribû.Navê wan bihîstibû.Yên ku bi wan re rûniştibû ji, bi wan re rûniştibû û hizre wan ji wan naskiribû û yên ku ne dîtibû û bi wan re ne rûniştibû ji û navê wan hebû ji, hizrên wan û navê wan ji yên ku bi wan re rûniştibû ji wan his kiribû.Bi vê yekê re, wî di derbarê zanistên dema xwe de pir xwe bi zane kiribû.Hizre wan zanibû.Meleyê Cizîrî ji ew pêre mabû.Lê wê dema ku ew pêre mabû, hingî, ew pir ne mazin bû hê ciwanek bû û meleyê Cizîrî ji mirovekî ku mazin bû û pîr û bi zane bû.Bi vê zanetiya xwe re, dema ku bi faqihan re diaxivê, hingî, wê dema ku ew ji li wire lê dihisêne.Bi vê yekê re wî nas dike.Lê di wê dema ku wî lê hisandibû ji, hingî, pir wî di serê mele Silhatinê kal cih û war girtibû.Piştî wê carê ji mele Silhatinê kal pir caran li meleyê Cizîrî rûniştibû û lê hisandibû.Di wan demên ku lê rûniştibû de ji, wî ew nas kiribû.Piştre di derbarê wî ji jiyana wî de ji pir tişt his kiribû.Ew hemû di wê heyeme de ku mele Serhengê Zaxoyî axiftibû di serê wî de bûn û dema ku ew axiftibû û bahsa wî kiribû, êdî di serê wî de ew dem û hizrên ku di serê wî de bûn, bi careke re hatibûbûna bîre wî di wê heyeme de.Ya ku wê di wê heyeme de bi ser xwe kiribû ji ev yeka bû.Dema ku kiribû ku biaxivê ji, dibêt ku wê li ser vanakan wê axiftibana.Mele Silhatinê kal, piştî ku mele Serhengê zaxoyî bahsa wî kiribû û bahsa cizîre bota kiribû, ne tenê bala wî kişandibû ser xwe di wê heyeme de.Lê bala mele Silhatinê kal bêhtir çûbû ser wî di wê heyeme de.Mele Serhengê zaxoyî, dema ku wî axiftina xwe de bidawi kiribû û mabû sekinî, êdî weke ku werê xwe lê hatibû bi bîranînên xwe û bi wan bîranînên xwe, kiribû û dabû xwe di nav mirovên li dore xwe de.Bi vê yekê re bal çûbû bûna ser wî di wê heyeme de.Mele Silhatinê kal, dema ku dabû xwe ji, xwe di cihê xwe de rastkiribû û kiribû ku biaxivê.Mele Silhatinê kal, dema ku kir ku biaxivê, êdî bi mele Serhengê Zaxoyî û mîr re, deng ji ti kesekî derneket.Herkesek ma sekinî di cihê xwe de di wê heyeme de.Mele Serhengê Zaxoyî û mîr ji, pir lê dimeyîzendin.Bala wan pir li ser wî bû. Mihamed ji bala wî li ser wî bû.Ji xwe, Mihamed, dema ku mele Serhengê zaxoyî bahsa meleyê Cizîrî û Cizîre bota kiribû, wi ji di serê xwe de pir tişt bi bîr anîbû bûn.Bala wî ji çûbû bû ser mele Serhengê zaxoyî di wê heyeme de.Lê wî, ti tiştek deynekiribû.Ti tiştek di xwe de ji ne anîbû der.Lê di serî wî de pir tişt hatibûbûna bîre wî. Di serî de, ew demên wî wî yên li wir hatibûbûna bîre wî.Mele Silêman û faqa Qasim yên ku di cih de hatibûbûna bîre wî bûn. Mihamed, ew bi meleyê Cizîrî re mabû.Wî demeke ku zêde ne dirêj ji bana pêre buhurandibû. Wî ji di wê heyeme de ji meleyê Cizîrî, dema ku mele Serhengê zaxoyî axiftibû, bi bîr anîbû bûn.Wî pir tişt bi bîr kiribûn.

Mele Silhatinê kal dema ku kir ku bi axivê, êdî piştre ne bi gelekî re bidest axiftinê kir û axift.Mele Silhatinê kal, dema ku bidest axiftinê kir û axift, li ser meleyê Cizîrî û wan demên xwe yên ku wî ew dîtibûn axift.Pir direj ji wan deman axift.Pir li ser wan deman axift.Bahsa wan derên ku ew çûbû bûyê de kir.Li ser wan axift.Li ser wan zanist û mîrên ku wî dîtibû, kir. Li ser wan ji hinekî axift.Bahsa jiyana xwe ya faqatiyê kir, di wê demê de li kuderê ma û rastî kijan zanistên mazin û navdar hat kir.Li ser wan axift.Di wê heyeme de bahsa meleyê Cizîrî ji kir.Wî çawa û li kuderê ew dîtibû bahsa wî kir.Wê rewşa wî ya ku wî li ser wir dît kir.Ew hingî mirovekî ku çawa bû û çawa dihata pêşwazikirin, di wê heyeme de bahs kir.Dema ku wî her weha axiftin dikir û bahs dikir ji, mirovên ku li dore wî bûn ji, lê pir bi bal di hisandin. Bala wan pir li ser wî bû.Pir lê baş dihisandin.Mele Silhatinê kal, her weha weke qadareke axift ji mirovên li dore xwe re.Ji wan re di axiftina xwe de pir tişt û hizir anîna ser ziman.

Mele Silhatinê kal, ku her weha weke demekê axift, êdî piştre ne bi gelekî re, axiftina xwe bi dawî kir û ma sekinî.Dema ku ma sekinî ji bal li ser wî bûn.Mele Silhatinê kal, di wê heyeme de ku axiftina bidawi kir û ma sekinî de, weke ku ya dilê xwe gotibe û dilê xwe xweş kiribe li miorvên li dore xwe dimeyîzend.Pir bi dilper dimeyîzend.Mirovên li dore wî ji, ev yek pêre di wê heyeme de kifş dikirin.Mele Serhengê zaxoyî, piştî ku wî axiftina xwe bidawî kir, hinekî ma sekinî û piştre careke dî mafê axiftinê hilde û berê xwe da mele Silhatinê kal û gotiyê de, ´ti pir xweş û bi zane û ji mazinatiye xwe axiftî´ û piştre hinekî din ji li ser axiftina axift û hinek hizrên nû ji i nav axiftina xwe de vegotin û piştre ma sekinî.Piştî ku ew ma sekinî, êdî hinek mirovên li wir ku navserî xwe ne ji û bi zane ne ji, mafê axiftinê hildan û axiftin.Ku wan mafê axiftinê hilda û axiftin, êdî weke qadareke di nav wan de danûstandinê weke niqaşê berdewam kir.Mele Serhengê Zaxoyî, ku axiftina bidawi kiribû, weke careke, berê xwe dabûbû bi ber Mihamed ve û lê meyîzend bû.Mihamed bi bêdeg bû.Mele Serhengê Zaxoyî, dema ku Mihamed wilo bi bêdeng û bi hizir dîtibû, êdî wî ji ew hizirkirin û bêdengbûne wî xira ne kiribû.Wê ji, deng ne kiribû.Lê bala wî bi hey li ser wî bû.Bala wî pir bi hey ser wî bû.

Ku hinekî mirovên ku mafê axiftinê hildan û axiftin, êdî piştre ne bi gelekî re, mîr ji kir ku mafê axiftinê hildê û biaxivê.Mîr, dema ku ji bo axiftinê da xwe û kir ku mafê axiftinê hildê û biaxivê û piştre ku mafê axiftinê hilda û axift, li ser meleyê Cizîrî wî ji çend gotin vegotin.Ew ji li ser wî û hizre wî ne bêzan bû.Wî tişte ku zanibû, di wê heyeme de ji mirovên li dore xwe re anî ser ziman.Di wê dema ku mîr diaxift de, bala

mele Serhengê Zaxoyî pir li Mihamed bû.Mihamed bi bêdeng bû.Mele Serhengê zaxoyî, zanibû ku di wê heyeme de û li wir, yê ku di derbarê meleyê Cizîrî de pir bizana bû Mihamed bû.Ji ber vê yekê ji bala wî pir li ser wî bû.Pir li wî dimeyîzend.Ku Mihamed, di wê heyeme de dabana xwe û kiribana ku gotinekê bêje, wê mele Serhengê zaxoyî di cih de tevlî axiftinê bi wî re bûbana. Wilo di cihê xwe de disekinî. Wî wilo intiba dide dore û mirov.

Mihamed ji, di cihê xwe de di rewşa xwe de sekinî bû.Lê ew di farqê de bû ku bala mele Serhengê Zaxoyî li ser wî bû. Wî ev yek farq dikir.Bi vê yekê re, wî ji car bi car serê xwe di rakir û çavên xwe di birina ser mele Serhengê Zaxoyî.Mele Serhengê zaxoyî, di wan demên ku Mihamed çavên xwe di birina ser wî ji, ew weke ku berê wî li ser miorvên dore wî bê bû. Her weha dihata xuyakirin.Li dore wî pir mirov hebûn.Mirovên ku hebûn ji, mirovne ku zane û bi aqil bûn.Mirovne ku navserî xwe bûn.Mirovên ku di civatan de bê an ji di rewşne din de bê, yên ku xwedi gotinbûn bûn.Lê Mihamed ji, weke ku di serê wî de bû.Weke ku di hişê wî de bû.Her weha jê û ji rudêna wî dihata têgihiştin di wê heyeme de.Lê Mihamed, ji ber ku fahm kiribû ku bala wî li ser wî ya, êdî bala wî ji çûbû bû ser wî di wê heyeme de. Bi vê yekê re, weke ku werê xwe lê hatibû.Êdî hewl dide xwe ku xwe li ser xwe bide nişandin.Bi vê yekê re weke ku werê xwe lê hat.

Mihamed, dema ku her weha hewlda ku xwe werinø xwe, mele Serhengê ew farq kir.Mîr ji farq kir.Dema ku mîr û mele Serhengê Zaxoyî çûne ser wî, êdî bi wan re weke ku bala hinek mirovên din ji çûne ser wî di wê heyeme de.Mihamed ji ev yek di wê heyeme de farq kir.Bi farq kirinê re, weke ku xwe bi tememî werêne xwe li xwe anî.Bi vê yekê re, ew li ser xwe anîbûna wî bala mirovên dore wî kişand.De ne, divêt ku mirov bêje ku balên zêde li ser Mîr bûn.Bi wî re ji li ser mele Serhengê zaxoyî bûn.Dema ku bala wan çû ser Mihamed, êdî bala mirovên ku li ser wan ji bûn çû ser Mihamed, di wê heyeme de.Berî hingî, dema ku mele Silhatinê kal axiftibû, balaka mazin li ser wî û axiftina wî kom bûbû.Ew bal, ji ser wî belav ne bûbû.Lê di wê heyeme de, dema ku her weha bal çûne ser Mihamed, êdî bi vê yekê re weke ku ew bal jev belav bûn.Ji ber ku bal çûne ser Mihamed.Bi vê yekê re, bala mele Silhatinê kal ji çû ser wî. Dema ku bala mele Silhatinê kal çû ser Mihamed û lê meyîzend, bi nerîntineke ku bi kêf bê li Mihamed meyîzend.Mihamed, ji wê nerîne wî weke ku hêzê bigirê lê hat.Bi wî re, dema ku mihamed li wî meyîzend, çavên wî bi seyde Avdilrehîmê xaniqî ji ket.Dema ku çavên wî bi seyde Avdilrehîmê xaniqî ket, weke ku kêfe wî re lê hat.Seyde Avdilrehîmê xaniqî, dema ku

Mihamed çavên wî bi wî ketibû, dîtibû ku wa ew li wî dimeyîzenê.Dema ku hingî çavên wî ji bi wî ketibû, hingî wî ji rudêna wî ji dilbûnek farq kiribû.Wê ji dilbûnê hem xweşbûnek kiribû dilê wî de û hem ji kiribû bala wî ji herê ser wî di wê heyeme de.

Wê rewşê, weke qadarekê berdewam kir.Piştre Mihamed, di nav wan mirovên li dore wî de weke ku xwe bide ber li berdewam, hinekî derxiste pêş û weke ku biaxivê xwe di cihê xwe de xwe adiland.Vê yekê ji, bala mele Serhengê Zaxoyî ji kişand.Bala Mîr ji kişand.Ji xwe, ji dema ku mîr li wir rûniştibû ji, bala mîr li ser wî bû.Bala mele Serhengê zaxoyî ji li ser wî bû.Bi vê yekê re divêt ku mirov bêje ku ji serê civate wan ve bala Seyde Avdilrehîmê xaniqî li ser Mihamed bû.Ji serê civatê ve, çend mirov axiftibû ji, seyde Avdilrehîmê xaniqî hm li wan hisandibû û hem ji bala xwe dabû bp ser Mihamed.Bala xwe wî ji ser wî ne birrî bû.Di wê dema ku mele Silhatinê kal axiftibû, pir bal çûbûbûna ser ser wî di wê heyema ku ew axiftibû de.Lê di wê heyeme de ji, balên ku li ser Mihamed bûn ji ser wî qut ne bû bûn.Wê demê de ji bala Seyde Avdilrehîmê xaniqî ji ser wî qut ne bû bû.

Lê piştî ku mele Serhengê zaxoyî axiftibû û di axiftina xwe de bahsa Cizîre bota kiribû û hinekî bahsa Meleyê Cizîrî kiribû, êdî bi vê yekê re bal çûbûbûna ser Mihamed di wê heyeme de.Lê piştre ku di cih de Mele Silhatinê kal mafê axiftinê hilda bû û axiftibû û wî ji weke mele Serhengê zaxoyî li ser heman mijaran axiftin kiribû û bahsa meleyê Cizîrî kiribû, êdî bal biqasî ku çûbûbûna ser wan, wilqasî ji çûbûbûna ser Mihamed.Mihamed, ji cihê bi mele Serhengê zaxoyî re hatibû wir di wê heyeme de.Bi vê yekê re, dema ku mirovên li wir li Mihamed dimeyîzendin ji, hinekî weke ku Cizîre bota dihata bîr û hişê wan di wê heyeme de. Li civatê, li qasrê ji çend ku bal li ser Mihamed bûn, li wir ji di wê heyeme de ji heman bal li ser Mihamed bûn.Mihamed, wan mirovên li wir, hinekî bi hiskirina navê wî re ew nas dikirin. Ji ber vê yekê ji, bala wan li ser wî bû.Berî ku Mihamed hatibana wir, mirovne ku navê wî hiskiribûn hebûn.Bi zêdeyî ji, miorvên ku navê wî his kiribûn, yên ku navserî xwe bûn û yên ku zane bûn.Wan berî mirovên navserî xwe û zane navê wî berî his kiribûn. Bi vê yekê re, dema ku ew dîtibûbûn ji, êdî bala xwe jê ne di birrîn.Mihamed ji weke ku ev yek farq kiribû. Lê Mihamed her ku weke ku farq kiribû ji, ti tiştek ne di got.Ti tiştek di xwe de ne dianî der di wê heyeme de.Li qasrê, mîr di dema civatê de pir bala xwe dabûbû ser wî.Piştre ji, bala xwe ji ser wî ne birrî bû.Mihamed di serê wî de ji cih girtibû.Piştre ku Mîr hatibû wir û li wir rûniştibû û li hevdû rûniştibûbûn û

bi hev re bidest axiftinê kiribûn ji, bala wî li ser wî bû.Mîr pir li Mihamed dimeyîzend.Mihamed, ji xwe li ber çavan ji bû.Bi du awayan li ber çavan bû. Mele Serhengê zaxoyî ji ew ji cem xwe ne divaqatand. Bi vê yekê re ji li ber çavan bû. Bi vê yekê re mirov karî bêje ku Mihamed pir li ber çavan bû.Weke zanistekê ku pir mazin li ber çavan bû.Mihamed ji pir bal kişandibûbûna ser xwe di wê heyemed e. Dema ku wî li qasrê di nav mirovan de axiftin kiribû, balaka mazin wî kişandibû ser xwe di wê heyeme de.Hingî ji her weha piştî axiftina mele Serhengê zaxoyî û mele Silhatinê kal ji bal hatibûbûna ser wî.

Mihamed, di cihê xwe de pir bal çûbûbûna ser wî di wê heyeme de.Bala mele Serhengê zaxoyî ji di wê heyeemd e zêdetir çûbûbû ser wî.Mele Serhengê zaxoyî, dema ku dîtibû ku Mihamed weke ku wê biaxivê xwe di cihê xwe de xwe adiland, êdî weke ku wî dawetî axiftinê bike lê meyîzend.Mihamed ji ew nerîne wî wilo fahm kir.Bi vê yekê re, Mihamed êdî di nav civatê de li ber Mirovên li dore xwe re axift.

Mihamed, dema ku bidest axiftinê kir, pêşî hinekî ji axiftina mele Serhengê zaxoyî axift. Piştre ji sê çar gotin li ser axiftina mele Silhatinê kal ji gotin.Piştre êdî bidest vegotina hizrên xwe yên di serê xwe de kir.Mihamed, pir hizir di serê wî de hebûn.Ku diaxift ji pir bi zane diaxift.Pir mazin di axift.Ev yek ji aliyê mirovên ku lê dihisandin ve ji aliyê hemûkan ve dihata têgihiştin.Hemûkan ji ev yek fahm dikir.hemûkan ji têdigihiştin ku ew pir bi zane ya. Mihamed, dema ku bidest axiftinê kir, ji mijare ku mele Serhengê zaxoyî û mele Silhatinê kal li ser axiftibûn ne vaqataha.Ew ji li ser vê Mijarê axift.Wî ji hizre xwe li ser wê Mijarê anî ser ziman.Lê Mihemed, di wê heyeme de dema ku axift ji, ne tenê ji meleyê Cizirî axift.Ji hinek Mijarên ku di dilê wî de bûn û di dilê wî de timî ji mabûn axift.Mihamed, dema ku ji zanebûne ser hinekî axift, piştre kir ku di nav axiftina xwe de gotinê bêne ser meleyê Cizîrî. Zimanê wî ji, di vegotinê de pir xweş bû.Lê dema ku wî di axiftina xwe de gotin anî ser Meleyê Cizîrî, wî ne ji Cizîre bota bidest axiftinê kir.Wî ji dema ciwanîya xwe bidest axiftinê kir.Hê hingê, wî çi di derbarê wî ji his kiribû û çawa ew hatibû guhê wî, wî di wê heyeme de ji mirovên li dore xwe re gotin bi gotin vegot. Mirovên ku lê dihisandin ji, pir bi bal lê di hisandin.Bala wan pir bi bal li ser wî û axiftina wî bû.Mîr û mele Serhengê zaxoyî pir lê dihisandin.Li nava çavên wî dimeyîzendin û lê dihisandin.Mihamed ji, di nav axiftina xwe de çûbû û xwe weke ku windakiribû bû.Heya wî weke ku ji dore wî ne bê bû.Wilo rewşa wî dihata ber çavan.

Mihamed, dema ku bidest vegotina xwe ya li ser Meleyê Cizirî kir, pêşî bahsa hatina xwe ya bi ber cizîre bota ve kir.Lê pêşî hinekî ji bahsa çûne çem şêxê Îdîrê ji kir.Piştre bahsa hatina xwe ya malê kir û piştre bahsa ketine xwe ya rê de kir.Mihamed, her weha wê bahsa rewşê xwe bike û bahsa rewşe Dilberê û Dilşad nekê ma qey çêdibû? Ne ne dibû.Ji ber ku ew hevdû ciwanên bi evîn û ku canê ji ji ber evîna xwe dana, bandûraka mazin li ser wî kiribûn. Mihamed di wê heyeme de, weke ku hê ji nûka ew rewş dîtibin û jîn kiribin, ew rewş di serê wî de jîn û zîn bûn.Dema ku Mihamed di axitina xwe de hata ser wan, êdî weke di axiftina xwe de bi hest bibe lê hat.Ew weke ku bihestbûne wê, wan mirovên ku lê dihisandin, weke ku hemûkan ji farqkiribû û fahm kiribû.Bi vê yekê re, di hisandin û lê meyîzendinê de, êdî bêhtir weke ku lê hatibûbûna girêdan.Her gotine ku ji devê Mihamed derdiket, wê çi gotina dî li duv xwe bianîyana, di serê wan de dibû mereq di wê heyeme de.

Mihamed, dema ku bidest axiftinê li ser Dilberê û Dilşad kir, êdî pir kir ku xweşik biaxivê. Her gotine ku ji devê wî derdiket, weke beytên heêbetekê li pey hevdû bûn û dihatina gotin ji aliyê wî ve.Wî vegotinê Dilberê û Dilşad, ku çawa dîtibû û çi hatibû serê wan, ji civatê re weke xwe vegot.Mihamed, bi vegotina xwe re, mirovên dore xwe re di beşa axiftina xwe ya li ser Dilberê û Dilşad de, mirovên ku lê dihisadin, hemûk ji bi hest û bar kiribûn.Piştre ku bahsa xwe ya li ser Dilberê û Dilşad bi dawi kir, êdî piştre,  wî hinekî bahsa xwe ya rasthatina keşe Tuma ji kir.Piştre bahsa xwe ya xwe gahandina Ayserê kir û bahsa li mana xwe û wî kir. Ku her weha wî bahsa wan rewşên ku jîn kiirbûn hemûkan kir, piştre bahsa çûna hasete û rastî meleyê Cizîrî û li cem wî mana xwe kir.Piştre bahsa bi hev re çûne xwe ya Cizîre bota kir. Mihamed, di wê heyeme de, dema ku bahsa wî kir, çawa ku weke di dema bahsa Dilberê û Dilşad kir de bi hest bû, her weha di wê demê de ji bi hest bû.Ev yek di wê heyeme de ji aliyê mirovên ku lê dihisandin ve ji aliyê hemûkan ve hata kifşkirin û fahmkirin. Mihamed, her weha tişte ku jîn kiribû û dîtibû, haya ku anîbû ser melyê Cizîrî vegotibû.Mihamed, bi vê yekê re, weke demeke dirêj diaxivê.Lê wî hingî xwe di nav gotinên xwe de windakiribû, nizanibû ku çiqasî dirêj axiftiya.Mirovên ku lê dihisandin, wan ji hingê, axiftina wî li wan xweş û xweşik hatibû, wan ji dem ji bîr kiribû.Mihamed, herweha weke demeke dirêj axiftibû.Ku weke demeke dirêj axift, piştre, wî axiftina xwe bidawî kir û ma sekinî. Lê dema ku ma sekinî ji, bi bêdengbûne wî re, civate wan pir bi bêdeng bû.Deng ji ti kesekî dernediket.Herkesek bi bêdeng mabû.

Bidengbûna Mihamed re, civate wan ji pir bi bedeng bû bû.Herkesek bala wan li ser wî bû. Bala mîr pir mazin çûbû bû ser wî.Mîr, weke ku acêb bimêne lê dimeyzend di wê heyeme de. Mele Serhengê zaxoyî ji pir bi bal lê dimeyîzend.Mele Silhatin û seyde Avdilrehîmê xaniqî ji lê bi bal bû.Herkesek, her weha Mihamed bi bal bû.Mihamed, piştî ku axiftina xwe weke ku bidawi kiribû û mabû sekinî, êdî nava wan pir bi bêdeng bû bû.Lê wê bêdeng bûnê zêde berdewam ne kir.Yê ku ew bêdengî piştre bi qadarekê re xira kir, mîr bû.Mîr dema ku axift, li Mihamed meyêzend û her weha gotiyê de; ´ ti pir xweş û xweşik axiftî.Xwûde aqilê mazin kiriya serê têde. Bi vê yekê re, ti kirî alim di dinyê de´.Mîr, dema ku her weha got, piştre hin gotin din ji di dema axiftina xwe de vegot û piştre ma sekinî.Piştî ku ew ma sekinî piştre yê ku axift êdî seyde Avdilrehîmê xaniqî bû. Seyde Avdilrehîmê xaniqî li Mihamed zirivî û piştre axift.Dema ku axift, pêşî li Mihamed meyîzend û gotiyê de´ rehma xwûde li ser te bê û ti ji rastteqîniyê axiftî´.Piştre seyde Avdilrehîmê xaniqî axift û hinekî dirêj ji axift.Seyde Avdilrehîmê xaniqî, li ser rastî û mirovên mazin axift.Wî ji di gelek civatan de navê meleyê Cizîrî his kiribû.Wî ji çend gotin li ser wî û mazinatîya wî anîne ser ziman.

Seyde Avdilrehîmê zaniqî, ku axift û hinekî li ser wî ji anî ser ziman, êdî piştre ku ew ji ma sekinî, êdî piştre mele Serhengê Zaxoyî dise mafê axiftinê hilde û axift.Mele Serhengê zaxoyî, dema ku axift, wî careek dî, hinekî li ser deme xwe ya li Cizîre bota axift û ji wir û ji wir ji tiştên ku hiskirine gotin anîne ser ziman ji mirovên li dore xwe re.Mele Serhengê zaxoyî, di dawiye axiftina xwe de, hinekî li ser mayîna xwe ya li Cizîre bota ya Mihamed re li Medrese sor ji kir.Bi vê yekê re, Mihamed, careke dî hata ber çavan.Hê bêhtir bal çûne ser wî di wê heyeme de.Mihamed, piştî ku axiftine xwe bidawî kiribû, êdî ma sekinî di cihê xwe de. Di xwe de dihizirî.Pir kur di hizirî. Dema ku mirov lê meyîzend, mirov ev yek pir baş û qanc fahm dikir.Ji wî ji, ev yek dihata têgihiştin.

Mihamed, di axiftina xwe de bahsa Dilberê û Dilşad kiribû. Dema ku bahsa wan kiribû, weke ku hinekî bi hest bû bûn. Weke ku çavên wî tişî bibin rewşe wî dihata xuyakirin.Rewşe wî, wilo li ber çavan bû.Mihamed, di wê hizirkirina xwe de di bin balên mirovên li dore xwe de bû.Mirovên li dore wî lê dimeyîzendin.Lê ew weke ku di serê xwe de ne li wir bê bû.Her weha rewşe wî dihata berçavan.

Mihamed, bêhtir dema ku rewşe Dilberê û Dilşad anîbû ser ziman, weke ku di wê heyeme de, careke dî wê rewşê jîn bike lê hatibû.Bi vê yekê re ji pir bi hest bû bû.Piştî ku bêdeng mabû ji, di cihê xwe de bi wê rewşê bû.Wî

wilo xweşik û jidil di wê heyeme de ji wan axiftibû, bi wê axiftina xwe, mirovên li dore xwe hemû ji bibandûr kiribûn.Bi vê bandûrkrinê, her gotine ku wî gotibû, di serê mirovên ku lê hisandibûn de cih girtibû.Wî di wê heyeme de bi vegotinê re, weke ku careke dî ew rewş jîn kiribû.Lê wî bi xwe re, kiribû ku ew mirovên ku lê hisandibûn ji wê rewşê jîn bikin.Her weha bûbû.Mele Serhengê zaxoyî ji pir bi bal bû bû ji axiftina wî. Ne tenê ew, mîr ji, û ew mirovên ku li wir li dore wî hemû ji bi bandûre bû bûn.Bi karger bû bûn.Li dore wî, di wê heyeme de pir mirov hebûn.Ji xaynî wan miorvên zane û navserî xwe, gelek mirovên ku faqabûn ji li wir bûn û dihisandin.Wê vegotinê wî ya pir xweş û bi karger, li ser wan ji bandûrek kiribû.Piştre, ku ew mabû sekinî ji ew kargerî ku bûbû, hebûna xwe berdewam kiribû.Bi vê yekê re, êdî weke berê, zêde wilo ji ti kesekî ji ne dihat ku wilo ti axiftinên dirêj bikin.Li ser wê axiftine Mihamed axiftin kirin, di wê heyeme de ji wan re weke ku hinelî zor dihat.Ku mirov li wan dimeyîzend, mirov ev yek pir baş û qanc fahm dikir.Mîr û mele Serhengê zaxoyî ji ku axiftibûn, axiftina wilo zêde ne kiribûn.Kin hiştibûn. Piştî axiftina Mihamed weke ku gireníyekê hebûne xwe bi ser wan de ji berde bû.Her weha ji rewşe wan ji dihata xuyakirin.Ku mirov li wan dimeyîzend, mirov ev yek fahm dikir.

Dem ji hatibû ber derengîyê, êdî dema rabûnê bû. Dema Mêjê bû.Divêbû ku rabûban û çûban û kara xwe ya mêjê kiriban.Lê weke ku dê wê heyeme de ti kesekî ne dikir ku bide xwe û rabe ser xwe û herê.Bi vê yekê re, wê gireníye li ser wan xwe dide ber çavan di wê heyeme de.Mîr ji, bîdeng bû.Mîrek, di nav civatê de ku li kuderê ji bana wilo zêde bêdeng ne di sekinî. Bêdengî jê ne dihata girtin.Jê axiftin dihata girtin.

Mihamed, di cihê xwe de bi bêdeng sekinî bû.Mirovên ku li dore wî ji bûn, bi mîr re ji, ku cerna wilo hinek gotin ji dev ne gotiban, wilo zêde ti gotin ji ji wan dernediketin.Ew ji bêdeng diman.Mihamed, di serê xwe de pir kur çûbû bû.Di serê xwe de ew careke dî çûbû bû wê demê û wê rewşê.Wî di wê heyeme de, di serê xwe de di wê heyeme de ew rewş jîn dikir. Li wir bû.Li cem Dilberê û Dilşad bû.Ew dema ku rastî Dilberê hatibû û ew di wê rewşe xirab de dîtibû, ew rewş li ber çavên wî bû.Wî wilo didît.

Ew rewş, çend giren bû.Dema ku di hata bîre mirov ji îsk di mirov de têne. Gîzlonekan bi lasê mirov de têne xwere.Mihamed ji wilo bû.Wê heyeme de, çend ku bi bêdeng bû û di serê xwe de di hizir de ji bû, ku mirov lê dimeyêzend, mirov fahm dikir ku her weha di wê rewşê de ya.Dema ku wî ew rewş anîbû ser ziman ji, her weha bi hest bû bû.Ruyê

wî wilo bi hest bû bû. Di wê heyeme de ji, ew di xwe de di hizir de bû û ew wilo bi hest dihata xuya kirin.Ku mirov lê dimeyêzend mirov ev yek, pir baş û qanc fahm dikir û têdigihişt di wê heyeme de.

Ku mirovek di serê xwe de di rewşeke ku bi hest de bê, ew rewşe ku ew têde ya, bandûr û kargerîya xwe di ruyê wî de ji dide der.Awayê ruyê wî, li gor wê rewş û heste ku jîn dibe awa distêne.Ev yek, ji bo her mirovekî wilo ya.Ji bo ku mirovekî zane ji ev yek wilo ya.Ji bo Mihamed ji ev yek wilo bû.

Mihamed, di jiyane xwe ya pişt Dilberê û Dilşad de di ti demê de ew ji bîr ne kirin.Hertimî ew di wî de jîn man.Wî ew di xwe de jîn hiştin.Hestên Mihamed, ji kargerîya wan ne dûr û bêbandûr bûn.Wan bandûreka mazin li Mihamed û hestên wî kirin.Mihamed, ew dema ku ew rastî wan hatibû, hê ji nûkava dikete deme ciwanîya xwe de.Hê ji nûkava balix dibû.Lê bi dîtina wan re, wî di xwe de balixbûneka mazin çêkir.Hestên wî, bi tememî, bûne hestên dema balixbûnê.Her weha lê hat.Mihamed, piştî wê rewşê re, bi serê xwe re bi dilê xwe re gelekî mazin di xwe de mazin bû.Wî, bi wê rewşê re, bi dilê xwe re ji, bidest dîtin, fahmkirin û têgihiştinê kir.Her weha ew pir mazin bû.Mirov, ku bi hestan mazin bû, mirov hingî, bi mazinbûneke pir mazin, di xwe de mazin dibe.Ew ji her weha pir mazin bû bû.Rewşe Dilberê û ew dîtine wê ya ku wî bi çavên serê xwe dîtî ji, wî mazin dike.Wî bi hestan re pir mazin dike.Hest, di rastiyê de di mirov de xwediyê hêzeke ku pir mazina.Ew hêz ji, hêze mirova.Bi têgihiştine wê re mirov pir mazin dibe.Bi têgihiştine wê re, bi mirov re aqlê hestiyar ji çêdibe. Aqlê hestiyar, pir afrîner e.Aqlê hestiyar, bi hestan re ku mirov gaha têgihiştine hestan, hingî mirov hinekî xwe ji di wê têgihiştinê de dibîne.Hingî ji, mazin dibe.Ya rastî, ew dîtin, dîtineke ku pir safîya û pir bitêgihiştina.Bi vê yekê re mirov mazin dibe.Mirov bi şaxsiyete xwe re mazin dibe.Hest û raman, hingî, bi têgihiştine re digihê hevdû di mirov de.

Dema ku mirov li Mihamed û li wê rewşe wî ya bi hizir dihizirê, hingî mirov vê yekê pir baş û qanc fahm dike.Ji xwe, Mihamed ji, ev yek di wê heyeme de dabû bû der.Bi axiftine xwe re ev yek pir mazin dabû bû der.Bi wê axiftine xwe re bandûr û kargerî, li mirovên li dore xwe li yên ku li wî hisandibûn kiribû.Dema ku mirov li wan mirovên ku li dore wî ji di meyîzend, mirov ev yek pir baş û qanc di dît û têdigihişt.Mîr bi xwe ji, pir bi bandûr bû bû. Wî piştî axiftinê çavên xwe ji wî ne dibirrî.Pir lê dimeyîzend. Ew demek bû ku Mihamed axiftine xwe bidawi kiribû.Lê hê ji wî li wî dimeyîzend.Hê ji bala wî li ser wî bû.Weke Mîr, bala seyde Avdilrehîmê xaniqî û mele Serhengê zaxoyî ji li ser wî bû.Wan ji pir li wî

di meyîzend.Lê yê ku herî zêde lê bi bal bû, mîr û Seyde Avdilrehîmê xaniqî bû.Seyde Avdilrehîmê xaniqî, li Mihamed bi aşq dimeyîzend.Dema ku lê dimeyîzend, weke ku kêfek di dilê wî de çêdibû.Ku mirov lê dimeyîzend, Mirov ev yek pir baş û qanc didît.Mele Serhengê zaxoyî, di wê heyeme de li civate li dore xwe bi hey bû. Dikir ku hê axiftinan bide berdewam kirin.Lê êdî weke berê axiftin êdî ne dibûn.Bi vê yekê re, êdî ku mele Serhengê zaxoyî û mîr di serî de û mirovên din ji bi wan re ku kirin ku rabin û herin ku mêje xwe bikin.Mele Serhengê zaxoyî fahm kiribû ku êdî wê zêde wilo ti axiftinên mazin ne bin.Wî ji ew girenîye ku li ser bû bû fahmdikir.Ji ber vê yekê ji, êdî wî ji deme mêjê bi bîr xist.Bi vê bi bîr xistinê re, êdî weke ku bêje, ´de êdî em herin û karê xwe yê mêjê bikin´.. Mirovên li dore wî ji her weha ev yek fahm kirin.Dema ku her weha mele Serhengê zaxoyî bi bîr xist, êdî ji bo rabûnê ji bê weke ku zindîbûnek bû.Wê zidîbûnê re êdî kirin ku bidine xwe û rabin û herin.

Hê ne rabû bûn.Lê kara xwe ya rabûnê dikirin.Wê rabûban û çûbû ban û kara xwe ya mêjê kiriban û mêj kiriban.Dem ji hatibû.Piştî ku her weha di nav wan de weke zindîbûnekê çêbû, êdî hin gotin ji ku ne zêde ji bin di nav wan de dibûn.Deng dihat.Lê wilo zêde ne bû.Gelek mirov bi bêdeng bû.Hin mirovên ku pîr navserî xwe car bi car hin gotin divegotin.Ji wan pêve ti kesekî dî ti gotin ne di got.Mihamed ji di cihê xwe de bi bêdeng bû.Wî ji li gor cimaatê dikir ku gavên xwe biavêje.Wî her weha rewşe xwe dikir ku bide nîşandin.Piştî ku ji bo rabûnê zindîbûnek bûbû, êdî piştre ew ji weke ku hinekî werê xwe lê hatibû.Rewşe wî ji wilo dihata xuyakirin.Ku mirov lê dinert mirov ev yek pir baş û qanc fahmdikir û têdigihişt.

Lê divêt ku mirov ji bêje, axiftine Mihamed ya ku kiribû di wê heyeme de, civat û mirovên li civatê ji rewşekê derxistibû û biribû û kiribû rewşeke din de.Ku mirov li wan dimeyîzend mirov ev yek pir baş û qanc di dît.Axiftine Mihamed di serê wan de pir cih girtibû.Weke ku herkesek di serê xwe de li ser dihzirî.Ku mirov li mirovên li dore wan û lli rewşe wan di meyîzend, mirov ev yek baş û qanc didît.Beşa vegotine Mihamed ya li ser rewşa Dilberê û Dilşad, pir di serê mirovên li wir de girtibû.Navê Meleyê Cizîrî ji her weha pir di serê wan de girtibû.Axftinên ku li ser van herdû mijaran hatibû kirin, di serê mirovên li wir de bûn.Ew ji di serê xwe pir li ser wan mijaran dihizirîn.Rewşe Dilberê û Dilşad li medresê dihata vegotin. Li ser qasîde dihatina çêkirin û gotin.Ew rewş, rewşeke ku êdî her weha di nav xalkê de di serê mirovan cih girtibû bû.Meleyê Cizîrî ji, bi heman awayê xwedi cih bûbû di serê mirovan de.Ew ji mazin bû.

Mihamed bixwe, ew demeke dirêj bû ku di ser van rewşan de buhurtibû lê hê ji bîr ne kiribû.Weke ku hê ji nû ve jîn kiribû, pêre jîn û zîn bûn.Rewşa Dilberê û Dilşad, wî bixwe jîn kiribû.Ev yek ji pêre dibû sedeme ku ew pir wê rewşê jîn bike û di ti demê ji bîr neke.Bi vê yekê re bi Mihamed re jîn û zîn bû.Rewşa meleyê Cizîrî ji bi heman awayê pêre jîn û zîn bû. Wê meleyê Cizîrî di jiyana xwe de di demên dawiyê de dîtibû.Meleyê Cizîrî, li cem wî bêhne xwe ya dawiyê dabû.Wê ji, pir di wî de cih girtibû.Piştre ji, ku bi ser ve çend sal ji derbas bûn, lê hê ji ew li ser wan di serê xwe de dihzirî.Ew herdû rewş, du rewşên ku li ser Mihamed û pêşketine wî, pir bandûr û karger kiribûn bûn.Ji ber vê yekê, pir girîng bûn ku mirov pir li ser van herdû rewşan bisekinê.Pir bêne ser ziman..

Di wê heyeme de ku hinekî dî dem têve çû, êdî mele Serhengê zaxoyî bi gotin gote mirovên li dore xwe,´deka nexwe em rabin û herin kara xwe ji ji bikin´.Bi vê gotine wî re, mirovên li dore wî ji fahmkirin ku wî ev gotin ji bo çi got.Bi vê yekê re wan ji xwe li xwe li hevdû da hevdû û kiribûn ku rabin.Lê ne rabûn.Li bendî mele Serhengê Zaxoyî û mîr mana sekinî ku ew li pêşî rabin.Ev yek, ji rêze dihata dîtin.Ji rêze li hevberê mîr, zanistên weke mele Serhengê Zaxoyî û pîrîtîyê dihata dîtin.Piştî ku her weha mirovên li wir ji kara xwe kirin û mana sekinî, êdî piştre ne bi gelekî re mele Serhengê Zaxoyî ji ev rewş fahmkir ku mirovên li dore wan li bendî wan in.Bi vê yekê re, êdî wî kir ku bide xwe di wê heyeme de.Mirovên li dore wan, çavên wan li ser wî û mîr bûn.Lê weke ku çavên mîr ji hinekî li ser wî bûn.Her weha rewş dihata xuyakirin.Mîr, lê çavên wî ne tenê li ser wî bûn.Çavên wî li ser Mihamed ji bûn.Wî pir li Mihamed dimeyîzend.Pir bala xwe di dayê de.Mihamed, bi rastî ji, ne tenê ji mîr, ji mirovên ku li wir hemûkan balaka mazin kişanibû ser xwe di wê heyeme de.Mihamed, her ku her weha bal li ser wî bin û mirovên li dore wî lê dimeyîzend, ew ji weke ku di serê xwe de bi hizir bû.Weke ku bi vegotine wî ya ji civatê re careke dî wê rewşe Dilberê û Dilşad bêhtir bi bîr bêne lê hatibû.Bi vê yekê re ketibû hizran de.Ji xwe, berî hingê ji, di ti demê de wî ew ji br ne kiribûn.Bi vegotine wî re, êdî careke dî ew rewş hemû hatibûbûne bîre wî di wê heyeme de..

Mihamed li cem mele Serhengê Zaxoyî rûniştibû.Di wê heyeme de dema ku mele Serhengê zaxoyî da xwe û kir ku rabe û dema ku wî da xwe û rabû û pêre mirovên ku li wir li civatê ji bûn ku dana xwe û rabûn û ew ji rabû ser xwe û di rex wî de ma sekinî.Mîr û mele Serhengê zaxoyî ketine rex hevdû de.Dema ku wan kir ku herine pêş, mirovên li dore wan ji, rê dana wan û ew çûne pêş di wê heyeme de.Dema ku ew ketine pêş de, êdî

bi hev re dana rex hevdû û ketine rê de ku kerine mizgefte.Mihamed di rex mele Serhengê û mîr de bû.Seyde Avdilrehîmê xaniqî û mele Silhatinê kal ji di rex wan de bûn.Ew ji mirovne ku mazin bûn. Mirovne ku zane bûn.Rêzeke mazin ji wan re ji hebû.Di rex hevdû de bûn û dimeşîn û diçûn. Hin bi hin ji hewşa medrese derdiketin.Ku ji hewşê derdikevin, êdî çavên wan bi hevirdorê dikeve.Dore wan weke deristaneka mazin bû.Pir şîn û xweşik dihata xuyakirin..

Ku derketine derve, êdî dîtin ku wa zarok ji, wê ji xwe re di leyîzin. Wê dengê wan têt.Ku derketibûbûne derve, êdî dengê zarokan bêhtir hatibû wan.Gelek ji wan bi hinek mazinên xwe re li ber avê bûn.Mazinên wan, li ber avê weke ku hin kar dikirin.Ew ji li cem wan sekinî bûn. Her weha rewşek, deme ku derketibûbûne derve, bi ber çavên wan ve ketibû.Jiyanê, di hebûne xwe de hebûne didomand.

Mihamed, di rex mele Serhengê Zaxoyî de dimeşî û di hizirî.Bi hizir bû.Dibêt ku li ser demên xwe yên berê di hizirî.Li ser demên xwe yên li Cizîre bota di hizirî.Dibêt ku faqa Qasim û mele Silêman di bîre wî de bûn.Ew, hê nû bû ku ew ji wan vaqataha bû.Weke ku wî bîre wan ji dikir.Bîre Cizîre bota ji dikir.Li wir, li medrese Sor li ber tirbe seydeyê mazin meleyê Cizîrî dirûnişt û ji xwe re dihizirî.Dibêt ku bîre wê dikir.Lê êdî ew ne li wir bû.Ew li li herêmeke dî bû.Li Zaxo bû.Li wir ji jiyaneka mazin û pêşketî hebû.Li ser xweza pir geş bû û li ber çavan bû.Wî hez xwezayê dikir.Wî pir hez xwezayê dikir.Li wir ji xwezayeka pir mazin û xweşik û geş hebû.Mihamed, li wir bû.Di nav wê xwezaya geş, xweşik û pir şîn de bû.

Mihamed, bi mele Serhengê zaxoyî û mîr û yên ku bi wan re ji medresê derketibû. Bi hev re diçûn ku herine mizgefte û mêj bikin.Hin bi hin ji medresê dûr diketin û bi ber mizgefte ve diçûn û ku mirov ji medresê li wan dimeyîzend, mirov di dît ku wa ew hin bi hin ji ber çavan wê winda dibin.Ku hinekî dî çûn, êdî weke ku bi tememî ji ber çavan winda bûn.

Mihamed ji di nav de li Zaxo, jiyanê hebûne xwe berdewam dikir.Wê li wir, jiyanê hê çi derxistibana pêşiya Mihamed, ew ji wê di demên pêşiyê de wê kifşbûbana.Wê hê Mihamed, pir tişt jîn kiriban.Wê bi zanistî jîn kiriban...............

.

Dawîya berga pirtûka Feqiyê Teyran a sêyemin.

**Cizîra bota, kurdistan, Abdusamet yigit. 2009**